HECÎYÊ CINDÎ

# KILAMÊN CIMETA KURDA

YERÊAN 2008



# ՔՐԴԱԿԱՆ ԺՈՂՈՎՐԴԱԿԱՆ ԵՐԳԵՐ

ԱՌԱՋԱԲԱՆԸ ԵՎ ՏԵՔՍՏԵՐԻ ԳՐԱՌՈՒՄԸ
ՀԱՋԻԵ ՋՆԴԻԻ

ԵՐԵՎԱՆ
«ԼԻՄՈՒՇ»
2008

# KILAMÊN CIMETA KURDA

## PÊŞXEBER Û BERNVÎSARA TÊKSTA YEN HECÎYÊ CINDÎ

YERÊAN
WEANXANA LÎMÛŞ
2008

**Dîayarîye ji bo 100-salya dayîkbûna**
**HECÎYÊ CINDÎ**

**Նվիրվում է ՀԱՋԻԵ ՋՆԴԻԻ ծննդյան**
**100-ամյակին**

ՀՏԴ 891.5
ԳՄԴ 84 Քրդ
Ք 931

Ք 931 Քրդական ժողովրդական երգեր. - Եր.: Լիմուշ, 2008. - 248 էջ.

ԳՄԴ 84 Քրդ

ISBN 978-9939-805-29-0

# MEZINAYÊ XUDANÊ KEDA MEZIN

## Bi mûnesebeta 100 saliya ji dayîkbûna Hecîyê Cindî

Her carekê, gava ez ji nû va pênûsê digirim destê xwe û dixwezim gotarekê ser jîyan û kar û barê wî mezinê me – Hecîyê Cindî bi cî bînim – tirs û xofek li min digire. Sebebê wê yekê yê bingehîn ewe, rasttir femandina wê yekêye, ku ne mûmkûne meriv di gotareke rojnamê, yanê jî kovarê da, her çiqasî jî ew berfireh be, temamya kar û barê wî raxe ber çevan û bi ser da jî bi hêjatî binirxîne. Lê çi jî hebe, ezê hewil bidim xwe, ku vê gotara xwe da, çiqasî ew tiştê bûyînê be, bi kurtayî û bi hev da û bi xetên giştî kar û barê wî ronakbîrê gelê meyî xudanê keda mezin raxim ber çevên xwendewanên îroyîn yê wî zaniyarî, yê ku sed sala berê di mala gundîkî nexwendî û rêncber da, li gundekî ji diniyayê qutbûyî hate dine, lê gava gihîşt û destê wî qelemê girt cihan ne ku bi tenê bi xwe û wê malbatê hesand, lê bi ser da jî bi canda gelê xwe ya ruhî û bi teyîbetî bi zargotina kurdî.

Hîvîdarim, ku ev gotara min wê bibe wek pêşkilam, pirolojeke wê kitêba min, ya lêkolîna ya ser berhemên Hecîyê Cindî û her wa ya beşeke bîranînên min yên ser wî, ku min merem daniye dûyerojê da nivîsandin û weşandina wan bi cî bînim.

Zargotinberevkir û zargotinzan, zaneyê edebyeta nivîskî, pirosayîs û şayîr, diramatûrg, rojnamevan, wergervan, pêdagoj (mamosta), bi ser da jî karkirê civakî. Awa navên wan warên kurdzaniyê, edebyeta kurdî ya bi zar û nivîskî û bi giştî-çanda kurdî yen ne temam, ku em dikarin bi hêjatî bidin ser xizmetkarekî çanda kurdî yê bi nav û deng, yê mezin li Ermenîstanê û Yekîtiya sovêtiyê ya berê Hecîyê Cindî.

Hecîyê Cindî Cewarî 18-ê adara sala 1908-a li gundê qeza Qersê ya navça Dîgorê – Emençayîrê ji dayîka xwe bûye.

Dawiya şerê cîhanî yê yekemîn (sala 1918-a), gava artêşên Tirkiyayê êrîşê tînin ser herêma Qersê, ku beriya hingê nava sînorê Împêratorîya Rûsîyayê da bû û bi pêra jî ser komara Ermenîstanê, ku bahara sala 1918-a ser erdê Ermenîstana îroyîn û Herêma Qersê bi pê ra wek dewleteke serbixwe çê bûbû, kurdên êzdî yen 16 gundên navça Dîgorê cîhil dibin ji ber tirsa bi cîhatina zor û zulma Roma Reş û wê rewşa giran da Hecîyê tifal dê û bavê xwe unda dike û ber wê yekê jî ewî dixin sêwîxanên Qersê, pişt ra Gumrîyê. Piştî derketina ji sêwîxanê ew dibe xwendkarê Xwendinxana bajarê Gumrîyê ya pêdagojiyê. Lê gava

ewê temam dike, di salên 1929-1930-î da dibistana gundekî kurda yê Qundaxsazêda (niha Rya teze) mamostatiyê dike.Paşê fakûltêta (beşa) Fîlolojiyê ya zanîngeha payîtextê Ermenîstanê -Yêrêvanê da tê qebûl kirinê û di sala 1933 da ewê temam dike. Pişt ra Hecîyê Cindî di instîtûta tarîxa çanda madî da dest bi karê amadakirina têza doktoriyê dike.

Gava sala 1937a rêjîma Stalîn ya dîktatoriyê li pirr kesên welêt tê xezevê û ewana bi motîvên polîtîkî davêje hebsxanan, pişt ra nefî (sirgûn), yanê jî gulle dike – Hecîyê Cindî ji ber vê zor û zulmê nafitile. Ewî sala 1938-a bi ronakbîrên kurd Cerdoyê Gênco û Ahmedê Mîrazî ra davêjin zindana îstîxbarata sovyêtiyê ya KGB û ew di wir da rast salekê tê zêrandinê û îşkencekirinê.

Sûcê wî û Cerdoyê Gênco yê herî giran wê yekê dihesibînin, ku ew bi Celadêt Bedirxan ra hatibûn girêdanê, yê ku li Sûriyayê û Libananê seroketî li partiya kurdî ya Hoyîbûnê dikir. Lê sovêt jî ji wê partiyayê aciz bû, ber ku dihesivand, ku ew dijminên wê- Daşnakên ermeniya û împêriyalîstên Înglîsê ra hevkariyê dike.Lê gava Hecîyê Cindî li ber îşkencên here giran jî naşkê û nikarin sûcê karkirina wî dijî Yekîtiya sovêtiyê îzbat bikin, ewî aza dikin.

Salên 1936-1959 da Hecîyê Cindî karê xwe yê lêkolînên zaniyariyê înstîtûta zimên û lîtêratûrayê da (edebyetê) ya Akadêmîya Ermenîstanê ya zaniyariyê da berdewan dike. Sala 1959-a, gava di nava goveka wê Akadêmiyayê da beşa kurdzaniyê weke ya Sêktora Rojhilatzaniyê (pişt ra ew sêktor bû înstîtût) vedibe – Hecîyê Cindî dibe serokê wê beşê yê yekemîn, bingehdar, hetanî sala 1967a. Lê di vê beşê da weke karkirê zaniyarî yê sereke ew xebata xwe ya lêkolîneriyê berdewan dike hetanî dawiya jîyana xwe ya sala 1990-î li Yêrêvanê. Bi daxweza wî ew li gundekî navça Aragasê yê Sîpanê (berê-Pampa kurda) binax kirin.

Ji rojên danîna bingeha edebyet û çanda kurdî yên yekemîn da li Ermenîstanê Hecîyê Cindî bi heyacan di ware perwerdekirina zimanê kurdî û her wa pêşvabirina edebyet û canda kurdî da kar dike. Ew salên 30-î dibe mamostakî Xwendinxana kurdî ya pêdagojiyê li Yêrêvanê, endemê kollêgiya redaksiyon ya rojnama kurdî ya Rya teze, lê di salên 1955-1957 da – cigîrê berpirsiyarê wê rojnamê. Salên 50-î dîsa dibe mamostakî beşa kurdî ya Xwendinxana ermenî ya pêdagojiyê. Lê di salên 60-î û 70-î da mamostatiyê dike beşa kurdzaniyê da ya fakûltêta Zanîngeha Yêrêvanê ya Rojhilatzaniyê wek mamostê ziman, lîtêratûra û zargotina kurdî.

Heciyê Cindî ser binaxa tiranskrîpsiya Elfeba kîrîlî (rûsî) sala 1944 a (eva yeka bi daxweza dewleta sovêtiyê bû) Elfebakê kurdî ya nû amade kir.

Heciyê Cindî bi giranî deng daye wek kurdzan, bi taybetî wek zargotinvan, edebyetzan, nivîskar.

Hê di sala 1940-î da ewî bi têma "Beyt-serhatiya kurdî ya" "Ker û Kulikê Silêmanê Silîvî" têza xwe ya berendamtiya (kandîdatiya) zaniyariyê bi cî anî û bû berendamê zanînên filolojiyê. **Bi vê yekê Hecîyê Cindî bû zaniyarê kurdî yekemîn temamya sovêtiyêda di ware kurdzaniyê da. Lê sala 1964-a ji ber keda mezin di nava kurdzaniyê da bê parastina têzê bi awayê konkirêt, fermî (ew yek li sovêtistanê degime çê dibû) nave doktorê zanînên filolojiyê û pişt ra jî yê pirofêsoriyê danîn ser wî.**

Hecîyê Cindî bi dehan antolojiya, berevokên hemû janrên zargotina kurdî bi pêşgotinên xwe yên lêkolîneriyê-zaniyariyê yên kûr û bi naverok dagirtî, bi têkstolojiya folkiloriyê piştî bergirtina ji her zarê zarbêjan dane weşandinê û di nava wan da bi zimanê berhemên zargotinê yê eslî yê kurdî û wergera ser ermenkî evên hanê: "Folkilora kurmanca" (tevî Emînê Evdal, ji 650 rûpêlan 570 rûpêl Hecîyê Cindî nivîsîne,) sala 1936-a, "Kilamên kurdî yên gelerî", tevî kompozîtor Karo Zakaryan" (sala1936-a), "Hikyatên kurdî yên gelerî" (s.1940-î, bi ermenkî), "Ker û Kulikê Silêmanê Silîvî", lêkolîn û têkst (sala 1941- ê, bi kurdî û ermenkî), "Folkilora kurdî" (s.1947-a, bi ermenkî), "Şaxên êposa" "Koroxlîye kurdî", lêkolîn û têkst (sala 1953, bi ermenkî), "Memê û Zînê", lêkolîn û têkst, (sala 1956 a, bi ermenkî), "Folkilora kurdî" (s.1957-a), "Beyt-serhatiyê kurdî" (sala 1962-a, bi wergera ser rûsî ya bi destî nivîskar û zanyarên cuda-cuda, bi amadakirin û pêşgotina Hecîyê Cindî, Moskova), "Kilamê cimeta kurdaye lîrîkiyê" (sala 1975-a), "Şaxên êposa" "Rostemê Zale kurdî", tekst û lêkolîn, (cilda 1-ê sala 1977-a), şeş cildên "Hikyatên cimeta kurda", pêşgotin, nivîsarnasî û têkst (salên cuda-cuda), "Usiv u Zelixe", lêkolîn û tekst (sala2003), "Dimdim", lêkolîn û têkst (Yêrêvan, sala 2005 û Êrbîl, sala 2007), "Şaxên êposa "Rostemê zale kurdî", (cilda nû, ya 2-a, Duhok, sala 2006) û hwd. Li vê tangê pêwişte em bidin kifşkirinê, ku hemû wergerên ji kurdî yên ser ermenkî Hecîyê Cindî bi xwe bi cî anîne.

Bûyareke kifş nava kurdzaniya sovêtiyê da bi giştî û nava zargotinêda bi taybetî tê hesibandinê çapbûna berevoka "Mesele û xeberokêd cimeta kurda" sala 1985-a, ku Hecîyê Cindî ew ji nava gel

berev kirine û bi pêşgotin û pê nasînan dane weşandinê. Ew berevok ji bêtirî 800 rûpêlan pêk hatiye.

Zanyarê kurdî welatparêz ew barxana zargotina gelê xwe hemûşk bi desta, bi qelemê ji ber zarê zarbêjan girtiye û ser kaxez mor kiriye. Wî zemanî da kolektîva înstîtûteke zanyariyê ya tam û temam belkî nikaribûya ev karê mezin bi cî baniya.

Hecîyê Cindî lêkolîneke kûr û belkêş ser binaxa zargotina kurdî bi cî aniye û ew bi sernavê "Dîharbûna dostaniya gelên ermenî û kurd nava zargotinê da" bi zimanê ermenkî sala 1965-a daye weşandinê.

Weke edebyetzan Hecîyê Cindî du kitêb bi zimanê ermenkî çapkirine: "Lîteratûra (edebyeta) kurdî ya Ermenîstana sovêtiyê" (sala 1954-a) û "Nivîsên ser lîteratûra kurdî ya Ermenîstana sovêtiyê" (sala 1970-î).

Keda Hecîyê Cindî di ware amadekirina kitêbên perwerdekirinê, fêrkirinê da jî yên ziman û edebyeta kurdî geleke, çawa yên bona merivên bi temenê mezin û nexwendî û her wa ji bona şagirtên dibistanan ji. Ewî ew kitêb ji despêka salên 30-î amade kirine, lê yên ji bona sinifên yekemîn û sêyemîn – hetanî dawiya jîyana xwe. "Elîfba" Hecîyê Cindî ji bona zarokên kurda deh cara û her carekê bi werguhastinên pêwîst va di nava zemanê bêtirî nîv sedsaliyê da hatiye weşandinê.

Hecîyê Cindî dihesibe wek bingehdarekî edebyeta kurdî li Ermenîstanê û Yekîtiya Sovêtiyê ya berê. Wek endamê Yekîtiya nivîskarên Ermenîstanê, wek endamê Seroketî, rêvebiriya wê yekîtiyê bi temamî yê pir salan, ewî ji sala 1930-î hetanî ya 1966-a seroketî li sêksiyon, beşa nivîskarên kurd kiriye nava goveka wê yekîtiyê da.

Berhemên Hecîyê Cindî yên edebyeta bedew yên bi şiklê helbestan, destanan û novêlan (çîrokan) bawer bikî di hemû berevok, antolojiyayên nivîskarên kurd da hatine bi cîkirinê û weşandinê ji despêka salên 30-î sedsala 20-î da.Ewî sala 1947-a novel, kurteçîrokên xwe bi kitêbeke cuda bi sernavê "Siba teze" da weşandinê.Sertaca berhemên Hecîyê Cindî yên edebyeta bedew tê hesibandinê romana wî "Hewarî", ku di sala 1967 da li Yêrêvanê hate weşandinê.

Gelek berhemên Hecîyê Cindî hatine wergerandinê ser zimanên gelên Yekîtiya sovêtiyê ya berê û bi tayîbetî yên rûsî û ermenkî. Romana wî ya "Hewarî" bi sernavê "Û bahar hat" bi wergera ser zimanên rûsî û ermenî li Moskovayê û Yêrêvanê hatiye çapkirinê. Lê bi destî ronakbîr, zaniyarê kurd yê bi nav Îsmayîl Hessaf "Hewarî" hatiye wergerandinê ser zimanê erebî û li Damişqê hatiye weşandinê.

Hecîyê Cindî şano û şanogiriya kurdî jî bîr nedikir. Hê di sala 1932 da piyêsa wîya bi sernavê "Qutiya dû-dermana" hate weşandinê, lê piyêsa bi sernavê "Miraz" ser sehna Têatira Elegezê ya kurdî ya dewletê hat nîşandanê.

Hecîyê Cindî bi veçêkirina nimûnên zargotina kurdî va jî gîro, mijûl bûye. Bi veçêkirina wî bi zimanê ermenkî ev kitêb hatine çap kirinê: "Çîrokên kurdî" (sala 1949-a), beyt-serhatiyên kurdî (sala 1960-î), "Karxezal" (sala 1982-a), "Bahar" bi zimanê kurdî (sala1988-a)...

Hecîyê Cindî di ware wergerandina berhemên edebiyeta bedew ji zimanên biyanî ser kurdî kedeke hêja kiriye. Bi wergerên wî pir berhemên şayîr û nivîskarên ermenî, bi piranî yên ser jîyana kurdan, ser pêrsonaj, qehremanên kurd - bûne mal û milkê xwendewanên kurd. Ewî gelek berhemên nivîskarên cîhanê yên mezin û navdar jî wergerandine ser kurdî.

Berhemên Hecîyê Cindî yê kurdzan û nivîskar bere-bere dibin mal û milkê xwendevan, zaniyarên kurd dervayî Ermenîstanê û Yekîtiya sovêtiyê ya berê jî.Romana wî ya "Hewarî" bi destî weşanên "Roja nû" bi tîpên latînî sala 1999-a hate çapkirinê. Me dixwest, ku hemû berhem, lêkolînên zanyar û nivîskarê mezin zûtirîn bibûna mal û milkê xwendewanên kurd li temamya Kurdistanê û beşên diyaspora kurdî bi wergera ji tîpên kîrîlîk, ber ku ewî ew ked ji bona temamya gelê xwe daye ser hev.

Keda Hecîyê Cindî di ware pêşvabirina kurdzaniyê û edebyeta kurdî da bi hêjatî hatiye nirxandin û şêkirandinê. Sala 1974-a hukumeta Ermenîstanê nave Karkirê zaniyariyê yê Emekdar yê bilind da ser wî. Ew bi rûmetname, bi ordên û mêdalên dewletê va hatiye pêşkêşkirinê-rewakirinê. Lê navê herî hêja û tam gorî keda wî doktor Çerkezê Reş daniye ser wî: "Bavê zargotina Kurdî".

**Ji bona rast, bi temamî û bi giştî nirxandina kar û bare Hecîyê Cindî wek ronakbîrekî kurd yê yekemîn li Ermenîstanê û Yekîtiya sovêtiyê ya berê em dikarin wa jî bêjin: ewî ji ber kêmaniya jimara kadroyên kurd despêka hilperîn, şorişa çanda kurdî da li Ermenîstanê ne ku bi tenê ew kar û bar di ware perwerde, edebyet û çanda kurdî da bi cî danîn, di nava kîjan da ew pispor, spêsiyalîst bû, lê ew hemû kar û barên wan waran jî yên ku hewcê û benda hêlkirinê, çarêserkirinê bûn. Lê ber ku ew ronakbîrekî xudanê kemal, talanta mezin û êrûdîsiya, hereketê bê sînor bû – nava zemanekî kin da di van hemû waran da bû pispor.**

**Û ji ber vê yekê bû, ku hê di despêka salên 30-î rojnama Rya teze da Hecîyê Cindî bi nav kirin wek mezmezkê pişta canda kurdî. Eva jî şûna xwe da. Ya here belkêş û mûhîm ewe, ku vê nirxandinê hêz û rastiya xwe pir salan pişt ra jî unda nekir, gava artêşeke ronakbîrên kurd ya giran li Ermenîstanê hev girt, çê bû.**

**Ronakbîrên wek Hecîyê Cindî degimene û ne ku bi tenê nava gelê kurd da.**

Lê nîgara Hecîyê Cindî wê ne temam be, eger em bi cîanîna berpirsiyariya wî weke alîkar û piştgirê merivan û bi teyîbetî yên kurd, wek mêrekî kurd yê dilsoz, bi rehm, mêvandar û li dawiyê wek malxwê mala kurdî, wek bav- ranexin ber çevan.

Mêvan ji mala Hecîyê Cindî xalî nedibûn: bilî qewim û pismamên nêzîk, ku bi giranî ji ber hisret, kovana dîtina wî ji gundên dûrî Yêrêvanê dihatin, merivên xerîb jî qesta mala wî dikirin, yên ku di nava jîyanê da diketin tengasîyê, hewcê alîkariyê, piştgiriyê bûn. Û kesek ji wana bê dil ji mala xwe verê nedikir: wek zilamekî çardeh salî dida pêşya wan û bi mesrefkîrina nav û rûmeta xwe ya bilind û mezin pirsên hemûşka dezgehên hukumetê, dewletê da çareser, hel dikirin. Lê çîqas keç û zilamên kurd bi alîkarya wî zanîngeh û înstîtûtên xwendina bilind da hatin qebûl kirinê, ji kîjan çend kes pişt ra bûn ronakbîrên bi nav û deng. Îdî ez wê yekê nabêjim, ku bê acizbûn, bi dilfirehî û rûgeşî gelek ji wana mala xwe da dihewandin – gava ew bi xwe bi malbata xwe va heft nefer bûn, lê her bi tenê du odên wî hebûn, ji wana yek jî pir teng bû.

Bilî alîkarya di ware amadekirina kitêbên wî da weke serrastkira tîpan (korrêktor) ji bona çapxana, ku wî zemanê berê da karekî pir giran û bi zehmet bû, xem û xerêqa qebûlkirin û verêkirina wan hemû mêvanan jî bi giranî ser mile hogira wî ya jiyanê –kulfeta wî Zeyineva Îvo bû. Ewê bi ser da jî pênc keç bi mêre xwe ra tevayî mezin kirin û dane ber xwendinê, ji kîjana dudu bûn doktorên zanînên doxtiriyê û hunermendiyê, lê hersên dine pêşekzan û mamostên navdar. Lê ya here mûhîm ne ku bi tenê bi zar û zimanê xwe va, lê bi ruhê xwe va nava dor û berên biyaniyan da ne ku bi tenê kurd man, lê bi ser da jî bûn kurdên welatparêz. Wan herpênc keçan jî sirya xwe da bingeha malbatên esil kurdî danîn bi malxwên mala xwe yên kurdên milet perwar va û bi ser da jî yên ronakbîr, zanyarên bi nav û deng va.

**WEZÎRÊ EŞO**
10.01.2008

# DU GOTIN

Di nava arşîva Hecîyê Cindîda me hinek destnivîsarên têkistên kilamên gelêrî yên neweşandî dîtin. Min qirar kir wan têkstan wek pirtûkekê ji bo weşendinê amade bikim.

Mixabin, navê zarbêjan li ser hinek têkstan tunebûn, yan jî bi kurtî hatibûn nivisar...

Ez vê pirsêda gunekarim.Sedem ewe, wekî dema min arşîva mala bavê xwe da arşîvxana dewleta Armênyayê, kaxaz cîguhezî bûn hinek kaxaz li hev ketin... Bavê minî rehmetî di wî warî da pirr bi texmîn bû, cîyê her kaxezekî wî başqe bû, ewî bi xemxurî ew xweyî dikirin...

Ez nizanim bavê min ji bo wan kilaman nivîsarnasî nivîsî bû, dema tesmîlkirina arşîvê ew kaxaz unda bû, yan wê paşê binvîsya pêra negîhand?..

Di nava wan kilaman da çend kilanı hatibûn başqekirin û bavê min li ser kaxezekî nivîsî bu: "Pêşkêş". Min ji dîya xwe pirsî, gelo ev çi kilamin? (Dayka min par, sala 2007-a, 93 salya xweda, çû ser dilovanya Xwedê).

Ewê minra gilî kir, go: "Nayê bîra te, Hecî û remetyê Xelîl Mûradovê hogirê xwe, car cara ser girê pêjberî mala me: Sîsêrnakabêrdê (Kela dûmeqeskê) rastî hev dihatin, tev digeryan...Xelîl wî çaxî serokê radîoya Yerevanê ya beşa xeberdanên kurdî bû. Carna Hecî pesinê kilamên, ku bi radioyê dibhîst, yên bi sitirana Reşîdê Baso, Mehmedê Mûsa û hineke din (nav bîra min nayên), dida... Du-sê cara Xelîl têkistên wan sitranan, wak pêşkêş Hecîra anî... Bîra min tê, dengbêj Efoyê Esed jî careke ser Hecîda hatibû, wî jî 2 tekstên kilama anî bû. Ahmedê Gogê - zevê me, carekê 2-3 têksteken kilama anî da Hecî çawa pêşkêş... De Hecî dawiya emirê xweda saxlem nîbû, ida folkilor nikarbu binvîsya.

Ew çend kilamin Hecî bi şabûn, shêkirdarî ji wan camera hildane..."

*Firîda Hecî Cewarî*
*2008s.*

# ÇEND GILÎ DERHEQA KILAMÊD CIMETA KURDADA

Kilamên cimetê, nava beyt-serhatiya, hikyata, mesela, herçê zargotina kurdaye din têne cudakirinê. Efrandina wana jî bi qewmandinara têne girêdanê, her cûrek bi tiştekîra Evana têne efrandinê û sitiranê şayada, şînada, odada, derva-nava tebyetêda, wexta lûrî-lûrkirina zara, wexta xebatê, şêrrda pêşberî dijmin...

Heye çapa wan.. A ji wanin, besa xeberê, kilamêd govendê, yêd dewata. Cîyê efrandina kilamên curê usa govendin, dewat, lîstik. Wextê wa xeber û lîstik bi hevra diefirin, efrandina nenivîsar ser zarê dengbêje...

Kilam, vê derecêda, kilamêd reqasê, yên govendê –tu hew zanî mina gul û çîçekê li hevdu zêde dibin. Qîrrînya xort û qîzane, û ew çi ku nikarbûne wextêda hevra bigotana, aşkere kirana, niha, li orta govendê bi xeberên alavgurr, gelek cara alêgorîk hevdû didine fem kirinê, caba hevdu didin...

Kilam yekî tîne halê rayê, yê dinê ruhdar dike. Kilam, sitran li vêderê sertacê şayê -û şoyêne. Û di vê derecêda – çîya û banîyê aza, tebîyeta aza gelekî alî efrandinêd zargotinê dikin, bi xwe jî dibin nexş û nimûn di nava wan her zargotineke ji ber xwe efrandî.

Kilamên vî teherî, wekî durêz, sêrêz, çarrêz û carna zêdene, wekî gelekî bi çap, bi rîfmin, hang û bangin, cîbicî-ha hanga diefirin.

Meriv şabûna xwe bi kilam-reqasê didin kivş kirinê û xilazbûn, kutabûna lîstik-reqasêra tevayî kilamên usa diha degime têne gotinê.

Firqîke van kilama jî ewe, wekî bi kom diefirin, yanê ji tenê weklandinê. Yek, yanê çend nefer xanekê dibêjin, yek, yanê çend nefer jî lê vedigerînin. Xenji wê, wextê kilamêd wa mêr jî distirên, jin jî –yan kom-kom, yanê yek-yek. Nava kilamêd wada gelek cara pirs û cab tê hene.

Wexta dewata kilamên dewatara tevayî, usa jî gelek qeyde (miqam) pê def û zurnê, meyê û hacetêd sazbendîyê dinê têne lêxistinê, efrandinê.

Lê wextê syarkirina bûkê xênji kilam û qeydêd lîstika, usa jî "Qeydê syara" tê lêxistinê, yanê jî "Cirîd". Wexta usa her syarek ling dide hespa xwe, dest bi cirîdê dibe.

Cawa hate gotinê, kilam tenê bona roja şaya nînin, ew usa jî bona rojêd oxirmê giranin. Şerr û dew gelek cara orta kurda û dewletên tirk,

fariz û erebada pêşda dihatin, usa jî di orta qebîlêd kurdada. Wexta wa jî, hema nava şêrda diefrînin kilamêd teze, wekî eyanin bi nave "Kilamêd mêra". Kilamêd usa, femdarîye, hîmlî mêr diefirînin û ewana derheqa şerê wan, mêrxasya wandanin.

Û seheta hecp jî qeydê şêrr dibhê, ya hînbûyî – îda nayê zevtê û syarê xwe usa difirîne, çawa teyrek ji nava teyra... tê dikeve nava şêrr, çawa bobelîsk şêrr gurr dike – hêja destbi şerê syara dibe. Syar û hesp dibin yek, yekruh û yekmerem. Û eva gişk – ew hewar û gazî, ew roja oxirmê giran, ew rev û bez gişk li derva têne kirinê û cîbicî bilqîn li dil dikeve, dil distirê, him pesnê yên saxî zor dide, him pesnê wî (yan wan) syarî (syara) dide, yê ku bi mêrkîmî ji deşta şêrr nereviye (nerevîne) û hatiye (hatine) birindarkirinê, yanê jî kuştinê. Kilam li deşta şêr mirova ber bi mêrxasiyê dibe.

Ne xwezil wî evdî, wî îsanî be, wekî xwe şaş bike, tirsonekbe û ji nava şêrr dil bike piştа xwe bide, ber bi malê bireve. Dewsa gulla, kilamêd tezeefirî wî tînin hale kuştinê, ji mirinê hê xirabtir. Şervan çiqas bi kilamê ruhdar dibe, pêşda diçe, wekî dijminê xwe alt bike, raqetîne, berîdê, awqasî jî hefsa xwe dike, wekî navê revê neyne ser xwe, nebe "benîştê devê êl-eşîretê". Qîz û jin ser yêd usada kilama derdixin, nav-nûçika lê dikin û ew kilam pêra-pêra bela dibe...

Vêderê pirs ne ku tenê derheqa şêrdane, lê pirs usa jî derheqa hevanîna kilamadane: dengbêjê kê zef bin, dengê kîjana bilind bê bihîstinê, zîzbe, ew jî bi moralî ruhdar dibe, alt dike.

Di nava vê sîklêda tê xanêkirinê mêrxasî, torinî, ruhbilindî, ruhmezinî – ew çi ku layîqî cimeteke çîyêye... Kilamên wa ji meydana şêrr tên dikevine nava cimetê, dengbêj hê ser wanada zêde dikin û li her dera dibêjin. Sîkila "Kilamêd mêra", yanê jî ya sîyara - gelekî qedire nava cimetêda, başqe gotî, wextê mêr li cîkî civyabin.

Kilamêd mêra - merivek distirê, tomerî gotî- çapa wane himlî tune: kêderê fikir kuta dibe, wêderê jî yekxane xilaz dibe û xana teze dîsa bi "lo-lo", yanê jî bi "hey lo-lo", "de lo-lo" û bi cure xeberê dinê destpê dibe. Kilamêd wî cûreyî dûmka wana dirêje û dikarin gelek sala hey teze bin...

Tebyet nexş û nîgara kilamêd cimeta kurdaye. Bi wêva meriv dile xwe vedike û çi ku dilê wîda heye bi xeberê bedewiyê dinitirîne. Tebyet mîna kilîtekêye, ku dilê wî vedike, dide xeberdanê û bi xwe jî dilra dibe yek. Ew bi sêwirdarya xweva pêra dikêlime û bi xwe jî dibe ruhberek. Çîya, gelî û geboz, gêdûk û zera, zinar û qeya, ba û bager,

berf û baran, teyrok û lêyî, cew, kanî, leme-lema çema, ewir, mij û dûman, siteyrêd rû ezmîn, hîv û ro, gul û gîha, kulîlkêd hezar navî... ew gişk xuber-xuber di nava kilamada cîwar dibin.

Herçê çîya – ew ruhê dengbêjê kurde, cî-miskenê hizkirina wî, bi wîra tevayî kul û derdê xwe ro dike, bi wîra tevayî şa dibe û bi wîra tevayî dijminê xwe alt dike. Çîya piştovanê wîye, warê miraza, dilketîya...

Nava zargotina meda kilamêd hizkirinê (bengîtiyê), çawa wekî dine carna têne navkirinê kilamêd keçika, gelekin...Ev curê kilama himlî derva hatine gotinê, dil nava azayêda vebûye, di çil û çîya. Wextê wa ne ku tenê zar, lê eynî dila deng dane hev, dilê hizkirî zarî hev bûne. Vî wextî em du meriva dibînin – qîzê û xortê berbi miraza, du dila, wekî ji herdu alîya hev dipesinin, besa hizkirina xwe dikin û bi kilama halê dilê xwe hevra dibêjin.

Wextê wa dil dibe kilam, kanîk, her dera xwe dide hesandinê. Xort û qîzê bengî li çolê û kewşen, çîyê, li zozana, li deştê, li bindarûka kake-kaka wane, û tu hew zanî bûne şarûr û bilbil...

Nava kilamêd usada bedewiya qîzên çevbelek, bejina wane tarihane bilind, "navkêlka wane ziravî", "sûretê wana sore xal-xalî", "diranê wane sedefî", "çevê wane reşe leglegî", "xeberdana wane şîrin"... têne pesinandinê: "Meriv mala xwe bide, serê xwe bide, yeke usa xwera bîne...".

Kilamada derheqa mirazê eynî bi dil têne sitiranê:

> Mirazê bê dil usane,
> Nolî bax û baxçê bê gul...

Nava kilamêd hizkirinêda hene kilamêd derheqa xerîbiyêda. Xeribî dupa girêdayî bûye tunebûnêra, ji destî tunebûnê cahil çûne cîyê dûr, wekî bona parî nan bixebitin... Xerîbî usa jî bi eskeryêra, girtin û sirgûnkirinêra girêdayî bûye...

Qîzaêd berbimiraz bi kûraya dilê xwe nelîyane û vê pirsêda gelek kilamêd agiralav hevanîne:

> Zewal gede, diçî welatê xerîba min bîr neke,
> Min sêveke xelatîke – berya xweke,
> Wexta diçî welatê xerîbiyê,
> Bîna te teng dibe, derxe,
> Eşqa min û xwera qasekê lê mêzeke...

*Hecîyê Cindî*

# TÊXSTÊN KILAMA

## AHMEDO

Ahmedo, zyaretvanê me çûne ber zyaretê,
Terezo, zyaretvanê me çûne ber zyaretê,
Temî bike pezka qurbanê, wê mî dû li me tê,
Ezê nedame Ahmedî axê, xarzyê Bedûl begê,
Heft salyê virda dilê me hevdûda hebû,
Gundo, malîno, hûn şedene, wey,
Ezê dame Temongî Mistereşkê,
Çîmî ser kulekê, arkolkê ber tendûrê,
Çar jinê wî terezê terezbav hene,
Hey novete şeva çara dora mine,
Heta sivê ser sîngê minî kewe wê xirav dike gîlêzê wê belxemê.
Ha Ahmedo, Ahmedo, Ahmedo,
Bextê te û xudê tedame,
Ezê nazik bûm, nazelîbûm,
Nazikê xwe li kê kim –
Ne dêye - li dêkim,
Ne bave –li bavêkim...
Ahmedo: - Besrayê, bextê te û xudê tedame,
Orta herdu derya minê tu dîtî,
Minê dareke zenda te morî mircan daye,
Tê nikarî qe rîşyê şerê ber enya kever qolê zêra çêkî.

## AHMEDO, QURBA

Ahmedo, qurba,
Bejina Ahmedê axê şivêta dare ji dara vê bilûrê,
Mala me, mala wan cînarê hevbûn,
Orta mala me û wanda
Çarde akûşkê pencere bûn.
Çarde salya minda dilê min, merûma xadê,
Çiqa têda hebû.
Çawa sala îsalin destê min, merûma xadê,
Girtin dane kurê Xelîlê vê Bexdayê.

## AVKA JI ÇÎYÊ TÊ

Avka ji çîyê tê,
Ez avê venaxum,
Nav gul û gîhê tê,
Bêhna yarê jê tê.

Avka ji gulan tê,
Ez avê venaxum,
Nav gul û gîhê tê,
Şerbetê venaxum.

Avka li serhedan,
Ez avê venaxum,
Hat ser gundê meda,
Şerbetê venaxum.

Min xwest babik neda,
Şerbetê venaxum,,
Avka ber çeperan,
Welle ez venaxum.

## ARINÊSA WÊRAN

Arinêsa wêran devê vî çîmanî,
Eskerê kapikan, ademan girane, erd hilanî,
Elîyê Mehmûd, Dewrêşê Ozman,
Go: - Mîrze Mehmûd,
Ji sivdera gomê derkevin,
Me bextê xudê-pêxembera daye weda.

Keremî go: - Mîrze Mehmûd, were em ji gomê derkevin,
Elîyê Mehmûd, Dewrêşê Ozman
Bextê xudê-pêxembera dane meda.

Kerem, Emo, Mehmûd gava ji sivdera gomê derketin,
Kapika sivdera gomê dorê girtin.
Şahid, şuhûdê Mîrze Mehmûd,
Kekê Zertîf, syarî Jero, gelek hene,
Heyfa hersê hevala bi destê xwe hilanî.

Arinêsa wêran bilincîya,
Civateke giran ser goma Mihongê Feyzo li hev civya.
Kulê tu bikevî mala Mîrze Mehmûd, kekê Zertîf,
Gullek li Dîwanê kurap daye –
Xûna sor niqitî ser şelvarê hêşîn ser zengûya.

Arinêsa şewitî di kortêda,
Kulê tu bikevî mala kekê Zertîf, syarî Jero,
Dergîstî maye li mala bavêda.

## ARZANE

Arzane, xweş arzane,
Arzane kevirê hûre,
Binyêda Zengêzûre,
Lawik girtine zora şûre.

Arzane pê hevraze,
Mexelê pezê meze.
Arzane, kevirê gire,
Binyêda Zengêzûre,
Lawik girtine zora şûre,
Bira eva desta hewcê vî destî neve.

*Got: Gula Ozman*

## AXAYO

Axayo, çûme Mûşê,
Bû hewayê,
Ser koçika bavê Koroxlî agir barî.
Axayo, çûme Mûşê-
Bi bax û tirî,
Perîşana Nemê kire gazî:
Gulê, rebenê,
Min porê serê xwe kurrkirê...
Çûme Mûşê li bilincîya,
Serê bavî Koroxlî –
Nasekine ser belgîya,
Heyla axayo, heyla wezîro...

Axa, çûme Mûşê –
Bi hembere,
Bavê Koroxlî nexweşe
Melle li sere,
Heyla axayo, heyla wezîro...

Çûme Mûşê bi titûne,
Kincê bavê Koroxlî qapûtê tev gulavdîne,
Heyla axayo, heyla wezîro...

Çûme Mûşê ser kanîyê,
Cinazê bavê Koroxlî dişon li dev cemyê,
Heyla axayo, heyla wezîro...

## AXAYO, RABE

Axayo, rabe, sibheye
Mîro rabe, sibheye.
Min şevê din xewnek dîye:
Esker li dora me girtîye.

Axayo rabe, qet ne wexte,
Mîro rabe, qet ne wexte.
Hûn hilgirin çek û rexte,
De biçî ser mîrê Mişexite.

Axa rabe, wext nivêje,
Mîro rabe, wext nivêje,
Jê derketin rimqirêje,
Melkê sor mêran bavêje.

*Got: Alêksan Darbînyan,ji Moksê*
*niha li Yêrêvanê dimîne.*

## AXA SYAR BÛ

Axa syar bû ji we yeke,
Xencela Aqo girane –
Ketîye ser kêlekê.
Şahid şihûdê feqî Aqo gelek hene,
Deşta Xezelîya şewitî –
Mêr dikuştin, talan danîn.

Axa syar bû bi giranî,
Deşta Xezela şewitî –
Ordû kişand, çadir danî.
Şahid şihûdê feqî Aqo gelek hene,
Deşta Xezelîya şewitî –
Mêr dikuştin, talan danîn.

Li me derket sitêrka wê hingorê,
Şewqê daye li wêrana Giresorê,
Şahid şihûdê feqî Aqo gelek hene,
Deşta Xezala şewitî,
Mêr dikuştin,
Talan danîn destî zorê.

## AXAYO, ÇÛME

Axayo, çûme Mûşa xopan ber dikanê,
Ehelê Mûşê hatine dîtina bavê Koroxlî, xeberdanê.

Ezê çûme Mûşa qopan va genima,
Perîşanê gote Almastê,
Go: - Mala bavê min û te xirab bibe,
Îro sê roje, sê şeve –
Kaxezê kekê min nayê, naçe, nizam çima.
Xelqê unda kirye teke, tûke,
Minê unda kirye bavê Koroxlî, berdevkê mîran û hakiman,
Bejina bavê Koroxlî dara vê çinarê...

Almastê go;
- Perîşanê, merûmê,
Berê kekê min dane Taşxana Mûşê, îdî nayê,
Ezê çûme Mûşa wêran ser kanîyê...

Almastê go: - Perîşanê, merûmê,
Îro sê ro, sê şeve,
Cinyazê kekê min anîne ber derê meçîtê,
Wê kuştine bavê Koroxlî –
Serekê alayê.

Axayo, ezê çûme Mûşê bax û tirî,
Îro sê şeve, sê roje

Têlêgrama bavê Koroxlî mera hatîye,
Salixa, divê, şemdana koçika belek ditemirî.

Bavê Koroxlî malda sîyar bû,
Serda sebir ketê,
Perîşanê gote Almastê:
Go: - Bira xirav bive mala bavê min û teva,
Dîtina kekê me bû roja qîyametê.

Axayo, ezê çûme Mûşê bilindcîya,
Perîşanê gote Almastê,
Go: - Bira xiravbe mala bavê min û teva,
Divê bavê Koroxlî Mûşêyî nexweşe,
Serê wî ranabe ser belgîya.

Axayo, ezê çûme Mûşê gale-gale,
Vegeryame alyê malê, xeverdane,
Xelqê unda kirye tekene tûke,
Min qijikê unda kirye –
Bavê Koroxlî- Rostemê Zale.

*Gotin: Farizê Emer Sardarov, 85 salî û Mecîtê Fariz, 45 salî.*
*Niha li gundê Arêvşatê dimînin, li ser nehya Êcmîazînê*
*Kur û bav dengbêjin, sala 1959.*

## AXAYO QURBA

Axayo qurba ezê çûme Mûşê, Mûş titûne,
Bavê Koroxlî digere nava Mûşa şewitî bi feytûne,
Xwedê meriva eyane bejna bavê Koroxlî -
Serda çoxe, binda gulavtûne.
Li minê, li minê,
Axayo qurba, paşî bavê Koroxlî nemînim li dinê...

Axayo qurba çûme Mûşê serî têlê,
Ezê bazar bikim bavê Koroxlîra qutî dû dermanê vê simbêlê.
Perîşanê korê, şerrê nemayê xelqê unda kirye tekan û tûka,
Meyê unda kirye bavê Koroxlî, reyîsê êlê.
Li minê, li minê,
Paşî bavê Koroxlî nemînim li dinê...

Axayo qurba simbêle,
Surra sibê, bayê êvarê lê dixe simbêla bavê Koroxlî têl bi têle.
Perîşanê go: -Şerê nemayê, vê sibê gullekê berî bedena bavê Koroxlî dane,
Berê wî dane qulbê, pişta wî dane kendêle,
Lê minê, lê minê,
Axayo qurba, paşî bavê Koroxlî nemînim li dinyayê...

*Got: Farizê Emer*

## BAVÊ EDO

Bavê Edo syarê komeyt yek taye,
Nijdî bin bavê Edo syarî komeyt tê nola baye,
Seyranê kire gazî –
Xezalê, xiravbe
Mala bavê min te tenê,
Çawa dor ji bavê Edo syarê komeyt
Girtîye eskerê reşe,
De weylo, weylo...
Bavê Edo syarê komeytî kap reşe,
Nijdî bin bavê Edo, syarî komeytî tê dimeşe.
Xezalê kire gazî –
Seyranê, xiravbe mala bavê min te tenê,
Çawa dor ji bavê Edo syarê komeytî,
Girtîye eskerê reşe,
De weylê, weylê...

## BAVÊ ÛSIV BEGÊ

Axayo gurba, malê me danîne eslanîya xopan devê belekya,
Xezal xanimê, korê nemayê, rabe emê vê sibê temaşekin qeyd û zincîrê van girtîya,
Feleka bavê Ûsiv, syarê Gewiro felekeke pirr girane,
Nava hezar hevsid malê hesinîyada welgeryaye,
Axayo de nabe, de nabe, êla hesinya girane, bêy te nabe,
Sal zeman xirabe, Ûsiv zarre pê hil nabe.

Axayo qurba, malê me danîne li zozanê esleniya xopan devî golê,
Mîratê Gewiro vê sivê derê golêya ketiye mistekolê,
Xezal xanimê korê nemayê,
Xwezila xêra xudê, mîrê mirazara bavê Ûsiv, syarê Gewiro, neyî nexweşeya li nivînê,
Bira girtî bûya, destê wî bigirtana bidana welatê Alî osman, Siltan Hemîd kambaxa vê Sitembolê.

Axayo qurba, malê me danîne eslanya xopan li vî çîyayî,
Xezal xanimê, korê nemayê, serra girtîye ewire, nave sayî,
Xwezila xêra xudê, mîrê mirazara, bavê Ûsiv, sîyarê Gewiro nava koma pizmamada bigerya xêr û şayî.
Axayo de nabe, de nabe, êla hesinya girane, bêy te nabe,
Sal zeman xirabe, Ûsiv zarre pê hil nabe.

*Ji siriranên Reşîdê Baso*

## BAVÊ BEYRO

Delê, lê, heyla lê li minê,
Min go: – Heyfa te mêrî, çawa ketî wê nivînê.
Çawa ketî wê nivînê malîno, kula bavê Beyro bîr nakim-
Heya roja mirinê.

Heylê lê, li minê, malîno, min got bavê Beyro sîyarê Eynê
Li mal derket tek û tenê.
Min nizanbû bavê Beyroyê here şerê Qarqanê, bê kuştinê.
Lê, lê, lê, lê, lê...

Heyla lê li minê, malî gundîno, hela rabin, temaşekin vê birînê,
Weyla xwedê xirav kirê tu birînê,
Çawa bavê Bayro, siyarê Eynê girtîye avîtiye vê nivînê.
Delê, lê, lê, kula bavê Bayro bîr nakim –
Heya roja mirinê.

Heyla lê, li minê malîno, gava min zanibûya
Bavê Bayro here şerê Qerqanê, bê kuştinê,
Minê şûr û mertala bavê Bayro hilda,
Serê nexaza jêkira li vê xûnê.
Lê, lê, lê, lê, lê...

## BAVÊ ELÎ

Bavê Elî syarî Başo sond xarîye,
Divê: - Nakevime vê faytonê.

Elî got: -Gezo, rebenê,
Bavê Elî, syarî Başo girtine
Birine Stembola kavil
Ketiye bin stîndaxê heft qiralalan –
Nizanî sîndaqi wê zakonê.

Kaxezekê ji Stembola kavil
Poştexan Romê ji minra hatîye:
Bavê Elî xistine Ataş gemîyê,
Şandine Cizîrî Botan welatî lazan,
Şandine vê sirgûnê.

Bidlîsa kavil wê li yane,
Serda koçik serane,
Hinek şûşene, şûşebendin,
Di binîyêda xan û manê kafirî Axilcane.
Bavê Elî, syarî Beşo,
Kilê çevê Têlî Mûşyanîyê,
Xistine Ataş gemîyê,
Birine Cizîrî Botan welatî lazan,
Sebî pîr pîreke filane.

Kafirî Axîcan rûniştîye serê têlê,
Têl ser têlê ji miletbaşîyê xwera dikişîne,
Elî gote: - Cezo, rebenê,
Bavê Elî, syarî Beşo girtine
Birine Stembola kavil
Seba keçeke xêçhebîne.

Wî dewranê, dewranê,
Stembola kavil wê bi toze,
Xudê mêr dizane sultan Hemîd mêrekî dewî doze,
Par vî çaxî Sultan Hemîd padişa bû,
Padişakî bi tenê bû,
Par vî çaxî kincê Abdilhemîd çox û cezayî bû...
Sala îsal bûye kavila çirtingoze.

Wey mileto –hûne korbin, hûne xayîn,
Dewran, dewranê filane,
Huryat- huryatê con tirkane...

*Got: Egîtê Hemîd, 25 salî, ji gundê Pampê, s.1954*

## BEJINA GEDÊ LAWIKÊ MIN

Bejina gedê lawikê min zirave vê gotinê,
Hatîye welatê xerîba ber kirînê-firotanê,
Ezê bidim mal-halê dinyalikê, ruhê şîrin,
Herçar qiranê ser dotinê.

Dara hewşa mala bavê min çilake,
Lawiko, qurban, de tu rabe
Qeme qayîşê formê pêdake,
Kê dîye, kê bînaye
Dorî zemanada kê dîye, kê bînaye-
Merî jinekê birevîne
Bavêje nava êl eşîra êzdîxanê –
Xilaz neke.

Bejina gede lawikê min kine bi erdêra
Ezê bendekê bistînim bi qirmêra,
Çiqa jine çêbe –
Mêrî tole, yarê digire ser jinêra.

Lawiko, qurban, mi bi qîztî, te bi xortî,
Were emê herin ber zîyareta te digotî,
Kîjan me soz-qirarê xwe poşmanbe –
Berê korbe, paşê kotî...

Lawiko, qurban, çîya bilinde, te navînim,
Ez merûma xwedê, ezê dûrebînê ji ku bînim?
Ezê dûrebînê ber çevê xwe bigerînim –
Gede lawikê xwe welatê xerîva têr bivînim.

Gede lawiko, qurban, gul-sosin şîn bû –
Ne sere çîyayê Elegezê,
Ezê tucar, tucar naçirpînim.
Kurê şah bî, kurê paşa bî

Ezê hetanî mirinê-
Tu dila ser dilê xwe û tera nahebînim.
Keçikê, dine, berfek bariye çîya hilû kir,
Werdekê ketîye avê, gola şêlûkir.
Kawa kubar par vî çaxî
Qulixkirya nefsa cane min evdala xwedê bû,
Îsal pêra kotîyê mêra min kûvî kir.

Çi wê pira sere herd newala –
Minê serra derbaz kirye cote karê-kar xezala.
Xwelîya gunda sere wî mêrîbe,
Wekî nêçîra destê xwe bigire bide destê xorta.
Xwedê jina çê destê kotîyê mêra –
Bigire bide çeleng sîyara.

Lawiko qurban, baranek barî,
Di xwedêda sêlavekê rabû,
Gelîyê kavlî Heko rêda,
Xwedê mirazê miraz hevla bike,
Mirazê gedê lawikê min paşila pîra dêda.

Lawiko qurban, ezê gelî neçim gelî,
Minê êvarda agirekê danî –
Halê dilê min û tera bûz nahele...
Xelqê ketiye derdê mal hale dinyalikê,
Ezê kerba xelqê têl û delal bûme ax û xalî.

Lawiko qurban, sêv hatine, sêvê zerin,
Minê bazar kirye –divê rune çêleka beran-berin,
Xwedê mala Qomsînemamê gundê me xiravke,
Divê nexweşek taxa jêrîne,
Ça nehiştin ez evdala xwedê lezekê herim sere.

Divê hatîye male, nava titûna teze minê kirîye,
Minê kirîye nava dezmala al geveze.
Lawiko qurda, tu cixarekê bipêçe, bikişîne,
Bira dilê min merûmêda nebe tu derde, tu mereza.

## BERFEK BARI

Berfek barî kavila gundê me,
Nizam çima.
Belgê gul û rihana, sosina binda dima,
Heyfa min nayê,
Li sed heyfê,
Jinê çê çûye ketiye ber destê kotî, pîsî, şindokî mêra,
Çiqasî tima.

Berfek barî kavila gundê me –
Çîya sipîkir.
Karî xezalan karê xwe hilda meşya
Li zozanê Şerfdînê –guhdarikir,
Ezê dikim herim li xal û xetê li gerdenê,
Morî mircan, karûbar, situ gewira minda pir zarîkir.

## BEYTA CINDÎ

Divê Cindîyo, rabe sibeye,
Xew ji tera bêfeydeye,
Rave, wextê maşê teye.
Divê, Cindîyo, rave ji xewa şevane,
Wextê maşê mêrane.

Divê, Cindîyo, rave xewê şevane,
Canke dest û çevane,
Wextê maşê mêrane.
Divê, Cindîyo, rave, hey roje,
Bese xewê şeva bidoje,
Xewê şeva heye ezeb û doje.

Divê, Cindîyo, bangda dîkê erşane,
Cav da dîkê erdane,
Rave, wextê maşê mêrane.
Cindîyo, bese xewê di şevadabe,
Xewê şeva heye ezabekî girane.
Cindîyo, hilatî roje,
Şemsê me biskoje,
Xewa şevaye ezab û doje.

Divê, Cindîyo, rojê pervedaye,
Nedîra wî daye,
Herçar qulba mesîyê binê beraye.
Malxiravo, rave, xewa şevaye gele-gele ezabe,
Divê, Cindîyo rave, şemsê me şewq vedaye,
Nedîra wî daye herçar qulbê dinêye.

Rave, malxirav, bese xewa şevadabe,
Sirr sadiqo, birê mino, bese xewa şevadabe.
Divê, Cindîyo, ro derketiye teştiya mîra,
Şemsê me li tivdîre,
Malxiravo, sirr sadiqo, bese xewê bîne bîre.

Divê, Cindîyo, bang da dîkê perê wî sipîye,
Bang daye erşê îlîye,
Nîşana mêra heye qubil Laliş kanya sipîye.
De rave, wey rave,
Sirr sadiqo, birê mino.
Bese di xewa şevadabe,
Xewa şewa gele-gele ezabe.

Divê, Cindîyo, rave, bang da dîkê perê wî sore,
Ewî bang da li erşê jore,
Nîşana mêra heye qubil, Laliş, kanya sipî li dore.
De rave, wey rave,
Sirr sadiqo, birê mino,
Bese di xewa şevadabe,
Xewa şevê heye pêşê gayê cote,
Gele-gele ezabe.

Cindîyo, bang da dîkê perê wî reşe,
Ewî li bangdaye li erşe,
Nîşana mêra heye qubil, kanya sipî Lalişe.
De rave, wey rave,
Sirr sadiqo, birê mino,
Dil bi xemo, bese di xewa şevadabe,
Xewa şeva bendê ji tera heq û hesav.

*(Cindî mêrê dîwanê bûye, çiqa mêr hatine dîwanê–raza bûye)*
*Got: Hemîdê Kinyaz ji Hoktemberyanê*

## BEJINÊ

Çi bejneke hatî derda,
Lê bejinê, lê bajina kê,
Koma mêra rabû ji berda,
Lê bejinê, lê bejina kê?

Çi bejneke li nav genima,
Lê bejinê, lê bejina kê,
Ez vê bejinê mame tima,
Lo gelo zerî ji mala kê?

Eman, bejina te qîzxalê,
Lê, lê, bejinê, bejina kê,
Min elamet kiryê bi dezmalê,
Lo gelo zerî ji mala kê?

Çi bejnînga ser xanîya,
Lê bejinê, lê bejina kê,
Min vê bejinê têr xeverda,
Lo gelo zerî ji mala kê?

Çi bejnika hatî derda,
Çi wêranî hatî derda,
Min vê bejinê têr xeberda,
Gelo zerî ji mala kê?

Çi bejnika ser qubayê,
Çi wêranî ser qubayê,
Hûr-hûr bala xwe didayê,
Gelo zerî ji mala kê?

Wey Erezo berda qûmo,
Ez hevt sala berda çûmo,
Sala heyşta poşman bûmo,
Lo gelo zerî ji mala kê?

Wey Erezo berda gezo,
Ez hevt sala berda bazo,,
Sala heyşta poşman ezo,
Gelo kawa min mala kê?

*Got- Efoyê Esed*

## BEBLEKANE

Beblekane, Beblekane,
Şîrê sor Beblekane,
Ringe –ringa sazane,
Ber govenda bûkane.
Beblekane tala cewrî,
Hat wekû kerê ewlî,
Şer ço Cirkê tewirî.
Beblekan tala deştê,
Van siwaran xişte-xiştê,
Xûn rijya pêva deştê.

*Got: Galûst Gûlamîryan*

## BERDÎYANO

Berdîyano, berdîyan,
Çend xa bûn xerecîyan.
- Kuro, navê te çîye?
- Navê min her Hecîye.
Ber govendê çevbelek,
Min pisîkan kir henek.
Pisîko, hanî – manî,
Ber govendê giranî.
Kevanim, heleqeye,
Ser milê min ya teye.
Kevanim, heleqeye,
Oldaşo, dora teye.

*Got: Galûst Gûlamîryan*

## BEYTA SIBÊ

Şemso, tu bavê stuyê gulanî,
Sekinî li dîwanî,
Şexsimso, navda mîra,
Şevê, rojê li nêçîra,

Nêçîra me dîndar mîre,
Şexsimso, tu bav Sitya Alî,
Ezîzekî delalî,
Şexsimso, nav da ınîra,
Şevê, rojê li nêçîra,
Nêçîra te dîndara mîre.

Tu bavê Stîya Xatî,
Deher bû çend welatî,
Şexsimso, nav da mîra,
Şevê, rojê li nêçîra,
Nêçîra te dîndara mîra.

Tu bavê Alê reşe,
Ezîzekî keleşe,
Şexsimso, nav da ınîra,
Şevê, rojê li nêçîra,
Nêçîra te dîndara mîra.

Tu bavê Şê Tokilê,
Nebîyarra tu dikirî,
Şexsimso, nav da mîra,
Şevê, rojê li nêçîra,
Nêçîra te dîndara mîra.

Şexsimso, ro zeriqî,
Şemsê me tiviqî,
Sexsimso, nav da mîra,
Şevê, rojê li nêçîra,
Nêçîra te dîndara mîra.

Şexsimso, hilat roje,
Şemsê ezîz bişkuje,
Şexsimso, nav da mîra,
Şevê, rojê li nêçîra,
Nêçîra te dîndara mîra.

Şexsimso, ro hiltêye,
Mangê berê xwe dayêye,
Şexsimso, nav da mîra,
Şevê, rojê li nêçîra,
Nêçîra te dîndara mîra.

Nadîra Şaxsim daye herçar qulbê dinê,
Mesîyê binê beraye,
Şexsimso, nav da mîra,
Şevê, rojê li nêçîra,
Nêçîra te dîndara mîra.
Şexsimso, ro hate teştîya mîra,
Şemsê mezin tivdîre,
Tivdîra wî dîndara mîre,
Şexsimso, nav da mîra,
Şevê, rojê li nêçîra,
Nêçîra te dîndara mîra.

*Got: Mêralîyê Xudo, ji gundê Cercerîsê, 35 salî*

## BÊRÎVANÊ

Bêrîvanê, ramûsanekê ji te dixwezim,
Kubar-kubar xwe li ba neke,
Cêrê ava xwe hilde,
Ber kanînga derê mala bavê min
Xwe li meneke.

Keçê, kulmalbavê,
Were ramûsanekê li min keremke,
Sala îsal bi avrûyê çeva xirab neke...

Bêrîvana min cêrê ava xwe hilda,
Kubar-kubar dixingirî,
Meşya ber kanînga derî mala bavê min di buhurî.

Heçî kesî bêje – bêrîvana te ne rinde,
Mîna şûrekî Misirê,
Xencereke ceferî,
Kêreke almastî,
Gulleke şeşagirî
Serê kezeba min dane –
Çar tilî serê kezeba min dibirî.

## BÊRÎYÊ GUNDÊ ME

Bêrîyê gundê me cotin,
Heylo, heylo, bêrîyokê,
Xalê memikan em sotin,
Heylo, heylo, bêrîyokê.

Bêrîyê gundê me sêne,
Hersê hevra dibêne,
Xalê memikan tivêne,
Heylo, heylo, bêrîyokê.

Bêrîyê gundê me çarin,
Enîyê kever di hejmarin,
Xalên memikan em xarin,
Heylo, heylo, bêrîyokê.

Bêrîyê gundê me şeşin,
Her şeş hevra dimeşin,
Xalê memika çî xweşin,
Heylo, heylo, bêrîyokê.

## BOXAZKESENA ŞEWITÎ

Boxazkesena şewitî çem û kanî,
Eskerê ala Hemîdîyê
Ser şêrê Nîkol ordî danî,
Cewahirê kire gazî,
Go: -Şewêş, Cindî, bira, bextê weme,
Were neçe pêşya eskerê Nîkolî canfîda,
Şihad şihûlê Nîkolê canfîda gelek hene,
Koka axan, began, li begleran li me anî.

Boxazkesena şewitî wê bi dare,
Eskerê ala Hemîdîyê
Ser şêrê Nîkol hate xare,
Cewahirê kire gazî,
Go: - Şewêş, Cindî, bira, bextê weme,
Were neçe pêşya eskerê Nîkolî canfîda,
Nîkolî canfîda ji dilva birîndare,
Tesîbî gurê hare.

Boxazkesena şewitî wê bi more,
Nîkol kire gazî,
Go: - Yêrêm, Yêrvand, Armênak, Asatûr,
Desta hilînin, çê bixebitin,
Îro hîvya me maye –
Nûrî Eysa pêxembere,
Wê li jore.

*Got: Galûst Gûlamîryan, 95 salî, zane ermenkî û kurmancî, ji alîyê Şataxêye ji gundê Korovankê, ji wêderê sala 1918-a muhacir bûye. Naka gundê Şahapilûrê dimîne, nehya Vêdîyê. Gelek kilam û serhatîya zane. S.1945*

## BÛKA MALA BAVÊ MIN

Bûka mala bavê min,
Tu bi delalya dilê min,
Îşev hatî xewna min,
Tu mereza canê min.

Ez çûm derî dadayî li min,
Tu bi delalya dilê min.
Derî, zerze venabe li min,
Tu mereza canê min.

Cî û belgî radayî,
Tu delalya dilê min,
Qîzik navda paldayî,
Tu hizkirya dilê min.

Kurtikê kawê qumaşe,
Tu delalya dilê min,
Xweke, here bimeşe,
Tu mereza canê min.

Bûka mala bavê min, gidîyê,
Tu bi delala dilê min.
Îşev hatî xewna min,
Keçik, tu qudûmê çokê min.

Jêra hatî baxşîşe, li min
Tu delala dilê min.
Kurrtikê kawê gumaşe, gidî,
Tu gula ber bîna min.

Xweke, berra bimeşe, li min,
Tu delala dilê min.
Ra bi huba dila nabe, li min,
Tu qudûmê çokê min.

Siveye, tev zeriqî, li min,
Zêr li anîyê biriqî.
Îşev hatî xewna min,
Keçik, tu qudûmê çokê min.

*Got: Egîtê Abas, xwendkarê para kurdî li rex Xweninxana pêdagogîyêye ermenîyê, s. 1957*

## BINEVŞA NARÎN

Dilê min li vêye,
Ezrahîl û cibrahîl,
Ji ezmanê jorî dageryane erdêye.
Geryan çar terefê dinêye,
Xwe berdane berya Wêranşarê,
Sekinîn li ber serê Dewrêş axa, mîrê êlêye.

Dibê: - Dewrêşo, rabe ser xwe,
Li te da zeraya tevêye,
Bûye wextê te û nimêjêye.
Dewrêş axa, mîrê êlê
Çevê xwe vedike û ji xewê
Rahîşte misînê dest nimêjêye.

Çû toxana binya malêye,
Çevê xwe gerand li eşîrê, li obêye,
Bala xwe dayê kareke xezala
Horîeke cinetê,
Werdekeke golê,
Kevotkeke serê bircê,
Li devê derê konekî diçe û têye.
Nezara çevê wî kete kêrsim û dîndara wêye.

Kêrsim û dîndara wê,
Bîna sitêrka sibê dertê
Ji aliyê qurixêye,
Şewqa xwe dide çar terefê dinêye.
Anîya wê kokebê hîvêye,
Hinara rûyê wê mîna sêvê Xelatêye,
Çev û burîyê wê weke hubira ser kaxetêye,
Dev û lêvê wê pelekî ji pelê mihevêye,
Diranê wê hûrin mîna birincê xerecdaxêye,
Pozê we nikulê kewêye,
Sipî dike mîna pele berfa li ser çîyêye,
Meşa wê mîna meşa qitikêye,
Mîna werdeka golê dertê ser mêrgêye,
Perr û baskê xwe dadiweşîne ji avêye,
Dilê Dewrêş axa bi hezar dilî dikevêye.

Misîn dihêle li poxanêye,
Vegerya malêye,
Gazî kir Qerwêşa nava malê,
Go: - Qerwêşê, lawo,
Min dî kareke xezala,
Horîke cinetê, werdekeke golê,
Kevotkeke serê bircê,
Li devê derê konekî diçe û têye.
Hûn qîzikin diçin
Ba hev dinêye,
Tu ji minra bêjî, ew qîzik qîza kêye?
Keçik divê –Dewrêşo, bavo,
Ew qîzika tu salixê wê didî,
Qîza Fariz begêye,
Navê keçikê Binevşêye.

Dewrêş axa gazî dike
Xulamê nava malê,
Divê: - Deva berde ji fêzê,
Mîya berde ji gomê,
Berxa berde ji kozêye,
Kihêl û menekya derîne ji tewlêye,
Terî û tariş tevî hev bike...

## BIŞÊRÎ

Bişêrî, wey Bişêrî,
Hay dil, hay dil Bişêrî,
Xezala li berîya jêrî.
Bişêrî bêm bi noke,
Siwar bûne guloke,
Çi qîzike xweşkoke.
Bişêrî bêm bi keze,
Digerî berx û peze,
Dostika min pişt bi qere.

*Got: Galûst Gûlamîryan*

## BIRINBILAXÎ WÊRAN

Birinbilaxî wêran li wî berî,
Ji koşkê kişya êrîşa vî eskerî.

Ahimê Kelo li hevalcêwiya kire gazî,
Go: - Bavî mino,
Şêrine çêbin, çê bixebitin,
Îro bûye namûs, namûsa me heyderî.

Birinbilaxî wêran bi kevire,
Mengîan nan avîtiye –
Pê menegîan erd nagire.

Ahimê Kelo li hevalcêwiya kire gazî,
Go: - Bavî mino,
Şêrine çêbin, çê bixebitin,
Îro bûye namûs, namûsa me mala kêfire.

Birinbilaxî wêran wê bi sûse,
Tivinga Ahimê Kelo bazinzîve,
Li ser mila diçûrise.

Ahimê Kelo li hevalcêwiya kire gazî,
Go: - Bavî mino,
Şêrine çêbin, çê bixebitin,
Îro cinyaza Ahimê maye li meydanê bênamûse.

Birinbilaxî wêran li van kaşa,
Dora bavê Bedo girtîye eskerê sînikan li van qaşa,
Gava ku dora bavê Bedo girtin eskerê sînika,
De bira têra derketa bavî Edo – Husêyn paşa.

## BIZINA SERÊ DARÊ

Bizina serê darê,
Min çêrand heylo jorê,
Min darê xwe tê warkir,
Bizin rabû çarsû bazarê,
Bazarkir şimika yarê.
Şimika yarê bazar kir,
Çargoşe qedîfe kir,
Her çar goşe navê te lê kir,
Hevalno, sirya te bê...

*Got: Werda Şemo*

## BIŞARÊ ÇETO

Bişarê Çeto sê denga Emê Gizê kire gazî,
Go: - Emo, lawo, bextê min û terave –were rayê.
Herkê tu nayêyî rayê,
Ezê xirav bikim kela Basimê,
Kela Hesenê Ozmîn.
Taqê jorîn tême
Cîyê çayê, qawê,
Taqê jêrîn tême –kadîna kayê.

Sîsanê go: -Tele Emo, de lêxe,
Hesenê Şêxo, de lêxe,
Mehmedê Emo, de lêxe,
Navê revê navekî girane,
Nava êlan û eşîra –
Ser konê bavê min neêxe.

Emo sê denga kire gazî,
Go: - Bişaro, lawo,
Ez nayême rayê eskerê dewletêra,

Ez nayême rayê koçerê serê çîyêra,
Minê sond xwerîye,
Qesema xwedêye,
Min koz kolaye erdêye,
Gulekekê berdaye axêye,
Nikê xwe avîtîye qeyda hespêye,
Herkê tu bawar dikî – bawar bike,
Bawar nakî –
Minê kilîtê qeydê şandîye qesirê ba xanimêye.

Tele Emo, de hevra,
Siloyê Hemzo, de hevra,
Minê tevîkê çêkirîye dupa kevira sêpê şela,
Sivê der û cînar bira bêjin –
Emê Gizê bavê min kiribe barîkela,
Sed car maşela.

## GEDE LAWIKÊ MIN

Gede lawikê min digere derê malê,
Şal û şapik qawê rengîn,
Te ez xwestim, ne revandim,
Kirime dezmaleke desta ser destê xwe gerandim,
Te min merima xudê kirye gazî û dengî.
Eman, eman, eman...

Lawilo qurba, wez xerîbim, ez xerîba ne li virim,
Qalçîçeka ber kêvirim,
Qenca xwestim, xiraba xwera birim.
Eman, eman, eman...

## GERMA REWANÊ

Germa Rewanê –
Kuro dîno,
Germanî, germe.
Deşta Rewanê –

Kuro dîno,
Çiqasî germe.
Baxçê domamê,
Kuro dîno,
Baxçekî nerme,
Deşta Rewanê-
Kuro dîno,
Çiqasî germe.

Derdê domamê wey, wey, wey,
Ax, ne tu derde,
Min bi van çeva dît
Kuro dîno,
Melengî ceme.

Vê yekê neke,
Kuro dîno,
Qîzmeta teme,
Vê yekê neke
Melengî ceme.

## GIDÎLO

Were gidîlo wê, gidîlo wê, gidîlo, gidîlo, gidîlo, qemerê de can,
Were gidîlo cano destê hev bigirin,
Emê herine mala, malê me kirîva,
Bejina gede lawikê min usane, nolanî tarihanek tarihana devê gelya,
Xelqo, kê hewza gede lawikê min bike,
Ji qîrçînya darê dar, rimê ji beza hespê erebî,
Gazinin lomanê jinebîya, ji nezera çevê qîz û bûkê necibire.
Were gidîlo, gidîlo, gidîlo qemerê de can.
Gidîlo qurba, gede lawikê min sekinîye li ber konê reşî çarde sitûnî ber pêjderoyê,
Gede lawikê min destê xwe kutaye ser qevza demê vê xençerê,
Xuzla xêra xudêra minê gede lawikê xu bidîta
Li ser qeyde qanûnê dewra berê.
Were gidîlo, gidîlo, gidîlo qemerê de can.

## GIRÊ SÎRÊ

Girê sîrê bi sîre,
Lê, lê, lê, lêb Meyro,
Ew sîr bûne qesîre,
Tolik bavê Meyro.

Mêrê Meyro hêsîre,
Lê, lê, lê, lêb Meyro,
Mêrê Meyro hêsîre,
Tolik bavê Meyro.

Girê sîrê pîvaze,
Lê, lê, lê, lêb Meyro,
Pîvaz bûne gewlaze,
Lê, lê, lê, lêb Meyro.

Girê sîrê bi noke,
Tolik bavê Meyro,
Syar bûne guloke,
Lê, lê, lê, lêb Meyro.

Girê sîrê genime,
Syar hime-hime,
Xustiyê Meyro hakime,
Lê, lê, lê, lêb Meyro.

## GOZÊ LÊ

Gozê lê, Gozelê lê, mala min Gozelê lê,
Gozê lê, Gozelê lê, şênya min Gozelê lê.

Goza mine ezîze, Gozê lê, Gozelê lê,
Goza mine ezîze, mala min, Gozelê lê.

Tye bi gihara altûzî, Gozê lê, Gozelê lê,
Bextê minra tu qîzî, mala min, Gozelê lê.

Gozela min birûkî, Gozê lê, Gozelê lê,
Tye bi gihara çirûkî, şênya min, Gozelê lê.

Bextê minra tu bûkî, Gozê lê, Gozelê lê,
Bextê minra tu bûkî, mala min, Gozelê lê.

Gozela min hesenî, Gozê lê, Gozelê lê,
Tye bi giharê hesinî, mala min, Gozelê lê.

Bextê minra tu jinî, Gozê lê, Gozelê lê,
Bextê minra tu jinî, mala min, Gozelê lê.

*Got: Kamilê Qaso, ji gundê Tilik*

## GULA ZER

Gula zer, hey gula zer,
Gula zer, gerdena zer.
Sitêra sibê derket der,
Gula zer, gerdena zer.
Gula sipî, gula sipî,
Gula sipî, gerdena sipî,
Gula sipî, gula sipî,
Sitêra sibê derketî.

## GULÎZER

Were, were, Gulîzerê,
Bes tu wek heyva biharê,
Were, were, Gulîzerê,
Bes tu wek heyva biharê.
Rû vek kulîlka hinarê,
Hela tu wer şîrin yarê,
Hela tu wer şîrin yarê.

Were, were, were, were,
Were, were, were, were,
Were, were, Gulîzerê.

Gulîzera min tu xweş xatûn,
Maşiq bûn wek Leyl û Mecnûn,
Gulîzera min tu xweş xatûn
Maşiq bûn wek Leyl û Mecnûn,
Hela tu wer li cem min rûnî,
Ji sibê heta êvarê,
Ji sibê heta êvarê.

Were, were, were, were,
Were, were, were, were,
Were, were, Gulîzerê.

Li te neyzan ahim kişand,
Ahim kişand, dilê min êşand,
Li te neyzan ahim kişand,
Ahim kişand, dilê min êşand,
Wez bûme wek dîn û serxoşe,
Ez bang dikim, şîrin yarê.

*Got: Gyozela Esed, ji gundê Heko, nehya Talînê*

## GULÎŞANÎ WÊRAN

Gulîşanî wêran ketim bi karêze,
Mistefa xanê min got:
- Emo, lawo, tivingê dayne ji tera raye,
Ezê gullekê berî bedena xarzê xwexim,
Porkura xûşka min dinêda bigere,
Kurr bê qûndeye...

Go:-Ezê Gulîşanî wêran ketim ber zindare,
Ezê gulekî berî herçar xalê xwe dim,
Porrkura xûşka we dinyayêda bigere,
Bê biraye...

Go: - Emo lawo, ew ne pesinê ba qîzaye,
Destê xu bavê cêva xu,
Bike kîse-kîsa zêraye...
Peyra şerê wan destpê bû...
Dîya wî hat, go:
- Emo, xudê te ha hilîne,
Bêje yê te kuştîye, kîye, kî nîne?
- Dayê, rebenê, yên ku min kuştîye,
Qe nizanim kîye, kî nîne.
Yê ku min kuştîye xudanê hespa hêşîne,
Xalê minî ortê birîndare,
Xudanî hespê yekzîne.
Yê ku min bona xatirê te girtîye,

Xudanê hespê dele-dîne,
Nav nîşanê mîr Sêvdîne.

## GULÊ MERÛMÊ

Gulê merûmê,
Havîne, xweş havîne,
Qar bavê Hesena bûye hewar û gazî û qîrîne.
Ahmed axa sê denga dike gazî:
- Esedê Xêlêt, divê, minra bigirin dîle,
Bira çend sala sergînê sêlê
Berdestê pîrka min bîne.

Muhbetê divê:
- Metê, ez bûka salême,
Zarê min nagire ez kekê xwera xeberdim,
Esedê Xêlit mêrekî heyfe,
Nasibî gilyê qolayî nîne.

Gulê merûmê,
Kendalê Sipî mexelê pezê nêre,
Şede, şûdê Esedê Xêlit gelek hene,
Egît û mêrxasa li meydanê dibijêre.

Ahmed axa sê denga kire gazî,
Dibê: - Esedê Xêlit minra bigirin dîle,
Ezê têkime seysê hespê nêre.

De dêran, Gulê dêran,
Serê xwe kurke du deleka bi çar kêra,
Pey Esedê Xêlitra ezê heram bikim
Cî û belgîyê gele mêra.

Gulê merûmê,
Dilê min dêşe, dêşe,
Egît û mêrxasa dizgîniyê menegîya dane pêşe,
Kula kor têkeve mala Ahmed axa,
Êvarda çawa te qelandîye koka mala Şewêşa.

Gulê merûmê,
Were min û vê ecêvê,

Simêla Esedê axê tenike –
Nagire li ser lêvê,
Agirê kulê têkeve mala Ahmed axa,
Were Esedê Xêlit nekuje,
Sebara me herçar malê mîreta belkî pê bê.

*Got: Efoyê Esed*

## GULÊ HOYNAR

Gulê hoynar, hoynar, hoynar, hoynarê,
Canê hoynar, hoynar, hoynar, hoynarê.
Gulê min bajêrda mêze kir,
Gulê hoynar, hoynar, hoynarê.

Bazara dimlê tekir,
Canê hoynar, hoynar, hoynarê.
Şabûna dengê xwe nekir,
Ya min bû xwedê nekir.

Gulê Gültepe gundê meye,
Kanîya ortê lûleye.
Yek şore, yek şîreye,
Gulê hoynar, hoynar, hoynarê.

Gulê min di bajêrda mêzekir,
Bazara kofya tekir,
Şabûna qotik nekir,
Ya min bû xwedê nekir.

*Got: aşiq Ahimê Çolo, ji gundê Elegezê, 70 salî*

## GULÊ REBENÊ

Gulê rebenê, Almastê qirikê,
Ezê gundê Mistê Kalo dinhêrim,
Çeli nerda wê bavê Bedir derketine,
Bira xêrê wayê nebînin Orocê Lalo,
Gedêd kurmanca, komandarê ûris-
Wan çawa gullekê bavê Bedir, sîyarê Kûvê dane,
Nehiştin me çend sala hevra tev xeberda..

Gulê rebenê, Almastê qirikê,
Ezê çîyayê Sînekê dinhêrim,
Çi çîyakî hêşîne,
Bejina Emerê bira bejineke zirave,
Bira xêrê wayê nevîne Orocê Lalo,
Gedêd kurmanca, komandarê ûris
Wan çawa gullekê bavê Bedir, sîyarê Kûvê dane,
Çawa destê wî nagire tetika mûsênîyê serda welgerîne.
Gulê rebenê, Almastê qirikê,
Herin ba xaliqê alemê bikin reca, hîvî,
Wekî emirê neferê malê
Ser emirê bavê Bedir têke nîvî-
Belkî sala îsalin dîsa hilde tivinga bazin zîvî.

Gulê rebenê, Almastê qirikê,
Were binhêre rûyê hîvê bûye jîwane,
Ew ro ne roja xwedê be,
Wexta bavê Bedir gûndê Orocê Laloda bû mêvane.
Bira xêrê wayê nevîne Orocê Lalo,
Gedêd kurmanca, komandarê ûris
Wan çawa gullekê bavê Bedir, sîyarê Kûvê dane,
Çawa qelandine koka mêrxasê Mamtacîyane.

*Got. Mistoyan Qadi*

## DA BIÇÎNE

Da biçîne bêrê, da biçîne bêrê,
Sermestê, cîawanê.
Da biçîne bêrê, da biçîne bêrê,
Hewar zermemik sêvika hiblêrê,
Hey radimûsim dest li kêrê.
Da biçîne bêrê, bêrika pezî,
Hewar zermemik sêvka rezî,
Hey radimûsim dest li qezî.
Da biçîne bêrê, bêroka xalan,
Hewar zermemik sêvka Alan.

## DE AXAYO

De axayo, de axayo,
Şerekê qewimî ser Tûtekê, perê van bêdera,
Cangîr axa sê denga kire gazî –
Gelî xulam, xizmetkarino,
Îro roja xîretêye bona talanê êzdiya,
Berê xwe bidine gula vê maûzerê.

Heylo şere, keko şere,
Şerê me şerê celaliyane,
Şer xweş bûye ser tananê êzdiyan.
Ahmed axê sê denga kire gazî, go:
- Bavê eşîrê, bese, biqelîne mala emekerê...

De lê wayê, de lê wayê,
Şerekê me qewimî Tûteka xopan gîha li hêşîne,
Sîyarekê siyar bûye, Remequlîya şewitîda,
Cavê ser cavê bavê Bavora ha bi tîne.

Bavê Bavo dûrebînê ber çevê xwe dixîne,
Koma celaliya Şerefxanî şewitîda ha dibîne.
Çaxê ji bavî Bavo dibe mînaya şêra,
Bira pêra derketa Reşîd axa bavê Tajdîn
Şivêta gurê nava kerîya.

De berdê, ha berdê,
Dizgîna Têlî hirço berde ser zende,
Sol bizmarê Têlî hirço girane, mane erdê.

Bavî Bavo dike dilezîne,
Xwe koma celalîyara digihîne,
Talanê Dêrcemêdê paşda dizivirîne.

Ahmed axê sê denga kire gazî, got: – Bavê eşîrê,
Îro li tamê me goştê beraz hebe,
Ser talanê êzdiya diha tunebe,
Bese koka me biqelîne.

*Got: Abas Ûsoyan, ji Vêdîyê. S. 1949*

## DÎLBERÊ

Lê Dîlberê, lê Dîlberê,
Nav şîrinê, dev şekirê,
Zulfiya zerê, gerden zerê,
Tu ji eywanê derkev dere.
Te li piştê xas kembere,
Dilê xorta bû kesere.

Dîlber, min dîtibû baharê
Ba lê dixe belgê darê,
Xew xweş bûye li paşila yarê.

Lê Dîlberê, lê Dîlberê,
Nav şîrinê, nav şekirê,
Zulfiya zerê, gerden zerê,
Tu ji eywana derkev derê.
Te li pişta xas kenberê,
Dilê xorta bû keserê.

Dîlberê, min dît li payîzê,
Ba lê dixe belgê gûzê,
Xew xweş bûye li paşila qîza.

Lê Dîlberê, lê Dîlberê,
Nav şîrinê, nav şekirê,
Zulfiya zerê, gerden zerê,
Tu ji eywana derkev derê.
Te li pişta xas kenberê,
Dilê xorta bû keserê.

*Ji sitranên Mehmedê Mûsa*

## DÎYARA MÛŞA ŞEWITÎ

Dîyara Mûşa şewitî ketim nav dara,
Bejina bavê Koroxlî mîna hesinan û çapana,
Perîxanê gazî dikir Perîşanê.
De bila pora serê te min kurbe,
Derbeke bavê Koroxlî dane sê minya gulê,
Çarê birîndare, wey bavoyê, wey bavo.

Sxayo, tu axayî, tu gula mala,
Emerî, çirayê mala Temirî, berxa mala Xêlitî, şkanê peyayî,
Ber destê dewletê Elî Osmanî, wey bavo, wey bavo.

Dîyara Mûşa şewitî ketim nava genime,
Têlxiravekî bavê Koroxlî tê nizanim,
Nizam çima Perîxanê Perîşanê dikir gazî,
Pora serê min te bi kurbin,
Rojê bavê Koroxlî diqewimî
Sê matka pûkî darê xwe disekinî.

*Got: Farizê Emer*

## DELALO

Delalo, delalo, dilê min kûre, kûrê van heydada,
Şerekê me qewimye Şûşana xopan, serê herdu şeda,
Kulê tu bikevî mala Ûsivê Evdal axa,
Evdalê begê syarê Nenêda,
Serê meydanê gullekê berî bedena bavê Emir, syarê Sibhan daye,
Serê meydanê serra sekinî sê cara dijminayî simbêl bada.
Delalo qurban, tu delalî.

Delalo, delalo, delalo qurban,
Dilê min hêlûne, hêlûna vê leglegê,
Şûrê bavê Emir, syarê Sibhan girane,
Giranî daketine ser kêlekê...
Kulê tê bikevî mala Ûsivê Evdal axa,
Evdalê begê syarê Nenêda,
Vê sibê çawa gullekê berî bedena bavê Emir, syarê Sibhan daye,
Serê meydanê lê şikênandye hestûyê gûzekê,
Wê hev bela kirye nermê vê kêlekê.
Delalo qurban, tu delalî...

*Ji sitranên Reşîdê Baso*

## DELÎLO

Delîlo, serê min bi heyran,
Malê min bi gorî,
Cawahirê kurê, Xezalê nemayê,
Peyabe, syarbe bozeke bi situ norî,

Bihare, torinê mala Şero berevbûne çûne Ezirgana kavil –
Cem Mişîr paşa.
Min nizanbû bavî Hemê, syarî Ferhanê,
Mala xwe çêkir kavila Alîkele, taxa jorîn.

Germa vê havînê kele-kele,
Karî xezala karê xwe hildane, çûne ber mexele,
Cewahirê –kurê, Xezalê nemayê
Peyabe, syarbe bozeke bi situ norî,
Bihare, torinê mala Şero berevbûne çûne Ezirgana kavil –
Cem Mişîr paşa.
Min nizanbû bavî Hemê, syarî Ferhanê,
Mala xwe çêkirîye li wêrtasa Alîkele.

Axangê me çûne axangîyê,
Şalvara bavî Hemê syarî Ferhanê
Daketîye ser zengûyê.
Bihare, torinê mala Şero berevbûne çûne Ezirgana kavil –
Cem Mişîr paşa.
Ji torinî mala Şerora
Derketiye deste kaxezê muqurîyê,
Ji bavî Hemêra
Derketiye deste kaxezê mezûriyê.

Çi ba bû, çi baran bû, çi bobelîskê kulê ser konî bavê Hemê rabû.
Bihare, torinê mala Şero berevbûne çûne Ezirgana kavil –
Cem Mişîr paşa.
Dêna xwe didimê –
Cotî mişîrê dewletê li min winda bû.

## DE LÊ, LÊ

De lê, lê, lê, lê, lê
De Narînê.
Êvarda agir cotin,
Zerî ji himama dihatin,
Bîna memika em sotin.
De lê, lê, lê, lê, lê
De Narînê.

Êvarda agir sêne,
Zerî ji himama têne,
Belekê li berê çîyane.

## DE LÊ, LÊ, LÊ

De lê lê, de lê lê, de lê lê, delalê,
De lê, lê, lê, delêlê,
De lê, lê, lê, lê Delalyê.
Êlê Delalyê canê, Îrane ha Îrane,
Gireke girê Girîdaxê girtî hetanî Kêrmanşahê Kurdistane,
Van eşîra koni çîtê xwe lêdane,
Qîzi bûkê eşîretê li ber konê çîtê êrebîya çarde sitûnî hev civyane,
Minê bala xwe dayê têlî Esınera huba dilê mine navdane.
De lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê,
De lê, lê, lê, lê, lê, delalyê de lê, lê,
Lê, lê, lê, torinê.

Delalyê canê, te fesla vê biharê,
Şedetyê mindî pir delalî,
Min nizanbû tu gulya rihatî yan alalî,
Malî di gundîno, minê şevekê çoka xwe da çoka wê kulmalê, kulmal bavê,
Ezê serê sivêda ji eşqa ramûsanê wê kulmalê bûme xortekî çarde salî.
De lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê, lê,
Delalê lê, lê, lê delalyê.

## DE LO, LO

Xezalê gote Emînê, go: - Emînê, porkurê,
De rave binhêre şerekê me qewimîye wêrana Poştê gîha şîne,
Ahmedê Eyso vê sibê gulla direşîne,
Lêdixe sê eskerê Romê nava esker weldigerîne,
Were birano, birano,
Tu mêrxasê mala bavê minî, wî maqûlo.

Emînê sê denga meydanê kire gazî,
Go: - Xezalê, porkurê, de rave binhêre
Şerekê me qewimiye wêrana Poştê wê bi dare,
Vê sibê gulekê berî bedena Ahmedê Eyso, kekê Emir **dane,**
Birînê têye xûna sare.
De lo, lo, de lo, lo, tu mêrxasê mala bavê minî wî maqûlo.

Xezalê sê denga meydanê kire gazî, go:
- Emînê, porkurê, şerekê me qewimîye wêrana Poştê heya vira,
Vê sibê xûna sor rijyaye ser kevira.
Ne bave, ne biraye, ne xweye, ne xudane,
De were emê kêlekê rûnên, ezê bêjim – wey min xweyo,
Tu bê wey min, bavê minî were xweyo.

*Got: Efoyê Esed*

## DE LO MÎRO

De lo mîro, de lo mîro...
Toxanya wêran dilê mira berê bendê,
Toxanya şewitî dilê mira berê bendê,
Mertela Memedê barê girane,
Daketîye li ser zendê.
Gelî bira, werin binhêrin,
Şerê mala Mîra Şekirî isa danîne,
Notila reqasa bê govendê...

De lo mîro, de lo mîro...
Toxanya wêran dilê mira li vêjanê,
Toxanya şewitî dilê mira li vêjanê,
Bira kula kor bikeve mala Memedê şêx Silêmanê,
Gelî bira, werin binhêrin-
Şerê mala mîra notila kerî pezê merî sivê zû bikşîne,
Ber derê Qesar xanê...

Dilo lo mîro, dilo lo mîro,
Dîyarbekir, Dîyarbekir,
Mîra, bega yekî gurra yekî nekir,
Van malxirava, îro orta meydanê golek xûnê çêkir.

## DERÊ MALA ME

Derê mala me genime,
Genim bûye weke rime.
Simlo lîlo, me bi lîlane,
Simlo, nêrîyê van bizinane.

Ez hatim te bivînim,
Tûncika serê te hilînim,
Simlo lîlo, me bi lîlane,
Simlo, nêrîyê van bizinane.

Me derketîye refe bete,
Îzinê bide ez bêm ba te,
Simlo lîlo, me bi lîlane,
Simlo, nêrîyê van bizinane.

Derê malê dare-reze,
Berra here, were leze,
Simlo lîlo, me bi lîlane,
Simlo, nêrîyê van bizinane.

Dara dêrî wê hêşîne,
Xelqê delal xwe dihejîne,
Simlo lîlo, me bi lîlane,
Simlo, nêrîyê van bizinane.

## DE YAR, YAR

De yar, yar şîrin şêxê,
Genim sorkir ber têxê,
Xelqê ketiye derdê malê dinê,
Ezê bûme maşoqê vê torinê.

De yar, yar, şîrin şêxê,
Heyfa minê tê wê heyfê,
Paşî mêrê çê zenda morî mircan
Tu bidî ber serê yekî dinê.

Êlê, şalik şînê,
Hafa mala çi digerî,
Sol û gîzma, dawa delme meke herî,

Tu kuştina min evdalî xudê ha digerî.
De yar, yar, de yar, yar, şîrin şêxê,
Bayê Elegezê tê dilîlîne,
Rîşiyê şerê dihejîne,
Ezê birîndara teme,
Hekîm bîne bira birînê min bicebrîne.

Mala minê devî avê,
Şîrin şêxê gora girt da navê,
Sîng û berê vê terezê usane
Notilî berfek, berfa vê zozanê.

Were wî,lo, lo, de wî lo, lo,
Ezê nava êlê geryam obe-obe,
Navê mêra min bive tobe.

Were wî lo, lo, de wî lo, lo,
Zora şewitî devê rêye,
Qonaxa şêx erebê şêxa ha bi lêye,
Bira xudê me bike du sitêrka,
Bavêje rû ezmanê dinêye.

*Got: Eîgtê Abas*

## DE YO, YO

De yo, yo, de yo, yo,
De axayo, dilê minra Bîdlîse wê yane,
Fêza meda ewire û ezmane,
Binya meda xanmanê mixsî Axecane,
Cezê kire gazî: - Beybê, porkurê,
Bira mala bavê me teva xirab be,
Îsiltoqa romê dîn bilmese,
Wê destê kekê Cezê, bavê Cemîlê,
Kilê çevê Mûşanîyê,benda welatê rojkanîyê,
Belgîyê ser serê çar bavê eşîretê,
Avîtiye ataşgemiyê,
Berê ataşgemiyê daye Bidlîsê rengîn nav girtîne...

De yo, yo, yo mîro...
Bidlîsê gul-gulîne,

Fêza meda ezmane, binya meda gelîyê bê binîne.
Cezê kire gazî:

- Beybê, porkurê, îşev sê roje, sê şeve,
Îsiltaqa romê bêbexte,
Destê kekê Cezê, bavê Cemîlê,
Kilê çevê Têlî Mûşaniyê, benda welatê rojkanîyê,
Belgîyê ber serê çar bavê eşîrê,
Avîtine ataşgemiyê, berê wî dane kela azirganê.

## DE YO, YO, YO

De yo, yo, yo, yo...
Wêdîko lawo, wêderê rûnenî, ew der erde,
De tu derbazî yalê odêbe, cixarekê çêke,
Dûyê cixarê ser milê dayka xwera hêdî-hêdî tu berde.

De yo, yo, yo, yo...
Wêdîko lawo, heyfa dayka te nayê tu heyfaye,
Ne ya koza berxa, ne ya kerîyê mîyane,
Heyfa dayka te tê wê heyfêye,
Ku bûka xêlî bizvire ser xweyane.

De divê, kulê tu têkevî mala Mistoyê Şêxbizinî,
Çawa gullekê berî bedena Wêdîkê lawê min, berxê salê daye,
Çûye nava qîz û bûkê Ademya,
Destê xwe avîte felqa simêla, xwe pesinî.

Wêdîko lawo, dilê dayka te sêle, sêla li hesinî,
Berfekê me barye li ezmana,
Kulya berfê rû erdê şax sekinî...
De yo, yo, yo, yo...

## DEŞTA DUBÊNÊ

Deşta Dubênê dirî,
Merhan axa enirî,
Tirkî li xulaman xurî,
Maşê xulaman birî.

Merhan axa axaye,
Şîrê Misirê kêşaye,
Cizîr şîran vedaye,
Hey werinê, werinê, werinê,
Werinê, lawikno, werinê.

*Got: Abas Ûsoyan*

## DEWRÊŞÊ EVDÎ

Hey delal, hey delal, dilê min dibêye,
Mîr go: – Bejine Dewrêş bira bê dîwanêye.
Mîr go. – Dewrêşo, te dixwezim kivavek goştê kara xezalêye.
Dewrêşê nigê xwe kire rame rikêfe Ulfêye,
Berê xwe da serê çiyêye,
Got: - Mîrê min, bese min bigire mene şenê dinêye,
Min tera anîye goştê kara xezalêye,
Tera hin şîve, hin teştêye...

Mîr go: - Minra bêje pirsa rastiyêye –
Mêrê çê rojê oxirmê giran mêr beranberî çiqas mêr dertêye?
Dewrêş got: - Mêrê çê çiqas çêbe rojê qewimandinê,
Mêr beranberî mêr dertêye.
Mîr gote qewaza, go: - Destê Dewrêşxin kelemçêye,
Situyê Dewrêşxin lelêye,
Nigê Dewrêşxin qeydêye,
Dewrêş vêsibê minra navêje pirsa rastiyêye.

Qewaza kire gazî, wekî cerda kurd Ozman paşa 1700mêrîva jêla têye,
Mîr gote Dewrêş: - Were em bikin karê xwe revêye,
Berê xwe bidine serê çîyêye,
Bira heyfa me bimîne serê havînê,
Payîzê wexta dager dikeve êlêye.

Dewrêş divêje:- Mîr, tera şerme bînî ser xwe navê revêye,
Destê min veke kelemçêye,,
Situyê min veke lelêye,
Nigê min veke qeydêye,
Em wîkin navê xwedêye,
Ezê cerda kurd Ozman paşa 1700 mêrîra têkevim dew û dozêye.

Hespê Dewrêş kişandin tewlexanêye,
Nigê xwe kire rikêfa Ulfêye,
Berê xwe da cerda Ozman paşa 1700 mêrîra têkeve dew û dozêye.
Xwedêyo, tu oxirê bidê Dewrêşê Evdî lawikê êzdîye.

## DEWRÊŞO

Dewrêşo, ezê tera ne bi malim, ne bi mêrim,
Ezê xaka hevt birame, birazya danzde pizmamê mîna şêrim,
Gava çev bi Dewrêşê Evdî, delalê dilê xwe dikevim,
Ezê her hevt bira, her danzde pizmama
Bi qalibekî sabûna reqî li serê girê hemûda şewitî-
Bisekinim bi doxa teşîya xwe ezê tev veşêrim.

Dewrêş dibê – keçê minê tu malê zorî zeftişe navê,
Minê ji te divê konekî reşî erebî bîstûçar sitûnî,
Sitûna nava ji darî binavê,
Minê ji te divê mêrg û çîmanê bajarê
Şeref û Bîngolê nîvê şevan
Pêştir meriv rabe serê sek lawî berde navê.
Min sond xwerye piştî Dewrêşê Evdî,
Delalê dilê xwe min kesek navê.

Keçik dibê –Dewrêşo, xwezka dilê min bixwesta
Dewrêşê Evdî delalê dilê min,
Di ber derê mala bavê mida bihata û rawasta,
Tasekî avê ji min bixwesta,
Minê li şûna fîncanê avê û şûna fîncanê çayê,
Minê cotê zermemika ji Dewrêşê xwera
Borim bikira, bida desta.
Mixseda dilê min gelek hebû-
Minê hêja ji rebê xwe bixasta.

## DÊRA ELBEKÊ

Dêra Elbekê, berê zere,
Şahê ecem hatî sere,
Jê nekirî tu mefere.

Dêra Elbekê berê reşe,
Şah û ecem dûr dadimeşe,
Jê nekirî tu beraşe.
Dêra Elbekê dêrek xweş dêre,
Wê dêrêda cotek xweşmêre,
Yek Ebûzbege, yek Qasimê şêre.

## DÊRAN, DÊRAN

Dêran, dêran, Gulê dêran...
Kendalê sipî deleve, deleva pezî nêre,
Kanî Misyanî şewitî mexelê berxan û mîyane,
Torina mala Nesir, mala Dîbo
Vê sibê zû renê rikêf hev alyane,
Gullekê Hemzokê Hesen nebî mala şêxa dane...
Erefê meydanê tên nalînê birîndara,
Derê konê reşî erebî - qîrîna cotê jinebîyane.
Dêran, dêran, Gulê dêran...
Gulê, bejina Hemzongê Hesen dare, darê sêvê,
Kulê tê bikevî mala Esedê axê,
Nekuje Hemzongî Hesen
Sev xatirê herçar malê mîrete sebira wana pê tê.

Nemînim, nemînim, nemînim,
Ezê sondekê buxum,
Adekî canê xweda bînim,
Paşî Hemzongî Hesen, nevîyê mala şêxa,
Zenda morî-mircan –
Ber serê tu hefsa, tu xorta nagerînim.

*Got: Keleşê Kelo*

## DILÊ MIN

Dilê min evdalê xudê
Pelte ewirê ser Wanêyo,
Girte çîyayê Vardaka şewitî,

Li Bilnixa kavil, Mûşa jêrîn,
Ser mekanî bavê min jêla têyo.
Dilê min evdalê xudê
Pelte ewire ser Wanêyo,
Wê dikimkimî,
Girtîye çîyayê Vardaka şewitî,
Bilanika kavil, Mûşa jêrîn,
Ser mekanî mala bavê min dilekimî.
Kuro, kulmalbavo,
Ramûsana gewran û rindan,
Çîlan û bedewan-
Mînanî hingiv rûnê tev helandî,
Meriv ji xortê xelqêra
Dayne ser pirtî nanê di genimî...

## DILÊ MIN DIBÊYE

Dilê min dibêye, dibêye,
Sibeke li me vebû, sibeke xêrêye,
Gîha hêşîn bûye, avîtîye çoka devêye.
Gulo go: - Zerêye,
Zerê go: - Gewirêye,
Gewirê go: - Çîlêye,
Were em kaxezekê bişînin kavila Wanêye,
Bira Gulî Dirbaz axa bêye,
Îro sê roje, sê şeve,
Hezar hefsid mêrê kardaran girtîye ser konê axêye.

Pêşî dane ber şûran,
Paşî maye ser cotî darî darimêye,
Pêra derketa Mistecendek,
Na wele bavê sedir, syarî Kelo, kekê Heso,
Gulî Dirbaz axangê minî delalî malêye.

De were, were, mêrî – mêrano,
Zirî –zokano, qilîç tapano, ordî bozano,
Çokdarêd di mîrano,
Bavê feqîr, fiqarano.

Kawila wêran li wî sirtî,
Ortanga nîvro esirê
Hezar hefsid mêrêd kardaran, şemsikan,
Bi cotî dar-dariman li ser serê hevdu dixebitîn.
De bira têrra derketa bavî Sedo,
Syarî Kelo, kekê Heso,
Gulî Dirbaz axangê minî delalî malê, dil şewitî.

De were, were, mêrî – mêrano,
Zirî –zokano, qilîç tapano, ordî bozano,
Çokdarêd di mîrano,
Bavê feqîr, fiqarano.

Îro serê min dêşe,
Ber çevê min aloze,
Îro sê roj, sê şeve,
Çîyayê Kepla wêran
Girtîye dûman û toze.

Şahud şihûdê kekê Sedo,
Bavê Heso gelek hene,
Hezar hefsid mêrê kardaran daye li ser sîngê boze.

De berde, axayê min berde,
Xurca zêrîn xweş talane,
Maye erdê.

De were, were, mêrî – mêrano,
Zirî –zokano, qilîç tapano, ordî bozano,
Çokdarêd di mîrano,
Bavê feqîr, fiqarano.

## DILÊ MIN HEWARE

Dilê min heware vê gazîyê,
Hewara mala Şêko girane,
Navsera çîyêda welgerya,
Gullekê li Mecîtê Qaso, serekê cerdbaşya dane,
Ûrt-ocaxê mala Şeko li vê biharê me qelya,

Êlê dayê, rebenê,
Dilê min hewarê vê gazîyê,
Hewara mala Şêko girane,
Mîna gurê sevatê xwe dane nav Sereçîyê.
Gullekê li Mecîtê Qaso li serekê cerdbaşya dane,
Ûrt-ocaxê mala Şeko qelandine danê vê biharê.

Bavo, dilê min kanya qîrê û qetranê diqelya,
Mecîtê Qasoyî birîndare,
Ser birînê xweda dinihêrî, dinelya.
Gullekê Mecîtê Qaso, serekê cerdbaşya,
Gulî nêçîrvana dane,
Ûrt-ocaxê mala kafir Şêko li vê biharê me qelya.

Menal, lawo, menal,
Wexta nalînê te tên -
Ez merûmê ketime qizilmê vê tayê.
Qasim, lawo, dilê dayka te vê sîzane,
Rave temaşeke ordya mala Şêko sekinîye helafê vê meydanê,
Ûrt-ocaxê mala Şêko qelandine dena vê biharê.

*Got: Egîtê Abas*

## DILÊ MIN XOZANE

Dilê min xozane, xweş xozane,
Alîkî deşte, yek zozane.
Ezê dîna xwe didime qol selefê sîyara
Neyî navdane.

Dilê min xozane ne bi tile,
Avê kanya sîsê serda têne duxulxule.
Ezê dîna xwe didime qol selefê sîyara
Navda navînim Qeymesê êzdî
Xweyê hespê qule.

Dilê min xozanê van firîka
Îşev xewa min nayê ber dengê wan wawîka.
Ezê dîna xwe didime qol selefê sîyara,
Navda navînim Qeymesê êzdî ber cênîka...

## DILÊ MIN WÊ MA

Dilê min wê ma, belekî berfê, baranê quntara çîyê ma,
Xem-xyalê dilê min welatê Seredê ma,
Lo bavo, lo bavo.
Ne li virim, ne li wême,
Ezê tevî barana tevî bême,
Xem-xyalê dilê min gelekin,
Temam welatê Seredê mane.
Bavo, xwezila roja dest girtinê,
Ne xwezila roja vê birinê,
Sîng û berê kewa min usane,
Mîna tiryê Heyşterekê, Oşekanê xal ketine.
Ezê çûme Rewanê bilind cîyane,
Ezê fêzêda dinhêrim cîyê çevkanyane,
Binîda dinhêrim – cîyê belgane, gul û sosinane.

## DILO, QURBA

Dilo qurba, tu ser dila bengî nebe,
Bengî dibî, bira pojmanbûna te tunebe.
Hergê pojmanbûna teyê hebe –
Bira xwelîya gunda nava çevê tebe.

Keçikê, dînê, tu ber dêrî nesekine,
Wî kulmalê, nizam dilê te polaye, yan hesine,
Gava tu dikevî bîra mida,
Dilê min evdalê xwedê
Nola lêya nava avê nasekine.

Dilê min pira serê herd newala,
Serda derbaz bûne cote karê kar xezala.
Kê dîye, kê bînaye nêçîrvan
Nêçîra xwe bigire bide dest hevala?

## DINYAYÊ

Bayê çaxir bega şewitî tê bayê van bêdera,
Xwezila xêra xwedê mîrê mirazara caweke xêrê mera bihata,
Bigotana bavê Morof begê rûniştîye, wanî xirabe, fena cara,
Wê oxleme dike kolozek, kaxezê van deftera.
Dinya-dinyayê çi dinyake bê mefaye,
Zibêdê korê nemayê feleka bavê Morof kekê Refayê dayne, pêra nayê.

Dinyayê, dinyayê bayê çaxir begê tê bakî gurre,
Feleka bavê Morof kekê Refayê syarê kulî nîşan qayîne,
Çerxa felekê jêra çep dizivire.

Zibêda korê nemayê, xelqê unda kirye teke tûke,
Feleka mala xweyî şewitîyê teyê nava du hevtîyada –
Me qelandye bav û kure...

Dinyayê, dinyayê, çi dinyake bê mefaye,
Feleka bavê Morof, kekê Refayê,
Syarê kulî nîşan xayîne, jêra nayê...

Dinyayê, dinyayê, hesinê faytona bavê Morof begê cotin,
Ketine rasta sipindarê,
Serê gem û lixavê xwe dikotin.

Salixa ji sûlixa kincê Morof begê
Destê delal başyada hineka dikirîn, hineka jî difrotin...
Dinyayê, dinyayê, dinyake çi bê mefaye,
Feleka bavê Morof, kekê Refayê xayîne, çerxa felekê jêra nayê...

## DOMAM, DOMAM

Domam canê, fêza malê me bi gole,
De tu qolê zêra bide ber enya kever were jore.
Minê bihîstiye teyê kavlê gundada mêr kirîye, kotî şindokê mêrê te çeva kore,
Domam, domam.

Kawa minê sekinîye hafa gêlî, min dinhêre,
Daye ber enînka kever du qol zêrê zere.
Vêsibê dikim kewa gozel ramûsim,
Kotî şindokê mêrê xwe newêre,
Domam, domam.

Malîno, gundîno, bejina kawa mine kine,
Morî, mircanê situda, zend bazine.
Par vî çaxî kewa gozel yeke torine, nazike wê qîzîn bû,
Îsal pêra lê dinhêrim, ketîye destê kotî şindokê mêrê xwe, **bûye** pîrejine,
Ezê bala xwe didimê cote diran dêvda tune,
Domam, domam.

Bejina kawa min darî kêmê,
Dergûşa kurînî ber bedenê,
Bira xêrê ayîkê qe nevînin qomsî nemamê orta meda,
Çawa domam girtin dane malê dinê,
Domam, domam.

*Got: Abas Ûsoyan*

## EVDAL

Evdal, Niftekana şewitî li darê bîya,
Êvare, ro ser Qulîbabada welgerya,
Topal li Temê kire gazî,
Go: - Lawo, neçe ser haveynî mala Reşo,
Heveynî mala Reşo haveynîekî zorî-zorbeye,
Seybisanî Silongî Sadiqê
Bi nîşanî eynelûyan –
Kendalî avê desta ketîye.

Bi nîşanî eynelûyan şeş mêrê me kuştîye,
Mînanî Têcir Helebê
Keftan dibijêre nava mîhan.

Evdal, Niftekana şewitî darî merxe,
Êvare, ro ser Qulîbabada diçerxe.
Topal li Temê kire gazî,
Go: - Lawo, neçe ser haveynî mala Reşo,
Heveynî mala Reşo haveynîekî zorî-zorbeye,
Seybisanî Silongî Sadiqê
Bi nîşanî eynelûyan –
Kendalî avê desta ketîye.
Bi nîşanî eynelûyan şeş mêrê me kuştîye,
Mînanî Têcir Helebê
Keftan dibijêre nava kozî berxan.

Evdal, Niftekana şewitî dara geze,
Êvare, ro ser Qulîbabada diçerxe.
Topal li Temê kire gazî,
Go: - Lawo, neçe ser haveynî mala Reşo,
Heveynî mala Reşo haveynîekî zorî-zorbeye,
Seybisanî Silongî Sadiqê
Bi nîşanî eynelûyan –
Kendalî avê desta ketîye.

Bi nîşanî eynelûyan şeş mêrê me kuştîye,
Vî seybisanî dike heyfa neyartîya kevin û teze.

## EVDAL GOT

Evdal got:- Şêxsim qurban,
Dîdeme xweş dîdeme,
Bihare çemanî kanya dikişe
Tê ser mera leme-leme,
Davê xal, xalê du çîyane.
Tu jî zanî wê sivingê
Serê du diranê min firîye,
Milê min derzîye,
Dengê min der nayê...
Ezê yekê bînim serê te merûmêye,
Nehatîye serê tu evdalî xudêye...

Şêxsim gote Evdal:
- Raste dîdeme, xweş dîdeme,
Bihare çemanî kanya dikişe
Tê ser mera leme-leme,
Davê xal xalê du çîyane...
Ezê herime bavê Batol xane
Ji tera bînim hekîmê –
Dermanê du loxmane,
De lê yeman, de lê yeman...

Evdal got: - Şêxsim, qurba,
Alîkî me girtîye kawila Rome,
Yek ûrise, yek eceme,

Ezê yekê bînim ser te merûmêye,
Nehatîye serê tu evdalî xudêye,
De lê yeman, lê, lê yeman...

Şêxsim got: - Evdalê xuda neyî kine, neyî dirêje,
Êtîmî duhnanî pêre,
Nava miclîsa mêra rûniştîye,
De qewlik bêje...
De lê yeman, lê, lê yeman...

*Got: Memedê Memed, 30 salî, şivan,*
*li Hoktêmbêryanê dimîne.*

## EVDALÊ ZEYNIKÊ

Quling, merimo, têy ser minra diqîrînî, ha diqîrînî,
Mal xirav, têy ser minra diqîrînî, ha diqîrînî,
De wê çevê min kor bûne, perr û baskê te şikestîne,
Kesekê nava gundê meda xudanê xêra tunîne,
Min bavê ber ocaxa şêxê Kine,
Belkî xadê çevê min qencke, perr û baskê te jî bicebrîne.
De li min wayê, li min wayê, li min hayê, li min wayê...

Qulinq, merimo, ez Evdalbûm, gula syara,
Mal xiravo, ez Evdalbûm gula syara,
Xelqê dikir çodarya male, temenê vê dinyayê,
Minê dikir çodarya qîze bûkê axa, axalera,
Gedê meye van sala rabûne divên:
"Evdalê Zeynikê kor bûye maye dewsa van firara".
De li min wayê, li min wayê, li min hayê, li min wayê...

Quling, merimo, vê felekê çima li min ha kir,
Mal xiravo felekê çima li min ha kir,
Xortanî mala xwe cem min barkir,
Kalbûnê li min Evdalê xadê karkir,
Qîze bûkê hetanî êvarê bindarûkê berdevkê Evdalê Zeynikê bûn,
Îro serê xwe li min hejandin, devê xwe li min xarkirin.
De li min wayê, li min wayê, li min hayê, li min wayê...

Quling, merimo, Evdal kore, rê navîne,
Mal xiravo, Evdal kore, rê navîne,

Destê xwe dîwara dipelîne,
Felekê Evdalê Zeynikêra nedûmandye,
Wayê, wayê tu kesîra nedûmîne.
De li min wayê, li min wayê, li min hayê, li min wayê...

Quling, merimo, çîyayê zozana wê bi xemle,
Mal xiravo, çîyayê zozana wê bi xemile,
Avê çeına, kanya serda tênе xule-xule,
Dilê Evdalê Zeynikê li min wayê, îro tijî derde, kule.
De li min wayê, li min wayê, li min hayê, li min wayê...

Quling, merimo, berya wêran rê dirêje,
Mal xiravo, berya wêran rê dirêje,
Ez qulingva dewsa wara hine kerrin, hine gêjin,
Quling, de tu were ez û tuva emê destê hevdû bigirin,
Ezê halê xwe û tera çend kilama vira bêjim.
De li min wayê, li min wayê, li min hayê, li min wayê...

Quling, merimo,çîyayê zozana bîna gule,
Mal xiravo, çîyayê zozana bîna gule,
Mîratê Quling çîyayê zozana refa nagerîne,
Gundîno, maliko, payîze, heyamê dagêrê,
Quling minra nayê, hîvya heval-hogirê xwe dimîne.
De li min wayê, li min wayê, li min hayê, li min wayê...

## EVDALÊ ZEYNIKÊ, ŞÊX SILÊ

Evdal go: - şêx Silê
Şam, Heleb, Diyarbekir –
Ew tê hesavê goveka dinê,
Wez diqûrim notilî qulingê vê Emenê,
Deng ji min dernayê.
Ezê meriveki bişînim bal mîrê Qelenîyê,
Bira dermaneki minra bişîne, ezê bixum –
Dengê minê here qîz û bûkê vê Bexdayê.

Şêx Silê go: – Evdal, gotina teye,
Şam, Heleb, Dîyarbekir ew tê hesavê, go, weka dinê,
Hê mîrê Qelenîyê xemilîye, gul ketinê.
Xelqê sivê şebeqê radive tela bextê xwe dixweze xudêtala,

Evdalê Zeynikê rizayê xwe dixweze –
Ji mala Şero vê torinê.

Evdal go: – Şêx Silê, ezî ne kinim, ne dirêjim,
Notila tarihan nav gelîya şax, şax kilama divêjim,
Şayî- miclîsa ez fêza rûnêm,
Tu ber min ne bejine, ez dengbêjim.

Şêx Silê go: - Evdal, gotina teye, tu ne kinî, ne dirêjî,
Notila tarihana gelîya kilama şax, şax divêjî,
Min tirê Evdalê Zeynikê dengbêje –dengbêjê mîran, hakiman,
Çawa kalekî 85 salî rûnê ber tendûrê jêra qelîbêtka divêjî.

## EVDALÊ ZEYNÊ Û ŞÊX SILÊ

Bejina Evdalê min ne kine, ne dirêje,
Terezanî dev çîçekê, devê kanya xwe davêje,
Gelî omidno, boy xadêbe,
Qe kê dîye, kê bînaye –
Şêx Silê çoka xwe bikute çoka Evdalê Zeynê,
Sê roj û sê şeva pêra bêje.
Bejina Şêx Silê min ne kine, ne dirêje,
Terezanî dev çîçekê, devê gelîya xwe davêje,
Ew sonda ku min sond xariye,
Ezê yekî bînim serê te, heta kurê kura rabe bêje.

## EVDALO

Evdalo, dilê min xeme,
Ava cewan gelîya tê guşe-guşe, leme-leme,
Kesî xudan xêr tune,
Destê Evdalê Zeynikê bigire,
Bavê Rewanê,
Ser hekîmê tatî eceme.

Evdalo, qulingê berîyê têye bi qîrîne,
Sewta qulingê malxirav yek erde, yek ezmane,

Herê qulingo, çevê mine korin,
Baskê te şikestîne,
Qulingo, malxiravo, çevê min saxke,
Baskê xwe bicebirîne.

Herê Evdalo, Rewanê bi zebeşe,
Hespê Evdalê Zeynikê binîda nagire, xar û meşe.
Kesî xudan xêr tune,
Destê Evdalê Zeynikê bigire,
Bavê Rewanê –
Ser hekîmê tatî eceme.

*Got: Kamilê Qaso, s. 1950*

## EVDO BABOK

Evdo babok, kedexeye,
Cano babok, kedexeye,
Malika Evdo wê lê rêye,
Cirmê Evdo wê ser meye.

Evdo babo, tu bike kare,
Malan barkr ji êvare,
Kî ez kuştim, şêr esmere.

Bînin, bînin, hespan bînin,
Teng û bera lê bişidînin,
Mala Evdo pê birevînin.

Karken, karken, hespan karken,
Teng û bera lê dutakin,
Mala Evdo pê xilaskin.

Dor qesirê Evdo mermer bere,
Şîrê Evdo dibêm cehwere,
Xûn rijya gerdena zere.

Qesirê Evdo nava deştê,
Herçî hato şîr li piştê,
Fermana Evdo gehîştê.

## EVDILÊ ÎSÊ

Yanê deşta Silûcê deşteke pene,
Sibeye û dûmanekê girte erde, mijeke girte esmane,
Hineka digo –berfe, hineka digo –barane,
Hinek dibên- syarê erban û unisa li berîyê hev didane.

Êvare, cerdekê syara derketin ji xebê, binê berîyêno,
Ezê bala xwe didime van syara, nizam kê û kêno.
Hineka digo – Evdal Îsêno, hineka digo- syarê paşêne,
Hineka digo- syarê Hamê Mûskêne...

Keçikê ji bin konê bavê xwe derketye,
Digo, ev syarê hanê ne syarê paşêne,
Ne syarê Hemê Mûskêne,
Ne syarê Evdalê Îsêne...
Ji êvara xwedêda heta şebeqa sivê mêvanê min vê bejinêne.

Ji Hînê, hatî welatê Hînê,
Steyrik li min hilat, steyra berî Medînê,
Şewq û şemala xwe daye sûka Dîyarbekir,
Sûka Mûsilê, welatê Mêrdînê.
Keçik dibê, delalê mala min nexweşe li nava vê nivînê,
Delalê malê ji malê dinyayê têr nabe,
Ezê rabim kirasekî sorî çîtê Helebê li bejin û bala xwekim,
Guharekî heyderî, xirxilekî erebî,
Tasekî zêr bavêjime sêrî, xem û xîyalê dinyalikê gelek zefin,
Ezê ji nîvê şevan pêştir bi lawikê xwera birevim...

*Got: Hemîd Sadoyan*

## EVDILMECÎT

Hey wayê, hey wayê,
Şerekê me qewimye,
Seregolanê şewitî wê bi sûse,
Tivinga destê Evdilmecît mawîzere, kirîye 12 zêrê hûnane,
Evdilmecît sê denga dike gazî:
- Hesê, bira serê meydanê çêbe, çê bixebite,
Emê vê sibê berî eskerê heyderadin,

Mera hin nave, hin namûse.
Hay hayê, weyê xweyo,
Bûye mizgîne, bela bûye rûbara dinyayê,
Heydera revyane, beglera berdayê.

Heylê wayê,
Seregolanê şewitî dinhêrim cîkî dûde,
Eskerê heydera 1700 mêre,
Eskerê beglera çila yekî kême.
Evdilmecît sê denga dike gazî:
- Temê bira serê meydanê çêbe, çê bixebite,
Emê berî eskerê heyderadin,
Derbazkine delavê Hevreng wî alî çême.

Heylê wayê,
Sergolanê wexta dinhêrim wê bi çîmane,
Tivinga destê Evdilmecît mawîzere, kirîye 12 zêrê hûnane,
Evdilmecît sê denga kire gazî:
- Temê bira serê meydanê çêbe, çê bixebite,
Emê vê sibê berî eskerê heyderadin,
Xelqê binhêre – kê berxe, kê berane.
Hey wayê, hey wayê, xweyo,
Bûye mizgîne, belabûye rûbara dinyayê –
Heydera revîne, beglara berdayê...

## EZA

Eza li serê mêrgêyo,
Keçik diçûne gûnya lo,
Dest avîte kemberê lo,
Xirmîn kete benîya lo.
Ha dikim gewrê ramûsim lo,
Gune sitûyê cînara lo.

Peya bûm, sive diçûme lo,
Erfûtekî dev rêda lo,
Ha ji dura almastim lo,
Wê di nîveka berêda lo.

Eza li serê mêrgêyo,
Keçik diçûne qirşika,
Dest avîte kemberê lo,
Xirmîn kete şimika,
Ha dikim gewrê ramûsim lo,
Orta sîng û memika lo.

Eza li serê mêrgêyo lo,
Keçik diçûne hol-hola,
Dest avîte kemberê lo,
Xirmîn kete xirxala,
Ha dikim gewrê ramûsim,
Gune stûngê hevala.

## EZ BENGÎME

Ez bengîme, ez bengîme,
Sêva sorim xelatîme.
Ez nola berfa yekşevîme,
Ser kurxalê xwe bengîme.
Şevekê sê cara revîme,
Qûl û benda ez nedîme.
Hespê lawikê min dudune,
Yekî boze, yekî dine,
Avîtine textê Qersa wêran,
Li bazara Qersê simê wan şikestîne.
Ez bengîme, ez bengîme,
Sêva sorim xelatîme.

*Got: Werda Şemo, 100 salî, ji gundê Pampê,*
*li nehya Aparanê,s.1948*

## EZ BILBILIM

Ez bilbilim, bilbilim,
Bilbilokê siravîye,
Şev û rojê dixul-xulim.
Ez bilbilê gêjim,
Şev û rojê dibêjim,
Eşqa bejina dirêjim.

Ez bilbilokê lalim,
Bilbilok û soravîyê.
Hey hilgir, hilgir, hilgir,
Hey hilgire bêroteye,
Teyaro tecîmeye,
Dê vexum eşqa teye.

## EZ BI XULAMA

Ez bi xulama qend û darê,
Bejin û balê, sîng û bera,
Ezê li ser sîngê keverda çêkim xan û manê, koçik û sera.

Memikê keleş kawa min mînanî coteke fîncanê ferfûrî,
Meriv dayne ser taximeke zêr zîvîn,
Bide destê axaleran...

Keçê, bira destê min li ber destê te tobebe,
Destê min ji pêş emelê malê nebe,
Bira devê min li xala sûretê sor biketa,
Bira sed darî binê pîyê min xistana,
Sêsid zêrî cirma min û tebe.
Keçê, kulmalbavê,
Were em qewil-qirarê xwe hevra bikin...
Kuro, kulmalbavo,
Diçî kavila Ezurma şewitî
Qutînga derd û dermana ji minra bikir,
Heçî temya min li teye,
Bîne li cî, paşê bizvir.

*Got: Mêralîyê Xudo*

## EZÎZO MÎRZO

Wey lo, wey lo Ezîzo Mîrzo, Çelengo Mîrzo,
Lê belê bira min nizanbû dunya haye,
Dunya sultan Silêman pêxemberra nemaye.
Li Koçerê derbekê dane bavê Ahmedî Tîtale,
Bala xwe didinê bê xeme, bê feydeye,
Wey lo, wey lo, wey lo.

Hevsê divê: - Dabirê rebenê,
Divê, konê bavê Ahmedî Tîtalî mezine,
Girek ji girê vê berrîyê,
Rave ji pişta kona bidine çîyayê Xerza,
Bera kona bidine deşta Xezalê,
Bira Hecî Mehmedê Mistê neçe koçeryê,
Cem pîreka xwe rûnenê,
Pesinê weysêrê xu venede,
Bira nevê – minê derbeke daye bavê Ahmedî Tîtale,
Ezê silsila mala weloka bitemrînim ji dunyayê,
Wey lo, wey lo, wey lo.

Hevsê divê: - Dabirê, rebenê,
Pîroka haj pîroka,
Gulle têne bavê Ahmedî Tîtale,
Lê belê şehîdê bavê Ahmedî Tîtale
Gele hene li meydanê,
Vê sibê şer xweşkirye newala Xelîlo li ser çoka,
Wey lo, wey lo, wey lo...

## EZ LEYLOME

Ez Leylome, Leylome,
Ez şekirim, gezome,
Kulîlka ber bi rome.
Ez Leyloka herrome,
Bayê sibê tê ji pêra,
Şimaqî da ber zêra.
Êvare, agir dûne,
Zerî ji himamê çûne,
Mirazê dila bûne.
Êvare, agir geşin,
Zerî ji himamê dimaşin,
Mirazê dilabexşin.

*Got: Kubara Çolo, ji dîya xwe bûye 1919 salê,*
*ji gundê Koribilaxê li nehya Aparanê*

## EZÊ ÇOME

Ezê çome Cizîrê tu li berda,
Hatim Xopanê tu li berda,
Te kiras-kitane kurtik serda,
Posîyê erebî pîşok jê berda.
Ez çom Cizîrê hilvan gemîyan,
Şexyanê mezin –refikê qumirîyan.

Mêrdîne, Mêrdîne, mala min,
Te li mêrgan hêşîne,
Deşt xweşe, loda biçîne.

Ez çome Cizîrê hil van kelekan,
Şexyanê mezin reftîyê ordekan,
Me silav, sed silav çev beleka.

Ez çome Cizîrê, ez çom tu li berda,
Navê te Sînem xanime-
Metê te ço li dinê da,
Sîngê te himayîle,
Navê xerîbyan têda.

Ordeka gola Sare,
Cîmerxê pencek lêda.
Navê te Sînem xanime,
Metê te ço li dewletê,
Sîngê te himayîle, bejina te li qulbetê.

*Got: Mêralîyê Xudo, ji gundê Cercerîse,*
*li ser nehya Aparanê, 35 salî*

## EZ ÇÛM

Ez çûm derî dadayî,
Derî zerze venavin,
Keçik ji xewê ranave,
Wê ji halê min çawa be?
Derdê dilê min geleke,
Heft pût hesin hildike,
Xadê mala qomsî xiravke.

*Got: Werda Şemo*

## EZÊ ÇÛME

Ezê çûme Mûşa şewitî serî têlê,
Min ji bavî Koroxlî syarî Gêncora –
Bazar kir hene neynûk dermanê vê simbêla.

Ezê çûme Mûşa şewitî li van kaşa,
Bavê Koroxlî syarî Gênco tê digere bi sapoga bi van meşa,
Ji xudê axa û besîle,
Bavê Koroxlî syarî Gênco rîşya li ber çevê xortane,
Gera mala Xêlite,
Berxa mala Emere.

Perîşanê bi sê denga kire gazî,
Go: -Gulê rebenê,
Bavê Koroxlî syarî Gênco,
Di hebsa Mûşê pirr nexweşe.
Berê sibê emê rabin, dua bîkin
Ji bavê Koroxlî syarî Gêncora,
Belkî vebe dergekî vê xêrê.

Ezê çûme dîharê Qasimya şewitî berî baye,
Min dî çadirê bavê Koroxlî syarî Gênco
Ser komê xulama wa vedane.
Bila pesina xwe bide bavê Edo –syarî Gênco,
Husêyîn paşa nav neyara bêje –
Sînor li min fireye.
Kula xudê tu bikevî mala sultan Reşîde,
Çawa topî topinan girtîye kirye taşxana Mûşê,
Kolozê devetûkî, şara Dîyarbekirî ser simbêlan
Girtîye toz û gend û gemare...

*Got: hosta Heyro, 73 salî, nîvxwendî, li Êcmîazînê dimîne*

## EZÊ QULINGIM

Ezê qulingim, qulingê vê berîyê,
Heval, hogirê min çûne welatê xerîba, ezê mame tenê,
Bira devê min xaliziltê kewa gozel keta,
Bira dewletê destê min bigirta bavîta kelê.

Ezê qulingim, qulingê vê berîyê,
Minê hêlîna xwe çê kirye fêza Qaqizmanê,
Xwezila min wî evdîda hatî-
Çevê wî ji zêra tijîbe,
Pişta wî ji mêra qalinbe,
Sîyarekî bozî çar salabe,
Berê xwe bide zozana Elegezê,
Berê belekîyê û şevek şeva çirya paşin,
Kêleka kawê rûnî, papax xarke ber kofîyê...

*Got: Mamoyan Qadir*

## EZ WERDEKA GOLA ŞÎNIM

Ez werdeka gola şînim,
Li ber ava ez dimînim,
Ez werdeka gola şînim,
Li ber ava ez dimînim.

Ez maşoqê hemû gula,
Ez dermanê hemû dila,
Ez maşoqê hemû gula,
Ez dermanê hemû dila.

Ez delalim, ez ezîzim,
Gulê çîyara ez dilîzim,
Ez delalim, ez ezîzim,
Gulê çîyara ez dilîzim,

Ez gulim, gula geşim,
Nav welata ez dimaşim,
Ez gulim, gula geşim,
Nav welata ez dimaşim.

Eze reşim, reşa mala,
Mîna Zînê, Memê Ala,
Eze reşim, reşa mala,
Mîna Zînê, Memê Ala.

Ez tu dila nahebînim,
Xwe ezîzê te navînim,
Ez tu dila nahebînim,
Xwe ezîzê te navînim.

Ez gulim, gula mala,
Ez dermana hemû dila,
Ez gulim, gula mala,
Ez dermana hemû dila.

Gul maşoqê hemû gula,
Û dermana hemû dila,
Gul maşoqê hemû gula,
Û dermana hemû dila.

## EYŞANA MÎRZE

Qirqopanê xalan ketim bi gongile,
Deşta qota û sora hev avîtiye.
Koma paşin li ser koma pêşin difitile.
Min got: - Eyşanê, hey Eyşanê,
Serê xwe dernexe kêleka konê reşî erebîra,
Elekeçelî bextê tera nêçîrvane.
Gullekê berî bedena Eyşana Mîrze daye,
Pêra qetandye xemla porre,
Ji pêra şûşa neynikê, kutaye kevçika dile.

Lê, lê, lê, lê Eyşanê, hey Eyşanê,
Kêlma şîrin xeberdanê,
Sed heyf, bûka mala giran, bûka mala Celalîyanê.

Qirqopanê xopan ketim çi mifaqê ser tifaqê.
Berfekê barî êvara xudêda avîte bend saqê,
Min got: - Eyşanê, hey Eyşanê,
Serê xwe dernexe kêleka konê reşî erebîra,
Elekeçelî bextê tera nêçîrvane.
Gullekê berî bedena Eyşana Mîrze daye,
Pêra qetandye xemla porre,
Ji pêrra qetandye cote torrê ber xeneqê.

Lê, lê, lê, lê Eyşanê, hey Eyşanê,
Kêlma şîrin xeberdanê,
Sed heyf, bûka mala giran, bûka mala Celalîyanê.

## ELO PAŞA

Elo paşa çîyayê Şengalê koma xwe dicivîne,
Elo paşa eskerê xwe lê digerîne, digerîne.

Wî de berde, berde, berde, hayê berde, wayê berde,
Elo paşa tu bi xwekî xwedêkî,
Tê berdî, Xezala mi berdî.

Elo paşa çîyayê Şengalê wê bi sitrî ha be sitrî,
Eskerê Elo paşayî girane, hatîye lê êwirî, lê êwirî,
Wê de teyê Xezala min destê zorê girtîye anîye,
Karê Xezala minê bê xwey, bê xudan malda mane,
Derdê xwe halara yek divêje, yek digirî.

Wî de berde, berde, berde, hayê berde, wayê berde,
Elo paşa tu bi xwekî xwedêkî,
Tê berdî, Xezala mi berdî.

Elo paşa çîyayê Şengalê wê bi nike, hewa nike,
Lê hêwirîye eskerê Elo paşayî tirke,
Şê û şêbiskê Xezala min usane –
Wê derketiye bin pêşa kurke.

Wî de berde, berde, berde, hayê berde, wayê berde,
Elo paşa tu bi xwekî xwedêkî,
Tê berdî, Xezala mi berdî.

Elo paşa çîyayê Şengalê wê bi xarda, ha bi xarda,
Teyê Xezala mi destê zorê girtîye anîye duh êvarda, ji êvarda,
Kara Xezala min tenê bêxweyî, bê xudan malda mane.

Wî de berde, berde, berde, hayê berde, wayê berde,
Elo paşa tu bi xwekî xwedêkî,
Tê berdî, Xezala mi berdî.

Elo paşa çîyayê Şengalê wê bi mije, ha bi mije,
Ba û bagerê seda têye guje-guje,
Min nizanbû Elo paşayê bavê hûrkê min bikuje.

Wî de berde, berde, berde, hayê berde, wayê berde,
Elo paşa tu bi xwekî xwedêkî,
Tê berdî, Xezala mi berdî.

Elo paşa haye, min bi haye,
Bira qeda bê emirê minî herçar rojê vê dinyayê,
Teyê bavê hûrkê min kuştîye,
Hûrkê min bêxwey, bê xudan malda mane,
Xezalê pey bavê hûrkara cem te sax namîne
Li rûbarê vê dinyayê.

Wî de berde, berde, berde, hayê berde, wayê berde,
Elo paşa tu bi xwekî xwedêkî,
Tê berdî, Xezala mi berdî.

*Got: Basoyan Mîrze, 55 salî, ji gundê Talînê*

## EMAN, EMAN

Eman sebirê kavranekê têye ji Eceme,
Serbar kole, binbar xeme,
Bahare, xelqê ketye mal-halê dinyalika gewirik,
Ezê keleş gewrê ketim pey bejina te zerîyê.
Eman sebirê, qulingo vê sibê têyî vê riayê,
Bahare, xelqê ketye mal-halê dinyalika gewirik,
Ezê ketme derdê bejina te serayê...
Qulingo vê sibê têyî ji vê Îranê,
Bahare, xelqê ketye mal-halê dinyalika gewirik,
Ezê keleşgorî – bejina te seyranê.

## EMAN, EMAN, EMAN

Eman, eman, eman...
Lê dayê rebenê, çîyayê Emereşa kavil ketim van beyara,
Îro girtibû dor Têlî Heso, bavê Îbo hezar hevsid mêrê van neyara,
Kulê tu têkevî mala Hesê Beşkî wê bi tenê,
Gullekî berî bedena Têlî Heso daye, îro sê roj, sê şeve
Li gêdûka Emereşa kavil têye nele- nalê birîndara.

Eman, eman, eman...
Çîyayê Emereşa kavil ketinê çem –kanî, eskerê Elî Atêşî girane,
Çîya û banî, deşt û zozan tev hilanî,
Kulê tu têkevî konê Hesê Beşkî wê bi tenê,
Heçî gava pênc fişeka davê ser kerxana tivingê,
Ser neyarê xweda dike kafirsitanî.

Eman, eman, eman...
Çîyayê Emereşa kavil ketim wê bi gere,
Eskerê Elî Atêşî girane, 1700 mêre tev nagere,
Kulê tu têkevî konê Hesê Beşkî wê bi tenê,
Serê meydanê dengekî ewile kire gazî:
Digot mêrekî heyfî, ji min vegere...

Eman, eman, eman...
Konê kekê Elbarî bavê Rihanê dinîya xanê li xanlixê serê rêye,
Bihare hate çûne êlê lêye,
Bala xwe bidine konê Elbarî bavê Rihanê,
Têda têye dengê cotê jinebîyaye.

## EMÊ DÊRANÊ

Emê, dêranê, koçikê Senemê wê bi nike,
Mala Qadê pêşyê şere, paşyê disilike.
Solekafirê sê denga kire gazî:
- Feqî Ûsiv, min pozê bavê ten.o,
Ezê sive vî çaxî ez teda vala bikim danzde gulê dûçike.

Koçika Senemê dare bi şîlane,
Feqî Ûsiv ketîye şerê mala Sulekafire tena bi gîzmane.
Sulekafirê kire gazî, go:
- Feqî Ûsivê Reşkel, min di pozê bavê tenyo,
Ezê sive vî çaxî te bikujim,
Danzde jina ji te vegerînim ser xweyane.

Emê, merûmê, koçika Senemê li vî berî,
Birre syarê mala Qadê syarbûne,
Hemûşke bi çuxe, bi teterî,
Sulekafirê kire gazî, go:
- Feqî Ûsivê Reşkel, min di pozê bavê ten.o,
Ezê sive vî çaxî te bidime goşê vî mezelî.

Emê, merûmê, dilê min kanya qîre, vê qatranê,
Kesek tune cavê bide mala Şamilê Xezalê kurê vê Qurxanê.
Bira kula kor têkeve mala Silekafirê,
Min birandîye dengê dengbêja,
Êvarda min qelandiye sewata vê quranê.

## ERÊ SEYDIKO

Erê Seydiko, seydîvano,
Bilûlbêjo, nêçîrvano.
Bav kore pîj ji çavane,
Tilbî ji destane,
Şilbî ji pîyane
Çawa derpekê
Seydikê min dane.

Herê Seydiko, gurê berîyê me sêne,
Birrekî nêçîrvanî me ereba jêla têne,
Nêçîrê hemûya karî karxezalan,
Nêçîrê babê Seydikê minî tune seydewane.

Herê Seydiko, gurê berîyê li min çarin,
Nêçîrê me ereba hemû karin, baskîd xezalin,
Nêçîra babê Seydikî minî tune seydewane.

Herê Seydiko, bab kore ji çevane,
Çawa derpekê pişta stûyê Seydikê min,
Seydewanê min daye.

Herê babo,
Tu rabe cîyê min bikole,
Balgekî kaxçînê ji minra çêke,
Ezê gazinê xwe ji kalî babê xwe nakim,
Ezê gazinê xwe ji koca wê felekê dikim.
Tu bizvire li mal –
Dewata Seydikê xwe teze bike.

*Got: Armên Gazaryan, 70 salî. nexwendî, ji alîyê Şataxê, ji gundê Gomêrê. Niha dimîne li gundê Şahanlûyê, nehya Vêdîyê.*

## ESKER HATO

Esker hato, esker hato,
Esker hato Sitembol hat,
Gazîyê bolê boyê hat,
Telpa axayê sor hat.

Xan hato, kelhek çêkir,
Xîma kelhê asêkir,
Kelhokek bo xwe çêkir,
Xîma kelhê asêkir.
Çî kelhokek berîne,
Çî wêranek berîne,
Berda gurmek hêşîne,
Meskenê pir zêrîne.
Çî kelhokek bê ave,
Çî wêranek bê ave,
Berda gurmek zirave,
Meskenê pir bi lave.

*Got: Mêralîyê Xudo*

## EŞÎRÊ

Eşîrê digot, kuro kulmal, rabe binhêr çika bejina min çawane?
Kuro, digot eşîra min bejina te ne hevalê tu bejnane,
Gidî bejina te zirave, layîqî kimbera zêrane,
Çevê te belekin, dev-lêvê te mînanî belgê kaxezane,
Zer memikê te notlanî cot sêvane.
Wekî mirin şevek şevê payîza têkeve nava xal û xirtê gerdenê sîng û bera,
Kavilê gundada merîyara him rojîye Remezane.
Eşîrê, Eşîrê, Eşîrê kavilê gunda bêy te nabe
Sebira min, soz nemane.

Eşîrê bejina te zirave, ta rihana dora kire,
Hela binêr teva sibê daye, sîya êvarê xwera hêdî-hêdî lê dizvire,
Malîno rabin temaşekin, Eşîra min layîqe
Morî-mircanê destda temam zêre,
Eşîrê, Eşîrê sebra toyî li Eşîrê.

Eşîrê, Axmixanê dinhêrim ne bi dare,
Hila binhêr kawa mine kubar gul-sosinara şîn dibe,
Avê belekîyara wê tê xare,
Vê sibê dilê min geşe, melûl nabe,
Eşîra min, kavilê gundada tu ya minî,
Dîsa destê min te nabe,
Eşîrê, Eşîrê, Eşîrê, dinîya ne milkê bavê tu kesîye, soz nemane...

## ÊLÊ BAŞÊ

Êlê başê, serê min dêşe,
Dilê min nûbe-nûbe,
De tu were cîngan dayne, bila zû be.
De lo, lo, wey lo, lo.
Bejina keleş kawa min zirave
Mîna bîçima minareye,
De lo, lo, wey lo, lo.
Êlê başê, minê şerek kirî ji Gewrêra,
Min se û dû sî quruş dabû bihangê şerê, rîşî badanê,
Kawa min biçûke,
Nikare bide ser kofîna vê kitanê.
De lo, lo, wey lo, lo.

## ÊLÊ DÎNÊ

Êlê dînê, ava lîzê têye ji lîzê,
Pêlê avîte ser pêlê,
Pêlê ortê avîte ser kevirê bilqîzê,
Xwezila min wî evdî – mala xezûrê wî gundabe,
Pişta wîye werane germbe, malê dinê zorî zefbe,
Kubixekî hespanî sîyarbe, rojê denekî mala xezûrê xwedave,
Pişta xwe bide pişta xasîyê,
Kêleka xwe bide keleka baltûzê,
Destê xwe têke nava zer memikê qîzê,
Were narî, narî,
Kum kolozê gede lawikê xwe dinhêrim bi romanî.

*Got: Werda Şemo*

## ÊTÎMO GEDE

Êtîmo gede, kirasê şerîn ez xwenakim,
Zozanê Elegezê sare, hersê mehê havînê têda teyax nakim,
Minê sondekê xariye, adekê pêra,
Ezê gede lawikê xwe nava heval hogirada
Tucar, tucar deynidar nakim.

Êtîmo gede, kirasê şarîn wernagirim
Zozanê Elegezê sare, hersê mehê havînê têda nadebirim.
Ezê nizanim, nemamîya kê tolêye,
Ezê ber çevê gede lawikê xwe dilsarim.

Êtîmo gede, malê me danîne li zozana li vî çîyayî,
Serra girtîye ewire, nave sayî,
Gelo kengê mizgîneke xêrê minra bihata,
Bigotana gede lawikê te hatiye ji eskeryê xêr û şayî.

*Ji sitrana Reşîtê Baso*

## ZAVA

Ew kê ji himamê derket dere,
Kekê min ji himamê derket dere,
Kolozê xa girêda sorgul daye dere,
Xukê tu bi qurbanbî, çuxê mila zere.
Ew kê himamê derket jore,
Koloz girê da, sorgul daye dore,
Xukê tu bi qurbanbî, çuxê mila sore.
Ew kê ji himamê derket min naskir,
Kolozê xa girêda sorgul lê qeyaskir,
Dost tu qurbanbî, çux li mila rastkir.

## ZEVA TÊ

Zeva tê ji hemamê,
Ji hemamê derket, borî,
Pêça xwe pêça bû,
Rihan dabû dorê,
Daykê bi qurban bî,
Ser mila çuxê sorî.
Zeva tê ji hemamê,
Ji hemamê derket dere,
Pêça xwe pêça bû,
Rihan dabû bere,
Daykê bi qurban bî,
Ser mila çuxê zere.

## ZEVÎYA DELALÊ

Zevîya delalê dilê min buhurî,
Wekî min porkura xwedê
Koma xweyî û xudanê xwe şerm nekira,
Minê bida tirmixa xwe, biçûma alî.

Lawiko qurban, min go qûlo, te go –qûlo,
Daw delinga da me pûlo.
Ezê çi bikim, wekî yazî bi qedera di xwedêyo,
Wekî korbe, şilbe min qebûlo.

Ser me xwedêye,
Binya meda şiva rêye.
Ez çi bikim, wekî yazî miqedero di xwedêye,
Heta hîv, hîve jî –eybek lêye.

Rengê gundê me kirkûte,
Gede lawikê min
Yekî bejin bilindî, çev belekî, şel sûte.
Minê şerma xwey, xudana nekira,
Minê bida teşîya mûmê, kulya sipî bida dû te.

Lawiko qurban,
Qotika sûto gul avtûno,
Nizam kê delalê dilê minra çi gotîye,
Îsal xeyîdye mala bavê min qaçxûno.

Ezê sêva-sêva terim,
Ezê qerefîla çarde perim.
Çaxê çevê min delalê dilê min nakeve,
Qudûmê çokê min tunene pê bigerim.

Lawiko qurba, rênga kavilê Heko min bû du rê,
Kastûm bêxe, bavê alîyê surê,
Herçikê welatê xerîv tê serê delalê dilê min-
Bira bê serê min porkurê.

Lawiko qurban, xerîbitî ne tu kare,
Istûyê min alîyê teda çiqa xare,
Zemanekî usa hatîye –
Bira birêra bê îtbare.

## ZEYNÊ

Lê Zeynê, Zeynê, Zeynê,
Zeynê, Zeyneba min,
Lê Zeynê, Zeynê, Zeynê,
Tev çîla min, çevreşa min.
Zeynê çûbû qirşika,
Zeynê,Zeynê, Zeyneba min,
Dîlber çûbû qirşika,
Tev çîla min, çevreşa min.

Şeqe-şeqa şimika,
Zeynê, Zeynê, Zeyneba min,
Şeqe-şeqa şimika,
Tev çîla min, çevreşa min.
Ha dikim Zeynê ramûsim,
Zeynê, Zeynê, Zeyneba min,
Pêra ketime heneka,
Tev çîla min, çevreşa min.

Dest avîte memika,
Zeynê, Zeynê, Zeyneba min,
Dest avîte memika,
Tev çîla min, çevreşa min.

Baxçê Zeynê pîvaze,
Zeynê, Zeynê, Zeyneba min,
Pîvaze girtî saze,
Tev çîla min, çevreşa min.
Mêrê Zeynê toleze,
Zeynê, Zeynê, Zeyneba min,
Baxçê Zeynê keleşe,
Tev çîla min, çevreşa min.

Kelema leme-leme,
Zeynê, Zeynê, Zeyneba min,
Mêrê Zeynê eceme,
Tev çîla min, çevreşa min.

*Got: Ahmedê Mîrazî*

## ZEYNEVA XÛŞK

Ay de lo,lo, ay de lo, lo, ay de lo, lo, lo birano,
Reşîd paşa komekê şandîye koşa, lo dûzêye,
Pey Hemê Mûsê di biraye,
Bira nesekinin bên kavila Malatyêye,
Werra derketiye çîn- mîdalê eskeriyêye.

Zeyneva xûşk çû aliyê di malêye,
Gote Hamê Mûsêye:
Reşîd paşa gotiye: – Tu birava werine kavila Malatyêye,
Werra derketiye çîn- mîdalê eskeriyêye.
Me berêda kuştîye hevt mêrê wê malêye,
Bike xebera min kevnêye,
Berê xwe mede vê oxirêye,
De lo, lo, de lo, lo,ax lo birano.

Hamê Mûsê divê – hespê axelera
Bikşînin ji tewlêye,
Bidine ser piştê zînê dewletêye,
Tangekî sistkin, duda bişidînin,
Merra derketiye çîn- mîdalê eskeriyêye.
Emê berê xwe bidine kavila Malatyêye,
Ey de lo, lo, de lo, lo.

Hamê Mûsê nihêrî Peşîd paşa li palkonêye,
Selamekê Reşîd paşara vedaye.
Reşîd paşa divê: - Hespê eskera bivine alîyê tewlêye,
Têkine ber gîhê, oncêye,
Tivingê milê wan ji mil bikin,
Bivine alîyê malêye.
Dest-pîyê Hamê Mûsê bira girêdin,
Bidine ser sikûna tewlêye.
Wana berêda kuştîye hevt mêrê vê malêye.
Serê Hamê Mûsê, şeş bira jêkin bi qemêye,
Bira xûn têkeve ber xûnêye,
Ay de lo, lo, ay de lo, lo.
Hamê Mûsê divê: - Reşîd paşa,
Ferman, fermana xudêye,
Qanûn –qanûna dewletêye,

Xulameki bişîne koşka dûzêye,
Pey Zeyneva xûşkêye,
Bira nesekine heta vira bêye,
Ay de lo, lo, ay de lo, lo.

Xulam berê xwe dide koşka dûzêye,
Lê dinhêre Zeynev xanim balkonêye,
Selamekê Zeynev xanimê vedaye,
Divê: - Hamê Mûsê derbaz dike kef û sedê dinêye,
Hamê Mûsê divê: -Bira nesekine,
Zeyneva xûşk heta vira bêye.

Zeynev xanimê bala xwe didê
Reşîd paşa palkonêye,
Selamekê li Reşîd paşa vedidêye.
Hamê Mûsê gote Zeyneva xûşkêye:
- Bêje, Reşîd paşa ferman – fermana xudêye,
Qanûn-qanûna dewletêye,
Şeşa bikuje, yekî bide ser xatirê min kevnêye.

Zeynev xanim divê: - Dilê min yarî, mi bi yarî,
Hemê Mûsê serekê hezar hevsid sîyarî,
Derdê dilê min zevê teze Memed Alî,
Ay de lo, lo, ay de lo, lo, lo, lo.

Zeyneva xûşk hespê axelera tîne alîyê malêye,
Divê: - Temo, lao, here bêje Reşîd paşa:
Ferman-fermana xudêye,
Qanûn-qanûna dewletêye,
Ezê bidime te Zeyneva metêye,
Çend sala hevra derbaz bikin kêfa dinêye..

Temo syar bû, berê xwe da kavila Malatiyêye,
Lê nihêrî Reşîd paşa palkonêye,
Selamekê Reşîd paşa vedaye,
Divê: - Reşîd paşa, ferman fermana xudêye,
Qanûn-qanûna dewletêye,
Me berêda kuştîye hevt mêrê vê malêye,
Te kuştîye bavê min, her şeş apê min,
Xûn ketiye ber xûnêye,
De lo, lo, ay de lo, lo, lo.

Were ezê bidime te Zeyneva metêye,
Çend sala derbaz bikin kêfa dinêye.

Reşîd paşa got: - Temo, lao,
Tuyî zyarrînî,
Tu vî aqilî ku tînî, dicivînî,
Sozê mêrê berê tu min naxapînî?
Ay de lo, lo, ay de lo, lo, lo.

Zeynev xanimê gote Temo: - Tuyî zyarrînî,
Tu rimê hildî, rimê neqedînî,
Soraniyê hilde alîyê çepê lêxe,
Heyfa bavê xwe, herşeş apê xwe hilîne...
Ay de lo, lo, ay de lo, lo.

*Ji sitiranên Mehmedê Mûsa*

## ZERZEMO

Zerzemo, zemo-zem oidim,
Koyîne dêre ferz oldim,
Naçime dikanê hedada,
Bazar nakim guhara,
Naynim qîza neyara.
Zerzemo, zemo-zem oidim,
Koyîne dêre ferz oldim,
Naçime dikanê etara,
Bazar nakim guhara,
Xew xweş bûne paşilê yara.

*Got: Emerê Egît, ji gundê Şamîranê,*
*li nehya Aştarakê*

## ZERÎ DOMAM

Zerî domamê ewiran û ezmana ringe-ringe,
Zerî domamê hilda mêkut çû dora sîngî kone,
Telamekî jê pekyayîbû, guzeka zerî domama min ketibû,
Xizêma zerî domamê ji bêvilê firîbû.
Ez çûme cem zîvkerî, min go:

- Zîvkero, tu xwekî û zarrê xwekî,
Tuyê xizêmê zerî domama min çêkî,
Ne daynî ser dezge û kiranane,
Ne bikutî çakûç û zindane,
Bikutî bi diranane, bikişînî bi lêvane.

Bahê xizêma zerî domama min –
Kodek şîrê di teyrane,
Çil gayê mêşê ber barane,
Çil gayê ber cotane,
Çil qantir, qûntirê di devane,
Lê eva xizêmê hela ne layîqî zerya mine,
Ew layîqî pîr û paravê van gundane.

*Got: Galûst Gûlamîryan*

## ZEWAL LAWIKO

Olo zewal lawiko, tuyê wê diçî, min bibe xwera,
Emirê mino, tuyê wê diçî, olo min bibe xwera.
Ezê şîv teştêkê biçînim cenîya tera,
Hergê sibê heval hogirê dora te got çîye-çî nîne,
Bêje, minê keweke gozel revandye, anîye nefsa xwera.
Gede lawiko tê wê diçî zewaltîyê min bîr neke,
Min sêveke sorke li berya xweke,
Wextê welatê xerîbyê bîra te dikevim derxe qasekê serda mêzeke.

De were, were, zewalî lawiko,
Olo gede tuyê wê diçî, ez çawa bikim,
Emirê min, ezê bibim teyrekî qereqûş, wele li ezmana rabim,
Wê keskê salix-sûlixê delalê minra nede,
Ezê qasekê kêfêra lê peyabim, lê, lê lê weylê...

Mala xweyê rê şewitî,
Cenyê lawikê min torbû lê şimitî,
Mala qomsî, nemama xiravbe,
Min xwest ez herim pêşyê,
Wê bêjin dilketyê wê bû, dilê wê şewitî.

## ZIRAVÊ

Ziravê, ho Ziravê,
De lo rabe, ho Ziravê,
Kî kore Zirav navê.
Ziravê ji mala axê,
De lê, lê rabe Ziravê,
Reşkezî bendê şaxê.
Ger xwe nabim qonaxan,
Ziravê ji mala began,
Reşkezî li bendî çekan.
Ziravê ji mala mîran,
Reşkezî li bendê şîran,
Gel xwe nabim nêçîrvan.

## ZOZAN BER ZOZAN

Zozan ber zozan,
Ber zozana germin,
Sîngî qerqaşe-
Memike nermin,
Anîya kevere –
Bijange cemin.

Zozan ber zozan,
Zozanê mene,
Zozana wêda
Reş konê mene.

Yarim xingirî,
Sed car xingirî,
Heya xemilî-
Govend betilî.

Zozan ber zozan,
Zozane xweşin,
Tev çevbelekin,
Birûnge reşin.

Sîngî qerqaşin,
Memike reşin,
Zeryê van sala
Zef kumireşin.

Zozan ber zozan,
Zozanê mene,
Wêda welgerî –
Reş konê mene.

*Got: Gula Ozman*

## YARA MINÊ

-Yara minê, dilê min Tevînga berfê vê baranê,
Halê dilê minra girtye semta Elegezê jorda xar bûye ser doşe-doşa Axbaranê,
Were ramûsanekê nevsa canê min keremke, îsal çend saleke mame wê demamê.

- Lawikê min xeyîdye berê xwe daye çîyayê Zorê vê serhedê,
Agirê dilê min qe vênase kerê bûzê avê vê cemedê,
Minê qirar kirye kesekî kilîta çivtê zer memikê mi veneke- pêştirî erebê lawê şêx Hemedê.

- Bayê Elegezê têye fîke-fîke,
De tu rabe bejn û bala zirav bitevzîne şê û şêbiska şeke, çev biryê belek kilde, kofî kitana ber enînga kever çêke,
Kofîyê xarke, qotikê halê dilê minra serda sîke.

Şûşenga dilê min derzîye,
Ezê dikim herime Tilbîsa xopan ser hekîmê loqma şûşenga dilê min derzîke.

Yara min, tu palkona jorin çi digerî,
Pêşê derme hilde, kondelê te bilinde bira neke av herî,
Sala îsalin tu usanî, tu yeqîn qesasê serê min digerî.

## YAR DUGMELÎ

Yar Dugmelî, Dugmelî,
Memik sêvê enzelî.

Yar Dugmelî, em yekin,
Bax û bostan xelekin,
Bêhna memika gelekin.

Yar Dugmelî, em cotin,
Bax û bostan kevotkin,
Bêna memika ew sotin.

Yar Dugmelî, em sêne,
Bax û bostan hurmêne,
Bêna memika xweş têne.

Yar Dugmelî, em çarin,
Bax û bostan hinarin,
Bêna memika em xarin.

Yar Dugmelî, em pêncin,
Bax û bostan birincin,
Bêna memika em sêncin.

Yar Dugmelî, em şeşin,
Bax û bostan zeveşin,
Bêna memika çi xweşin.

## YARIM BARÎ

Yarim barî, barîke, hey barîko,
Barî barîke, hey mala min.

Qesira berrojê, hey barîko,
Koçika li berrojê, hey mala min.

Sibhan nav rojê, hey barîko,
Xirîna bişkojê, hey mala min.

Qesira li Nizarê, hey barîko,
Koçika Nizarê, hey mala min.

Sibhan êvarê, hey barîko,
Xirîna guharê, hey mala min.

Qesirek li wê bû, hey barîko,
Koçkek li wê bû, hey mala min.

Ronaya rojê bû, hey barîko,
Barîkim tê bû, hey mala min.

## YAR SOSIN

Yar sosin, sosin,
Sosinê li mêrgêde mayî,
Keçik çûne dîlanê,
Hemû kemberê badayî,
Ez diçûme ramûsana,
Aqil û sewda nemayî.
Yar sosin, sosin,
Sosinê mêrga hêşîne,
Keçik çûne dîlanê (dewatê),
Hemû bi kemberê zîvîne,
Ez diçûme ramûsana,
Aqil û sewda tunîne.
Yar sosin, sosin,
Sosinê mêrga beleke,
Keçik çûne dîlanê,
Hemî bi kemberê xeleke,
Ez çûme ramûsana,
Aqil û sewda geleke.

## YAR XECO

Yar Xeco, yar Xecokê,
Şîrinê, şememokê,
Radimûsim şev û rokê,
Ez bextê bavê teme.

Yar Xecoka mêrînê,
Te xizêm zêrînê,
Tirşî, tirşî, şîrinê,
Ez bextê bavê teme.

Yar Xecokê, biçûkê,
Yar yeman, yeman,
Yar delelokê biçûkî,
Te ramûsim, hêja bûkî.

Yar Xecokê, yar Xecokê,
Şîrin şemamokê,
Çok dayne ser vê çokê,
Ramûsim şev û rokê.

Yar Xecokê bijarî,
Yar yeman, yeman,
Tu fîstanê asarî,
Ez bextê bavê teme...

## YAR ŞEMAMÊ

Yar Şemamê, Şemamê,
Gewirê rindê domamê.
Yar Şemamê, em sêne,
Bîna memikê keçikê-
Kavila gunda xweş têne.
Yar Şemamê, em cotin,
Bîna memikê keçikê-
Çolbîyê gunda em xarin.
Yar Şemamê, em pêncin,
Bîna memikê keçikê-
Kavilê gunda ça sincin.

*Got: Gula Ozman*

## YAR ŞEMAMÊ, ŞEMAMÊ

Yar Şemamê, Şemamê,
Gewrê rindê, domamê.
Yar Şemamê, Şemamê,
Hafêd mala zeveşin,
Yar Şemamê, Şemamê,
Bînê memika çi xweşin.

Yar Şemamê, Şemamê,
Hafêd gunda avsêncin,
Yar Şemamê, em cotin,
Qîz û kurê kurmancin.

*Got: Hemoyê Ûsiv*

## YEMAN GUNDO

Yeman gundo, zerî dibên em zerîne,
Hine zerî hene çîle-qerqaşe û sipîne,
Bejne zirave, qendelîne
Bejnê kirasê çîtê ûrisîne,
Nigada kondelê firingîne,
Gore nexşê êcemîne,
Sêrî fînogê tulizîne,
Dorê şer û şimaqîne,
Pozê zirave pîjîne,
Pozda xizêma şirike bi zêrîne,
Guhda guharê gupikîne,
Diranê sedefîne, dev lêve qelemîne,
Çene kurte, degirmamîne,
Zerîyê usa wexta sivê zû ber derê bavê xwe disekinin,
Kalê 70 salî, heta xortê 14 salî gava çev pê dikevin,
Hiş aqil serîda namînin...
Yeman, yeman, gundo, zerîyê usa
Derê tu dosta kêm nebin, dost gunene.
Yeman, yeman gundo, zerî hemû dibên em zerîne,
Zerî hene pîse jê kotîne,
Patika stuyê wana tijî rişk-sipîne,
Bêvlê wana meriv tirê bixêrîne,
Penî para qelişîne,
Neynikê tilî-pêçya usanin, notlanî merê ecemîne,
Mêrê qirikî qijik dibê: - Evda xudê, here mala cînêr mera çirê bîne.
Gava diçe mala cînêr çirê bîne,
Notlanî kavirrê derbiharê hîlegirtî dikuxe, sê cara çirê sivderêda ditemrîne.
Mêrê qirkî-qijik heta sibê îşiqê ber çevê xwe navîne.
Mêr dibê: - Evda xudê ca pişta min bixurîne,
Gava wan neynikê xweye notila merê ecemî ser pişta mêrê qirikî qijik dibe-tîne,

Notila cewê diqelişîne, xûna reş ser pişta mêrda tîne,
Heta sibê, ew belengaz lezetê pişta xwe navîne.
Yeman, yeman gundo, zerîyê usa
Bira rastî gurê serê çîya neyên,
Gur gunene...

*Ji sitrana Reşîtê Baso*

## YÊZDANŞÊR

1.

Ji Stembolê hat fermane:
Top kişandin ser Bohtane,
Bedirxan beg mîrê wane,
Heware, mîro - mêrane.

Mîro, ez benî, fermane,
Binya darê Sipindaran,
Top kişandin li kendalan,
Vêk dan Cindîyê Bohtana,
Heware, mîro - mêrane.

Mîro, ez benî, fermane:
Erwaxe, xweş Erwaxe,
Esker hatî ji Kermaxe,
Yêzdanşêr mêrê heqe,
Heware, mîro - mêrane.

Erwaxe, berê zere,
Osman paşa hat sere,
Yêzdanşêr sereskere
Vêk dan Cindîyê Bohtana,
Heware, mîro - mêrane.

Esker ketî ji Kerkûkê:
Anî topa biçûkê,
Vê car mîr hate sûkê,
Heware, mîro - mêrane.

Esker hatî ji Mexêzê:
Top berda nav Hatêzê,
Cendekan bûne rêzê,
Heware, mîro - mêrane.

2.

Dilê min wase, wase,
Mîr sekinî ser bana Kinyase,
Go, qasid hat, -
Go, welle mîran –
Ber xerc û xeracê te mane asê.

Mîro, çi dinyakî hîn û kûne,
Hespan bînin lê biken zîne,
Xwedê ava bike –
Dewleta Yêzdanşêr – pê mîr Sêvdîn.

Mîro, Bana xanê dîwan danî,
Şandî pey maqûl, cindîyê Bohtan – temam anî,
Go, me seferê ser Besta Belekan,
Na welle ser mala Mîranî.
Xwedê ava bike –
Dewleta Yêzdanşêr – pê mîr Sêvdîn.

Mîr gote xulaman,
Go: - Werin ber Kelekan,
Siwar bibin van mehneka,
Derbaz bibin Bona xanê,
Na welle Besta Belekan.

Mîran revîn, xwe dan çîyan:
Mîr Sêvdînê qowimê çîyan,
Ji mala mêran revîn –
Mane jinan,
Xwedê ava bike –
Dewleta Yêzdanşêr – pê mîr Sêvdîn.

Ez Şahînim, Şahînê Dînim,
Xweyê şîrê hêşînim,
Tifeka devzêrînim.
Ez kekê Mûsome,
Xulamê Yêzdanşêrim – mîr Sêvdînim,
Xwedê ava bike
Dewleta Yêzdanşêr – pê mîr Sêvdîn.

Ez Şahînim, Şahînê Qutim,
Ez bi dilkê xwe dixebitim,

Heta fermana Yêzdanşêr neyê,
Ez cîkê xwe nalipitim,
Xwedê avake –
Dewleta Yêzdanşêr – pê mîr Sêvdîn.

Pira Boxozê kevanaye,
Tivoka destê Şahîn axa –
Şeşxanaye,
Şahîn axa gazî kirî,
Go: - Mîr Yêzdanşêr, tu rehetbe,
Çompera pişta pira Boxozê
Xema xudê canê meye.
Xwedê avake –
Dewleta Yêzdanşêr – pê mîr Sêvdîn.

3.

Ez xelefim, xelefim:
Hewara mîrê mîrane,
Ez xelefê şûvîme,
Hewara mîrê mîrane.

Ez baranê kûvîme:
Hevara mîrê mîrane,
Mîr Sêvdîn sereskere,
Hewara mîrê mîrane.

Ji Stembolê hate fermane:
Hewara mîrê mîrane.
Ji Kerxanê hate fermane.
Hewara mîrê mîrane.

Erwaxê, xweş Erwaxê:
Erwaxê, xweş Erwaxê,
Yêzdanşêr sereskere,
Mîro, ez benî, fermane.

Paşa kaxezekî şand
Ji mîranra, go:
"Qebûl bikin vî kaxezî".
Mîran kaxezê wî qebûl nekirine.
Kaxez destê xulaman

Qet-qewîn kirine,
Qet minet jê hilnekirine.
Gotye – Tacê Romê qebûl nakim,
Ezê romîya xilaz kim.

*Gotine: Armênak Amrîkyan û Pêtros Kandalyan*

## KAVIRR

Kavirr çerand me çerînin,
Berxik çerand me çerînin,
Deşt û zozan me gerînin,
Keçikê serreş me xapînin.
Keçikê, ka kavirr, kavirê min?

Kavirr çerand gêdûkê,
Berxik çerand gêdûkê,
Sed û sê kavirr birine sûkê,
Kavira kurr nextê bûkê.

Ho, ho ka kavirê min?
Mal kavirekê bidine min,
Guhbelo bûye dijminê min.

Kavirr çerand Helekdaxê,
Berxik çerand Helekdaxê,
Sed û sê kavirr birine taxê,
Kavira kurr pêşya Xemê.

## KAVRANEKE JÊLDA TÊYE

Kavraneke jêlda têye,
Ji gelîya germêye,
Kavran, kaviraneke Meke Medînêye,
Ser karvîn lawê Ûsivê Exêye.
Go: - Tişê bike bilezîne,
Têjîrê ji xêm bikişîne
Teng û bûsa bişidîne,
Xu bi kavrînra bigêjîne,

Pirsekê ese minra bîne-
Kela Bazîdê çi heye, çi tunîne?

Kavranbaşî cava Tişê dide.
Go: - Kela Bazîdê tiştek tunîne,
Pirsa dikî ji Eyo xarzî,
Tev 45 girtîyê dewletêye,
Hezar sîyarê bînbaşî serra sekinîye...

## KAWA KUBAR

Kawa kubar nola siteyra reşê hîvê pêra şere,
Kanîya gundê me mezine,
Derd û kulê dinyalikê hemû para mine,
Teyê avrûyê çeva, qinyatê dila ez kuştime.
Berfa gundê me şepeye,
Xezala karê xwe hildane temaşya,
Ya hatîye serê min evdalê xwedê,
Neyê serê gurê serê çîya, gur gunene...

## KAWA MIN

Kawa min gula sore lê, lê, lê,
Dosta min gula sore domamê.
Belgîyê xwe da jore lê, lê, lê,
Kewa min pispore, domamê.

Xwezila ez têlik bûma lê, lê, lê,
Ha ji têlê bizina domamê.
Çevkê min xewa şîrin lê, lê, lê,
Destî ser bazina delalê.

Xwezila ez têlik bûma lê, lê, lê,
Ha ji têlê karika domamê.
Çevkê min xewa şîrin lê, lê, lê,
Destê min ser memika domamê.
Xwezila ez têlik bûma lê, lê, lê,
Ha ji têlê berana lo, lo, lo.

Çevkê min xewa şîrin lê, lê, lê,
Destî li ser guhara lo, lo, lo.

## KEKO, BIRANO

Keko, birano,
Padişayê syarayî lawîne,
Tûxfermanê xwe hildaye, digerîne,
Şenge syarê min girtîyê olimêye,
Gelo nizam wê kîalî bişîne...

Keko, birano,
Berfê çîyayêd bilind dilîlandin,
Nêçîrvana karêd xezala berîyêd jêrin ditirsandin,
Şede-şûdê şenge sîyarê min gelek hene,
Girtîyê olimêye,
Gelo nizanim kîalî şandin.

Keko, birano,
Teyrê syarayî belebane,
Qayîşe keseke, zengilî bîstûçar zimane,
Şede-şûdê şenge sîyarê min gelek hene,
Gava dibe şingînîyê kosemisiryada,
Hingê neyara vedigerîne ser xweyane.

Keko, birano,
Lo were, lo were,
Hekîmo, malxiravo ji Hemayê,
Gotî melhemê xwe hilde were vê serayê,
Şede-şûdê şenge sîyarê min gelek hene,
Birînê kosemisiryane,
Dibê kewê didêda, kew lê nayê.

Keko, birano,
Syarê min syarê boza dêl berdayî,
Divê seferek rabûye ha li çîyayî,
Şede-şûdê şenge sîyarê min gelek hene,
Gava şingînya kosemisirîya, dibê, bûye
Çerxeçîyê syarê hesp westyayî.
Keko, birano,
Çîyayêd bilind cînarê xirab çêtirin,
Xeberê nekesa ji tîrê qecerî notirin,
Gere yanê meriv ji komêyî pirve,
Yanê guhayî kerrbe,
Nava xelqê xerîbda îja bidebirin.

Keko, birano,
Dibê, hatîye qulingê rû bi xorî,
Mêrg û çayîrê me êwirî,
Dibê, dengê vî qulingê malxirav wisane –
Mîna meriv malxwê mala wî dimirî.

Keko, birano,
Çîya gote çîya –
Kanê xelqê li van cîya?
Dibê – ew jî koçer bûn, dageryan...

Çîyayê bilind rê naçine,
Nav dengê şenge syarê min derketîye yê mirinê,
Keko, birano,
Kesek li çîyayê bilind rê çê nake,
Nav û dengê mirina şenge syarê min derketîye êl û êşîra,
Kese bawar nake.

Keko, birayo,
Hekîmo, malxiravo,
Tî maçînî,
Dû-dermanê xwe hilanî,
Hekîmî malxirav heylo dike, nake-
Şenge syarê min nazivirînî.
Heylo birano,
Min go – birîna şenge syarê min li hinava,
De wê dêşe,
Heylo birano, hemû gava...

## KELA ERVAXÊ

Kela Ervaxê devî çayê,
Osman paşa girtî devê topa dayê,
Şemongê Xelîf kire gazî, go:
"Ozman paşa, min devî maka dêg.yo,
Tême kuştin, tucara nayême rayê".
Meke mîrê min meke,
Xwe li bextê dîn îslamê asê meke,
Şemongî Xelîf mêrekî heyfe, bê nav meke.

Kela Ervaxê wê bi dare,
Eskerê Osman paşa girane,
Jorda hatî xare.

Go, Ozman paşa,
Min devê maka dêg.yo,
Ma çima tu nizanî-
Şerê Şemongî Xelîf Bedirxan begê
Mînanî şerê Rostemî Zale.

Kela Ervaxê wê bi tirî,
Eskerê Ozman paşa girane,
Hatî dihêwirî,
Kula tu bikevî mala Ozman paşa-
Şemongê Xelîf Bedirxan begê girtîye
Birîye vê hêsîrayê...

*Got: Lezgîyê Fêro Ozmanyan,*
*60 salî, li Yêrêvanê dimîne.*

## KÊLA MAMO

Kêla Mamo min şerm nekir,
Şerê egît, efata, boke û berana
Minê têr temaşe kir.

Kêla Mamo ji van quta,
Dengê tivinga Resûlê Silo
Bela bûye herçar malê me reşkota.
Resûlê Silo sondekê xarîye quranê, di kitêban-
Tucara lingê xwe nevêje faytonê,
Hetanî hewarya me tê herçar malê me reşkota...
De weylo, weylo, weylo...

Kêla Mamo ji wan riza,
Dengê tivinga Resûlê Silo belabûye herçar malê me wan saza,
Resûlê Silo sondekê xarîye quranê, di kitêban-
Tucara lingê xwe nevêje faytonê,
Hetanî hewarya me tê herçar malê me wan saza...
De weylo, weylo, weylo...

## KERÊ BÊRÊ

Kerê bêrê reşe,
Mîratê bêrê reşe,
Bin kurîya wê bi nexşe,
Malxwê malê Heveşe
Ne li bin teqû teqe.
Teqim tu kolayî,
Sed barî kelayî
Cemîyet û sefayî.
Kevanim heleqeye,
Ser milê min ya teye,
Oldaşo dora teye.
Kerê berê boze,
Mîratê berê boze,
Bin korîya wî lîloze,
Malxwê malê Nevroze.
Kevanim heleqeye,
Ser milê min ya teye,
Oldaşo, dora teye.

## KEÇEL

Keçel, keçel, keçelo,
Serê sêrî mencelo,
Keçel birin ber avê,
Lê kirin ava beravê,
Keçel, keçel, keçelo,
Serê keçel mencelo.
Serê keçelî rûte,
Qîzika ser qûte-qûte,
Keçel, keçel, keçelo,
Serê sêrî mencelo.
Keçelê minî dîne,
Wêda tê xwe qure-qure dihejîne,
Keçel, keçel, keçelo,
Serê sêrî mencelo.

*Got: Elîyê Hecî, 30 salî, ji Elegezê. 1942s.*

## KEÇ MEYREMÊ

Keç Meyremê, Meyrokê,
Dayê korê, emiro cano seyrokê.
Keç Meyroka Sasûnî
Dayê korê, emiro cano seyrokê.
Sasûnî rabe, rûnî,
Dayê korê, emiro cano seyrokê.
Keç Meyroka talorî
Dayê korê, emiro cano seyrokê.
Talorî taxa jorî,
Dayê korê, emiro cano seyrokê.

*Got: Emerê Egît, ji gundê Şamîranê*

## KOLANÊ

Kolanê teng û tarî,
Devê min ser memikê yarî,
Heçikû min şekir xarî.
Kolanê me pirr beste,
Kuro pîjo, hêdî weste,
Tu dê bikevî, bişkê deste.

## KONÊ RÎŞÎ

Konê rîşî mezin ber me vebû,
Vê sibê keleş gewira min xeyîdîye,
Çevê xwe reşî wê kêl neda,
De lê, lê, lê, lê...
Qazê got: - Werdekê,
Were em herin ser gula Gerînekê,
Xudê mirazê min têlî delal hasil bikira
Ser kanînga Murtila begê,
De lê, lê, lê, lê...

Kavila gundê me terence,
Hêşîn bûye gîhayê deh pencere,
Were ramûsanekê vê sibê min keremke,
Serê min dêşe, dilê minra qence,
De lê, lê, lê, lê...

## KOÇERÊ

Koçerê lê koçerê, lê koçerê dilê min ma li gunda,
Koçerê roja me derketiye Girîdaxê wê bi yane.
De vê sibê xule-xula avê belekyane ser halê min teda wê helyane.

Koçerê gazî dikir: - Kuro, kulmal, eva hala qe ne hale.
- Malîno rabin temaşekin vê sibê derdê dila
Koçera min nesaxe, wê bethale...
Koçerê lê koçerê, lê koçerê dilê min ma li gunda.

Koçerê roja me derketîye Girîdaxê kêrî-kêrî,
Vê sibê koçera min derketiye derê malê, pezê bavê xwe da bêrî,
De dînê tu were kavilê gundada ramûsanekê min keremke,
Mala bavê xiravbe, tê vê sibê kê ditirsî, kê newêrî.
Koçerê lê koçerê, lê koçerê dilê min ma li gunda.

Koçerê Girîdaxê dinhêrim wê bi sûse,
Konê bavê koçera min vegirtîye perê Girîdaxê cîkî dûze,
Malîno rabin temaşekin,
Koçera min konê bavê xweda mîna hîva çardeşevî diçûrise.
Koçerê lê koçerê, lê koçerê dilê min ma li gunda.

## KULIK- KERRO

Herê Kerro, herê bavo,
Emer axa dîwanek giran danî:
Gazî êla kîkan, milan kir.
Giranfînê canî ferfûrê li orta dîwanê danî:
Heçî kesê fîncana ferfûrî ser taca zêrîn hilîne,
Here hespê Bêcanê ji mîrê Erebanra bîne, bê,
Perîşanê ji xwera hilîne,
Hey wî, wî, wey wî, wî, hey wî, wî...

## KULIK GO

Tew, tew, Kulik go:
-Dayê malxirabê,
Hey lê li min, hey lê,
Hey wî, wî, wî, wî,
Tu min netirsîne ji xalane,
Hey wî, wî, wî, wî.
Lingê min kevirî çexmaxe,
Terêşî dara keve,
Hey wî, wî, wî, wî,
Mala donzde hezar malî Gêsî,
Hey wî, wî, wî, wî.
Hema îzina xwedê ezê bînim koka birane.
Hey wî, wî, wî, wî,
Ax, hey wî, wî, wî, wî,
Ax, hey wî, wî, wî, wî...

## KURO GEDE

Kuro gede qurba deşta hanê bax, bostane,
Heylo lawiko qurba ezê pirakê çêkim destê van hostane.
Kuro gede, ezê destê gede lawika xun bigirim tê derbaz bin,
Ezê paşê destûrê bidime nas, dostane,
Were yeman, yeman, yeman gundo.

Kuro gede, kelikçîya kelik kejî
Kuro gede, herro hergav neyê nesekine hewişa mala mino.
Kuro gede, ezê navê te nizanim
Ji ber eşqa, ezê tera dibêm to zevangê bavê mino...

Kuro gede kulmal, bejin ziravo ji hesino,
Herro hergav neyê nesekine hewişa mala mino,
Kuro gede, ezê navê te nizanim
Ji ber eşqa ezê tera dibêm tu zevangê bavê mino,
Were yeman, yeman, yeman, gundo.

## KURMALÎ

Hey Kurmalî, hey, hey, hey, oy,
Hey mala min, mala min, mala babê min.
Îro bavo, ez dimirim,
Min neve nav mirîya,
Min bibine oy, oy, oy, oy,
Heylo serê Gernesîsê bilind veşêrin,
Miqabilî hersê di gelya...
Hey delal, hey, hey, sed car hey...
Hey subihan tê dengê van şaşxana, hey, oy, oy, oy...
Hey, hey, Kurmalî, ax, ax,
Ne welle, tê dengê şeqe-şeqa van şeşxana,
Hey, hey, oy, oy, oy...
Hey, hey, bavo, oy, oy, ax...
Tê bînî sosin, beybûn, kulîlkan.
Hey, hey, dil pîr nabe...

## KILAMA GULÊ Û EVDALÊ ZEYNIKÊ

Evdal go:
"Ezê ji teyra teyrê mijim,
Kerba Gula Xamûrê kerî gêjim,
Cîyê gul rûnî, ezê tobekim
Ez rûnanîm, ez nabêjim".

Gulê got: "Evdal, çevê mine reşe belane,
Min rojê hevt cara kilê sibhanê kil dane,
Lê hevt dengbêjê mîna te
Bona min jinê xwe berdane".

Evdal got:"Gulê merûmê,
Minê bostanekî çandîye kundirê bejî,
Benda wî girê da ber hêsira çevê xwe û te jî,
Xwedê huba dilê min bavê dilê te jî.

*Got: Kamilê Qaso, ji gundê Tilik*

## LAÛJOK – NIVÊJOK

De wayê, wayê, wayê,
Dayê merûmê,
Vê sivê tirsa min ji merê beleke,
Bextê tedame,
Qetê xwe ji mezelê xerîba veke,
Xerîbe bêxweyîne,
Cinyazê wana xirab neke.

De wayê, wayê, wayê,
De dayê, dilê min çawane,
Dilê min çawane,
Xwedê xirab bike mala doxtirane,
De min go, dayka dergûşa –
Rewşa govenda, piçûka birane.

De wayê, wayê, wayê,
Dayê merûmê,
Konê bavê Alê cotin,
De min go bavê Kamil mirîye,
Îdî nav-dengê bavê Fîlê li dinyayê nayê gotin.

De wayê, wayê, wayê,
Dayê merûmê,
Kanîke li vî berî,
Şîn dike ji gulê, ji gîhayî,
Derdê cegerê malxirav zore,
Nahêle ez herim ser vî birayî.

De wayê, wayê, wayê,
Dayê merûmê,
Min go, vê sivê tirbê van cindîya
Emê çêkin welatê xerîba bilindcîya,
De bira biharê serda neyê –
Ave, avêd belekîya,
Wey, wey, wey...
De wayê, wayê, wayê,
Dayê merûmê,
Vê sivê Gulê gote Zeynê,
Go: - Dayê, eze çiqase dilhilatî,

Bavê Kamil mirîye,
Bavê Alê aksor kirin ji vî welatî,
Heta aksoryê vegerya –
Omidê jinî kes nemane, lê bûne qatî.

De wayê, wayê, wayê,
Dayê merûmê,
Kulê malxiravê, ta xayînî,
Serî sorî, binîda şînî,
Serê sal mehane tê,
Teyê qonax girtîye, tu dêşînî...

De wayê, wayê, wayê,
Dayê merûmê,
Herê kulê, herê kulê,
Xwedê xirav bike yêr û miskenê tu lê.
Herê kulê tu çawanî,
Tu derdekî bê dermanî...

De wayê, wayê, wayê,
Dayê merûmê,
Herê kulê, kula dînî,
Ta bêbextî,
Bûkêd mala bavê Alê wê dimînin,
Kula malxiravê, te dey nekir,
Bêbext bûyî,
Bûkêd mala bavê Alê te peya nekir.

De wayê, wayê, wayê,
Dayê merûmê,
Malê me danîne Elegezê li bilincîya,
Li bilincîya,
De dayê, merûmê,
Dayka dergûşê li welatê dûre,
Dê û bavê wê ne li wêne.
Gelo sêrî çi cirya bû,
De divê, wê olimêra dest danîye,
Destê wê nagire bike helebya mîya.

De wayê, wayê, wayê,
Dayê merûmê,

Min go – Vê sivê çi teveke jê teyrokê,
Çi teveke jê teyrokê,
Min go, li derê mala Casim barîye,
Min merûmê, heta çokê,
Gelo nizanim nifira kê bû,
Bive nexweşê şev û rokê.

De wayê, wayê, wayê,
Dayê merûmê,
Sûkê, ezê neçime sûka sûkê,
Ezê neçime sûkê,
Gelo nifira kê bû li bavê Casim kirine,
Belkî nevîne zevê û bûkê.

## LAK DÎNE

Lak dîne, lak dîne,
Ketye sergovendiyê çemila dihejîne.
Keçê, ez kesîbim, perê min tunîne,
Gundê me dewate,
Dewat mala meye,
Belgîyê te qutnîye,
Wê berpala teye,
Kanya vê beyazê –
Ew şerbeta teye.

## LAW

Law hemî lawêrin,
Lawiko pibanada,
Dar hemî kinêrin,
Qîz hemî bi mêrin,
Serxweşo bi çolanda.

Law hemî lavijin,
Dar hemî mij-mijin,
Qîz hemî kurkujin.
Alal çandî devkê Cinîne,
Beybûn çandî devkê Cinîne,

Karvanek hatî dê biçî Mêrdînê,
Eyşokêd wanê xamikê Dînê.

Alalım çandî devkê Parêzê,
Karvanek hatî dê biçî Tewrêzê,
Eyşokêd wanê min dî li rêzê.

Eyşê, Eyşê, Eyşê,
Bab Eyşikê nade,
Bilindê qerqaşê, bab delalê nade.
Min dîbû hewşa dêrê,
Tu binê qeytanê,
Tu binê kêrê,
Eyşokê sibe li xêrê,
Hey bab delalê nade.

Min dîbû rex cênîkê,
Şûştî bi ava Hebîkê,
Ji naçît bêhna bûkê,
Bab delalê nade.

*Got: Galûst Gûlamîryan*

## LAWIKO QURBA

- Lawiko qurba, we zozanê me çêrandin,
Xam berdîra serê dawa xwe gerandin.
- Keçikê, dînê, qîzê taxa we
Xortê taxa me helandin.

Keçikê, dînê, mala me jî, mala we jî,
Orta mala me û weda hê şîn dike,
Wî kulmalê minê av daye
Pê hêsirê çevê xwe û tejî.

Dilê min dîwarê golesorê,
Xweş tê dengê horehorê.
Heta ez evdalê xwedê çûm welatê xerîbyê
Zivirîm hatım,
Destê kewa gozel girtin dane kotî şinodekî –
Dewarê mêra destî zorê.

- Dilê min bejina te wardekê,
Lê dixîne sura sivê, bayê vê şebeqê.
De bira xwedê dê û bavê xiravra qebûl neke,
Çawa ez nedame xortê çarde salî mal bi gundda, -
Heft salyêda dilêm têda:
Ez girtim dame seyê şivantyê,
Sivê heta êvarê xwe davêje gola herî
Nav çemûrê gerînekê.

- Baran barî ji xwedêda,
Lêyî kişya devî rêda,
Kê dîye, kê bînaye yareke merya hebe-
Kavla gundda, merî ramûsana jê nestîne
Paşila dêda.

- Kerî pezê sorî xurte,
Axmixanê korî girte,
Hergê hûnê pirsa gedê lawikê
Min evdala xwedê ji min bikin -
Qusûr tune,
Hema çar tilînga bejinê kurte...

## LÊ BÊZARÊ

Lê Bêzarê, sêva sor, gulya darê,
Lawiko lêxin, kurno lêxin,
Jêla, jorda bînne xarê.
Min li hafa dûmeqeska,
Te li bejna sayî keska,
Ezê çûme Kerbelayê,
Ji wêda hatin çol Bexdayê,
Bazar bikin doxê heska,
Çemilê sêla –
Sev xatirê sayî keska.

*Got: Gula Ozman*

## LÊ BI DOMAMÊ

Lê bi domamê, virda, virda,
Çi kanînga ber kevirda,
Kotîyê mêra av jê berda.
Lê bi domamê, virda, virda,
Çi qeytanê dora kîsa,
Çi fîncanê dest van qîza.
Lê bi domamê, nazî, nazî,
Tu du tişta min dixwezî,
Yek kembere, yek temezî.
Lê bi domamê zû bigota,
Zînê hespê xwe bifrata,
Lê bi domamê, sed kulamê.

## LÊ BI HOLÊ

Lê bi holê, lê, lê holê,
Lê bi holê, lê, lê bi holê,
Lê bi holê, lê, lê holê,
Lê bi holê, reben bûkê.

Ne bi holom, ne holvanim,
Lê, lê bi holê,
Kulîlka pala hanim,
Reben bûkê.

Berdêlya Eşxanim,
Lê, lê bi holê,
Dergîstiya Qulîxanim,
Dêran qîzê.

Lê bi holê, lê, lê, bi holê,
Xelqêra neçe çolê, lê, lê bi holê,
Kurikara neçe çolê,
Lê, lê, bi holê, lê, lê, bi holê.

Xelqê te bînine yolê,
Lê, lê, lê, bi holê,
Kurikê te bînin yolê,
Lê, lê, bi holê, lê, lê, bi holê.

## LÊ GEWRÊ

Lê gewirê, havîne, xweş havîne,
Germa havînê tê kîne-kîne,
Serê min dêşe, kêfa min tunîne,
De tu tasa ava sar minra bîne,
Were kêleka min evdalî xudê rûnî,
Tera bêjim salixê çîlan û bedewan,
Kanê li gundê meda kêne, kî nîne.
Bire xelqê şîrin heye, devî bi kene, zarda şîrine,
Memik sorin, bin sipîne, lingê xweda konderîne.
Kê milê min milê gewirêxîne,
Wê cinetê çevê xwe bivîne.

Êlê gewirê, bejina te zirav tarihana nava geliya,
Minê destê xwe avîte mila,
Destê min kete nava reşbaqê gulîya.
Ser minda xar bû hesavê çevkanîya,
Minê girt kewa gozel ramûsa,
Sî û sê movikê xişta min heliya.

## LÊ DAYÊ, LÊ DAYÊ

Lê dayê, lê dayê, konê kekê Ahmed çi mezine,
Gire-girê mala Torina Şero têda rûniştine.
Hûrê rebenê, Hefsê qijikê,
Heno pepûkê,
Torina mala Şero mıiştewire,
Dikin, divêjin-
Ji koçika belek maye cotek jine.

Axayo rave, Mişîro rave, hekîmo rave,
Êla xelqyano êleke girane,
Ahmedî biçûke,,
Dike ji hev balabe.
Kekê Ahmed sîyarî vê cenûyê,
Meydanek daye Çaxirbega wêran ser kanîyê,
Heçê kesê bê bêje –
Kekê Ahmed saxî, silamete,
Ezê qolê zêrê bin çena xwe bidim mizgînyê.

Çaxirbega wêran giran û gazan,
Hûrê rebenê,
Îro vê sivê xweş tê dengê cotî van qewazan.
Hûrê, rebenê, Hefsê qijikê, Heno pepûkê,
Were em xemla daynin,
Gulîya jêkin, herin Çaxirbega wêran,
Li ser tirbê bê mirazan.

*Got:Memêyê Teyo, ji gundê Heko, 32 salî*

## LÊ DÎNÊ

Lê dîn, lê dîn, lê dînê,
Lê dîn, lê dîn, tev dînê.

Hat karvanê pîvaza,
Lê dîn, lê dîn, lê dînê,
Lê dîn, lê dîn, tev dînê.

Danî binya van saza,
Lê dîn, lê dîn, lê dînê,
Lê dîn, lê dîn, tev dînê.

Hat karvanê ger-gerê,
Lê dîn, lê dîn, lê dînê,
Lê dîn, lê dîn, tev dînê.

Gergerê danî binya bêderê,
Lê dîn, lê dîn, lê dînê,
Lê dîn, lê dîn, tev dînê.

Dîna min sêlê tîne,
Lê dîn, lê dîn, lê dînê,
Lê dîn, lê dîn, tev dînê.

Baqê baska şê tîne
Lê dîn, lê dîn, lê dînê,
Lê dîn, lê dîn, tev dînê.

Siveye, tevê qirqişand,
Lê dîn, lê dîn, lê dînê,
Lê dîn, lê dîn, tev dînê.

Zêra enîyê qirqişand,
Lê dîn, lê dîn, lê dînê,
Lê dîn, lê dîn, tev dînê.

Kawê kîsik niqişand,
Lê dîn, lê dîn, lê dînê,
Lê dîn, lê dîn, tev dînê.

Ha di ber piştê hilkişand,
Lê dîn, lê dîn, lê dînê,
Lê dîn, lê dîn, tev dînê.

*Got: Gula Ozman*

## LÊ DOMAM

Lê domam, domam, domamê,
Dev û diran şekirê Şamê,
Ez têr nabim te îkramê.
Lê domamê, te zû bigota,
Minê qayîşa pişta xwe bifrota,
Seva temî alemeta...

## LÊ, LÊ, LÊ

Lê, lê, lê,lê Banê,
Palê, pûlê Mûşvanê,
Lê, lê, lê,lê Banê,
Delalê, lê Banê.

Banê, Banê, ban tîne,
Rengê qîzikê xort tîne,
Lê, lê, lê,lê Banê,
Kil Siphanê çev tîne.

Lê, lê, lê,lê Banê,
Du zerî devê rayê,
Ya mezin ketye tayê,
Ya biçûk minra nayê.

Lê,lê, lê, lê Banê,
Derîngo, der mezino,
Jê derketiye qelfe jino,
Derdê min yanga mezino.

Lê, lê, lê, lê Banê,
Derîngo, der biçûko,
Jê derketiye qelfe bûko,
Kula min yanga biçûko.

*Got: Casimê Şemo, ji gundê Qondaxsazê,*
*li nehya Aparanê,s. 1948*

## LÊ, LÊ, LÊ EDILÊ

Lê, lê, lê, Edilê...Edilê rave siveye,
Merûm rave siveye, şîrqa-şîrqa dergeye,
Wexta nimêta teye.
Lê, lê, lê Edilê, tewlê gidîyê, can Edilê.

Edilê meşya sivderê,
Zêrr dane ber kemberê,
Radimûsim tev Esmerê,
Lê, lê, lê Edilê, tewlê gidîyê, can Edilê.

Mala Edilê neqebê,
Derdê Edila min girane,
Da ser derdê kezevê,
Lê, lê, lê Edilê, tewlê gidîyê, can Edilê.

Edilê meşya şêmîkê,
Zêrr dane ber cênîkê,
Radimûsim te keçikê,
Lê, lê, lê Edilê, tewlê gidîyê, can Edilê.

## LÊ YARÊ

Lê yarê, yara tirkê,
Kember zêra, kember zîva
Ket kêlekê,
Radimîsim xala qirikê,
Dil ketye enya deqandî,
Hiz dikim tûncika qusandî,
Dil ketye xala qirikê.

Lê yarê, yara tirkê,
Yar yê min dît hewşa mezin
Dest bi hene, heya badin,
Keç digirîn, min naxazin.

Lê yarê, yara tirkê
Kember zêra, kember zîva
Ket kêlekê,
Radimîsim xala qirikê,
Dil ketye enya deqandî,
Hiz dikim tûncika qusandî,
Dil ketye xala qirikê.

*Ji stiranên Mehmedê Mûsa*

## LÊ, LÊ WEYÊ

Lê, lê weyê, dayê delîlê,
Sêrta şewitî devê hevt gelya,
Bavê Hemîd, syarê Mişkê,
Têşirê axê, tucarê dewletê
Sê cara kire gazî: - Babasîl,
Malxirab kemne kulekê ketiye,
Nava qiraranek diranê van kerya,
Herçî gava bavê Hemîd syarê Mişkê,
Têcirê axê dive telî-tengaya yêra,
Bira pêra derketa Zor xetîv axa,
Axayo qurban, serê meydanê çend syareka me qelyane.

Lê weyê, lê weyê, dayê delîlê,
Me hatine kerîyê Şamê, Helebê vê Merdînê,
Bavê Hemîd syarê Mişkê,
Têcirê axê, tucarê dewletê
Sê denga kire gazî:
- Babasîl, malxirab, ne min go kerya raneke roje roja înyê.

Vê sivê serê meydanê gullekê
Berî bedena bavê Hemîd, syarê Mişkê dane lê şewitandine
Kêleka qerebînê...
Axayo, axayo, serê meydanê çend syareka me qelyane...

## LÊ CANÊ

Lê canê, lê canê, lê canê,
Şam, Heleb, Dîyarbekir,
Min derê dikanê vekir,
Bazara cizmê te kir,
Şabûna baha nekir.
Lê canê, lê canê, lê canê,
Şam, Heleb, Dîyarbekir,
Min derê dikanê vekir,
Bazara dêrê te kir,
Şabûna tu pirs nekir.

*Got: Hemoyê Ûsiv*

## LÊ WAYÊ

De lê wayê, lê wayê,
Werin binhêrin ecêva ser ecêva,
Gîzma lingê Emerê Heso
Kine nagihîje binê vê penîyê.

Heyfa minê tê wê heyfê,
Destê kewa gozel girtin birine ser hêwîyê.
De wêlî, ha wêlî, baysizo wêlî,
Hilde şeşxanê bikeve gêlî.

Îro çendik çend roje
Dengê şeşxana apê Bedo gundê Mistoyê Kîloda,
Zerîbxana şewitîda xweş tê bîna tara gêlî.
De lê wayê, lê wayê,
Heyfa minê tê wê heyfê
Çawa malda mane cote bûkê rû bi xêlî.

De lê wayê lê wayê,
Îro du roje dengê şeşxana apê Bedo
Zerîbxana şewitîda girtîye dûman û şilî.
Almastê go: –Gulê, rebenê, porê me kurkirî be
Heft dûzan, donzde kêra, çawa meriv bide ber meqesê...
Were, emê destê hev bigirin, herin ber xudê reca – hîvî,
Bira nîvê emirê me apê Bedora têxe nîvî.

De lê wayê, lê wayê,
Heyfa minê tê wê heyfê
Çawa malda mane cote maûzerê bazin zîvîn.

## LÊ WAYÊ, LÊ WAYÊ

Lê wayê, lê wayê, lê wayê,
Deşta Eyşa wêran çem bi kanî,
Sibe bû, berbangî bû,
Dengê çek û sîlihê van efatan,
Eskerê celalîya girane, erd hilanî.
Cahil, cûhûdê Husongî Qedîf gelek hene,
Heyanî bi sê gulleva birîndar kirin,
Serê segilavî ji kebana sîyara der nanî.

Lê wayê, lê wayê, lê wayê,
Bangî Tuca şewitî têye wê bi heze,
Sibe bû, berbangî bû,
Birrek syarê celelyan ji wêda têne xar û leze.
Hesongî Qadîf du-sê denga kire gazî,
Go: -Bedirê Hecî Hesen,
Min maka te ga.o,
Berê kuştina mêran ser talîne,
Paşê li ser erze.

Lê wayê, lê wayê, lê wayê,
Bangî Tuca şewitî tê li Bêlê,
Lêdixe Erdîşa kavil –
Dihejîne dara têle,
Kulê tu bikevî mala Bedirê Hecî Hesen,
Gullekê li Hesongê Qadîf daye,
Neyare serda peya bûne,
Birîne felqekê wê simbêlê.

## LO LI MIN

Lo li min, lo li min.
Bav keçikê nade min,
Wê çawa be halê min.

Nexweşim, were ser min,
Qîrînke, ruh bê ber min,
Dest sarin, pêne germin.
Ez hatim te bivînim,
Dê û bavê te min kînin,
Qelenê zef distînin,
Xêrê qelen nevînin.
Ez hatime te gulkim,
Te orta kirês dilkim,
Wê çawa be halê min?

*Got: Kubara Çolo*

## LO, LO LAWIKO

Lo, lo lawiko, tu çi dixwezî,
Yek va zîve, yek neynike,
Yek jî zêre, zêrê qazî.

Lo, lo lawiko, te zû bigota,
Minê fînê xwe bifrota,
Seva temî alemeta.
Lê domamê, nazî, nazî,
Sed kulmalê, nazî, nazî,
Tu sê tişta min dixwezî.

Min merûmî belengazî,
Deynê gûrza min dixwezî,
Temam kirme rût û tezî.

Deynê gûza min dixwezî,
Min merûmî belengazî,
Min deyndarî, qumberbazî.

## LO, LO XIRPANÎ

Lo, lo xirpanî,
Sol sore wer panî,
Sîngê zer –mêrg, kanî,
Min bistan ber danî.

Pembuyê çemê me reşe,
Bostan berda zeveşe,
Navê keçikê Binefşe.

Pembuyê çemê me sore,
Bostan berda gindore,
Navê keçikê Çuxsore.

Pembuyê çemê me sipîye,
Bostan berda hurmîye,
Navê keçikê Çixsîye.

Pembuyê çemê me zere,
Bostan berda çevere,
Navê keçikê Şikbere.

*Got: Armên Gazaryan*

## LO MÎRO

Lo mîro minê sondekê xarye,
Quranê, kitêba Mishebê-
Ezê tucara lingê xwe navême vê faytûnê.
Emê go: - Cezê, te male xirav be,
Ocaxî korbe, taxim ser taximê belabe,
Îro sê roje Elî begê roşkaniyê
Kilê çevê te li Mûşanîyê girtine,
Berê wî dane aksorîyê, vê sirgûnê...

Lo mîro, Bidlîsê jane-jane,
Fêza meda ewire di ezmane,
Binya meda xanmane, xanmane,
Mûxsî Axeçane.
Emê go: - Cezê te male xirav be,
Ocaxî korbe, taxim ser taximê belabe,
Îro sê roje Elî begê roşkaniyê
Kilê çevê te Mûşanîyê girtine,
Bê çawa ketîye gereva parav, paraveke filane.

Lo mîro, Bidlîsê golgolîne,
Fêza meda ewirin, ezmanê di hêşîne,
Binya meda berin, berê bê binîne...

Xezalê go: - Seyranê, ha Seyranê,
Bira porrê min û te ser hevda kurbe,
Îro sê roje Elî begê roşkaniyê girtine,
Divên, girtina wî heye, berdana wî tunîne.

Lo mîro, Mûşa şewitî li qenima,
Îro sê roje Beşo ber Elî begê roşkanîyê sekinîye,
Xezalê go: - Seyranê, ha Seyranê,
Bira kezîyê min te ser hevda kûrrbe,
Îro sê roje Elî begê roşkaniyê girtine,
Lê wê çawa be halê me xanima?

## LO ŞIVANO

Lo şivano, lo, lo şivano,
Ser cotik bab-birano,
Kur westyayî ber xevano.
Navê şivanê min Emere,
Pez berda gola Zere,
Da bi xêr bêt Esmere.
Navê şivanê min Elîye,
Pez berda li gelîye,
Da bi xêr bêtin li zerîye.
Navê şivanê min Omere,
Pez berda gola Zere,
Da bi xêr bêt Esmere.

## LÛRKE, LÛRKE

Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke,
Xanimê lûrke.
Kêrê bîne penêr hûrke,
Canikê lûrke.

Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke,
Xanimê lûrke,
Min xulamê gulîyê hûrke.
Canikê lûrke.

Palê Gozê berî hevde,
Xanimê lûrke,
Hesikê bîne çemê levde,
Canikê lûrke.

Silêmanî, silêmanî,
Xanimê lûrke,
Hatime mala we mêvanî,
Canikê lûrke.

Dewsa kulav- doşek danî,
Xanimê lûrke,
Dewsa teştê memik anî,
Canikê lûrke.

Çûme mala Elîyê Emer,
Xanimê lûrke,
Daye ber min qelîya qemer.
Canikê lûrkr.

Çûme mala Birê Hosê,
Xanimê lûrke,
Biro rabû wê neqasê...
Canikê lûrkr...

Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke,
Xanimê lûrke,
Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke,
Min xulamê gulîyê hûrke...

*Got: Gula Ozman*

## MALAN BARKIR

Malan barkir, lê, lê, lê,
Dîsan, dîsan,
Şênîyan barkir lê, lê, lê,
Dîsan, dîsan,
Koçik û kerî ketine kîsan,
Heta hatî, keç ramûsan.

Malan barkir vê mexrebê,
Koç û kerî ketine dirbê,
Ezê çi bikim vê mitirbê.

Malan barkir, ga wenda bû,
Koç û kerî pê gerha bû,
Heta hatî mal talan bû.

Malan barkir vê eyşayê,
Koç û kerî ketin çayê,
Heta hatî keç ramûsayê.

## MAMIR

Mamir, Mamir, Mamir, lo Mamo,
Mamir, Mamir, Mamir, lo xulamo.
Dara li gêdûkê, hêlûna pepûkê, lo Mamo,
Cihêza vê bûkê, lo xulamo.
Mamir, te çû derda li Mamo,
Mamir, te çû derda li xulamo.

## MEDET, HAY MEDET

Medet, hay Medet,
Redewana kavil bi kirkole,
Tivinga keşîş Polo şeşagire
Dêstda norre-norre,
Yekî xerxaz tune
Cavekê bişîne Redewana kavil
Ji şêx Qasimra:
"Şêx qasimo,
Te agirî kulê li malê keto,
Keşîş Polo ji Redewanê derketîye,
Sed û sî canfîdan wê li sere.
Şade şûdê keşîş Polo gelek hene,
Jêkirîye serê çil û çar dewrêşê ser bi pore".
Redewana kawil wê bi yane,
Tivinga keşîş Polo şeşagire,
Yê fîdayan kazonîyê ûnane.

Yekî xerxaz tune
Cavekê bişîne Redewana kavil
Ji şêx Qasimra: "Şêx qasimo,
Te agirî kulê li malê keto,
Keşîş Polo ji Redewanê derketîye,
Sed û sî canfîdan wê li sere.
Şade şûdê keşîş Polo gelek hene,
Jêkirîye serê çil û çar dewrêşê – ehilî, îmane".

## ME DERENGE

Me derenge, hay me derenge,
Babê bûkê, me derenge.
Me derenge, hay me derenge,
Kirasê bûkê her heft renge.
Me derenge nava rojê,
Befirê girtî berrojê.
Me derenge, êvarîye,
Befirê girtî gemîye

## MENALÎ

Menalî, Menalî,
Hemedo, tu ji bavê kalî,
Zêro, tu ji kemalî,
Walîyo, aqil balî,
Hemedê bavê çûye,
Miclîs maye xalî.

Çil sala li çîya bû,
Ew xizmeta padişa bû,
Delalîyê wan dera bû.

Wextake ser kanîyê,
Sêvek sore li berîyê,
Hingê ezî jor bûm
Berê min li kursîyê.

Dayka Hemed bînim,
Herdu bera li ber darînin,
Belkî Hemedê bavê vegerînin.

Hemedê bavê teye,
Tu xebera pê medeye,
Ji mera paşê pirr guneye.

Go: "Dayê,Haşê!
Go, ez îdî venagerim paşê,
Ezê pirsekê bêjim
Te nav dinêda bikim şaşê.

Hemed dest kir, çû Cizîrê,
Êwirî li Mêrdînê.
Bazîyo, perr hêşînê,
Dê û bavê xwe qayîl nînî-
Reşî weke sêle,
Desta hebû kevanekî çençêle,
Kuştin lawî rûkêle.

Melle Cefer radibî,
Li hespê xwe syar bî,
Hewişa padişada peyabî,
Rûnişt bû digirî.

Padişa di pirsîyê,
Ew dengê girye kêye?
Go: - Dengê girye melle Cefere.

Go, padişa dikir sixûne,
Melle Cefer merîyê mine,
Qedirê wî mezine.

Go, ji wîra qewala bînin,
Bira li qefa xînin,
Reş aşiq ji minra bînin.

Qewala li qefa daye,
Reş aşiq hat mîna teyraye.

Padişa tîrek li Reş aşiq daye,
Yek hatîye serê şêx Cefer kure
Neyê pêşya tu kafira
Her kes me şûna mixatira.

*Ji gotinên pîr Ûsivê gundê Şamîramê.*

## MENDO

Mendo, menarî, menar,
Hêsira ji çeva me mal,
Gorr û kefen mala meye,
Hiznigirî bê feydeye.

Hey dil, were şayê merda,
Şabkanîya cew jê berda,
Derd û derman herdu jî te da.

Hey dil, were şayê mezin,
Şawkanîya cewa mezin,
Derd û derman te dane min.

Eva dinya kaf û kûne,
Şeş aşiq lê rabûne,
Yek Ferate, yek Şîrine,
Yek Leyle, yek Meclûme,
Yek Memêye, yek Zîne.

Hey dil were teyrê bêcî,
Tu li pey jina bê mêr neçî,
Gelek meriv mane şeqî.

Hey dil, were teyrê bê war,
Tu pey jina bê mêr menal,
Gelek meriv mane ew hal.

Bêjine hebûbî Hecare,
Dayîmsikê girêdin mîna care,
Têda razê yanga çevxumale.

Herçîkê dinê xwe miş-mişand,
Mîna şoxê xwe xemiland,
Xafilkirye rabetiland.

Herçîkê dinê xwexwe hel hiland,
Mîna şoxê xwe xemiland,
Xafilkirye dixirmişand.

Ji wê birme baxê bê gul,
Têda dixûnin şarûr-bilbil,
Desta çaka na ji min hil.

Hûn min berdin, heval diçin,
Herê dilo, kanê Elî, kanê Etman,
Ebabekir, kanê Osman?
Ew hebûb bûn ser xitman,
Ewan jî ax û berê sarda girtin mîkan.

Herê dilo, kanê Xasê, li vir di xas,
Ka Hemze, ka Abas?
Ewan jî ax û berê sarda bûne risas.

Herê dilo, ka Silêmanê hukum dikir çiqa welat?
Ka Bilqîza caryê bi xelat-
Ewan ji ax û berê sarda emir peraft.

Herê dilo, ka Silêmanê pêxemberê hukum dikir, çiqa dinê,
Ka Bilqîza zêrr mal xinê?
Ew jî ax û berê sarda bûne finê.

Kanê Ûsivê min Ûsfetî,
Ka Zelîxe, xatûna qîmetî,
Ew jî ax û berê sarda bûne fetî...

*Ji gotinên pîr Ûsivê gundê Şamîramê.*

## MENDO, HANÎ

Mendo, hanî, manî,
Kurtikê Şamgêlanî,
Qedira bejinê anî,
Du tilîk ser deranî,
Sê tilîk ser deranî.

Mendo, bîye, bîye,
Zevya ma stirîye,
Rûnişt ber girîye,
Bişkoşk sed û sîye,
Wê li cem jinka bîye.

Mendo, te li min çîye,
Mendo, reşe, reşe,
Zevya me zeveşe,
Bişkok sed û şeşe,
Yarya xwe keleşe,
Mendo, te li min çîye.

## MESTANÊ

Mestanê, Mestanê,
Bazinê ser destanê,
Law çone seyranê.
Mestan avê dikêşî,
Bazinê zer diqelêşî,
Dilê Bahran deşî.
Mestan avê tînî,
Bazinê zer dixirpînî,
Bahran xêr nebînî.

## ME ŞERE

Me şere, sed car şere,
Dinya çerx û gere,
Kemalo, rabe û here.
Me şere li ser Şaxê,
Hêlêye li ser Şaxê,
Xweş tê dengê çexmaxê.
Me şere li ser Simkokîtê,
Hêlêye li ser Simkokîtê,
Xweş tê behna barûtê.

## MÊVAN

Çi mêvanekî ezîze,
Mêvan lê dixe, keç dilîze,
Keremke şênya bavê min.
Mêvan şivanê van karika,
Karik berda dor darika.
Mêvan mêvanê van berxika,
Berxik berdan dor mêxika.
Çi mêvanekî ezîze,
Mêvan lê dixe, keç dilîze.

*Got: Gula Ozman, 55salî nexwendî,*
*kevanî, binelya bajarê Hoktêmbêryanê*

## MÊVAN, MÊVAN

Mêvan, mêvan, mêvano qurba,
Mêvanekî hatiye mala bavê min,
Ezê nizam, mêvanê mala bavê min syare, yan peyaye.
Salixa mêvanê mala bavê min syarê bozekî dêl hineye,
Qayîşa û şûrê zapitîyê girka milê gede lawikê min kutaye,
Mêvan, mêvan, mêvan.

Mêvanekî hatiye mala bavê min, min nas nekir,
Ezê jêra şîvê bînim, şîr û şekir.
Hergê xar, wê xar, hergê nexar
Ezê nîvê şevê bişkokê zermemika li ber vekim.

Gede lawikê min ramûsaneke ji min xastiye, min nedaye,
Minê tenya sêlê rûyê xwe daye,
Mêvan, mêvan, mêvano qurba.

Ava gundê me şerbete,
De tu were avê min bixaze,
Ezê avê destê rastê bidime deste,
Destê çepê jêra têxime kemberbeste,
Lawiko qurba, koma xweyî xudanê min geleke,
Cîyê dîtina du dila, çar çeva kavilê gundê meda bûye hisrete,
Mêvan, mêvan, mêvano qurba...

## MÊRG

Çûme mêrgê,
Şewlik di nav,
Belgê mêrgê
Zêrê dirav,
Ez miskîn bûm –
Neçûme nav.

Çûme mêrgê,
Şewlik bi dest,
Belgê mêrgê
Zêrê kesik,
Ez miskîn bûm –
Min nekir qest.

## MÊRGÊDA

Hey mêrgêda, mêrgêda,
Keçika Elo mêrgêda.
Keçik çûbû çolêda,
Hey mêrgêda, mêrgêda.
Pincar çinî pêşêda,
Hey mêrgêda, mêrgêda.
Bav kor bû, tepek lêda,
Keçika Elo mêrgêda,
Xeyîdî çûbû taxêda,
Hey mêrgêda, mêrgêda.

## MÎRBEGÊ MIN

Wî lo, lo, wî lo, lo, bavo,
Bejina bavê Mîrbegê min zirave, gule-gula vê dîwanê,
Hatîye pey bavê Mîrbegê min têla Mûşê ji Ezirganê,
Destê bavê Mîrbegê min girtine, berê wî dane hevisa Mûşê Ezirganê,
Bê sûc û gune sedûyek sal gune danê.
Bimirim, bimirim nemînim,
Ez ditirsim bavê Mîrbegê ber çevê xwe nevînim.

Wî lo, lo, wî lo, lo, bavo,
Bejina bavê Mîrbegê min zirave gule, gula berbi roye.
Derê mala Mîrbegê min tê dengê borî-borîçyane,
Na wele dîsa sewta Delu Qazoye,
Destê bavê Mîrbegê min girtin berê wî dane Taşqela rengîn nav girtyane...
Wî lo, lo, wî lo, lo, nemînim,
Ditirsim bavê Mîrbegê xwe saxî nevînim.

Wî lo, lo, wî lo, lo bavo,
Bejina bavê Mîrbegê min gule, gula nava ketê,
Hatîye pey bavê Mîrbegê min têla Mûşê Ezirganê,
Wele dîsa cem leşkerê vê dewletê.
Destê bavê Mîrbegê min girtin, berê wî dane hevsa Mûşê,
Bavê Mîrbegê min ne deyindare, ne xûndare, dev li kene,

Ewî tirê berê wî dane defê û dewatane.
Nemînim, nemînim,
Ditirsim bejina bavê Mîrbegê ber çevê xwe nevînim.

*Ji sitranên Reşîdê Baso*

## MÎRMIH

Mîrmih lawê Emer axa derket ji kotolê,
Çadirê xwe lêdaye devê golê,
Kulê tê bikevî mala roma qelpe xayînda,
Gullekê berî bedena Mîrmih lawê Emer axa, zevê teze daye,
Nav û dengê wî bela bûye nava êl-eşîretê kambaxa vê Sitembolê.

Were, were mîrê çîya, dijminê qanûn û zagûna van romya,
Neyarê fîne sora efendya, na wele qesasê serê van zevtya.

Heylo mîro, gelîyê Karkarê wê bi kerre,
Tivinga destê Mîrmih lawê Emer axa kûçûkçana romêye
Serê meydanê dêstda diçûrise,
Kulê tê bikevî mala roma qelpe xayînda,
Gullekê berî bedena Mîrmih lawê Emer axa daye,
Roma reşe rûtikra him nave, him namûse.

Were, were mîrê çîya, dijminê qanûn û zagûna van romya,
Neyarê fîne sora efendya, na wele qesasê serê van zevtya.

Axayo qurba, gelîyê Karkarê devê tatê,
Cewzad paşa çend taxbûra eskerê roma reş jêlva ha tê,
Kulê tê bikevî mala roma reşe rûtikda,
Vê sibê gullekê berî bedena Mîrmih lawê Emer axa, zevê teze dane,
Cinyazê wî maqûlî danîne Wana şewitî,derê qayma hukumetêda...

Were, were mîrê çîya, dijminê qanûn û zagûna van romya,
Neyarê fîne sora efendya, na wele qesasê serê van zevtya.

## MÎRO, BERFEKÊ BARÎYE

Mîro, berfekê barîye Qelenya wêran kirye hêke,
Bego, berfekê barîye Qelenya wêran kirye hêke,
Sê qebîl derketin ser kekê Zezê,

Tevî papax reşî gemî gewre,
Kekê min tayê tenê pê nikare,
Pêşya wî eskerî hatîye Qelenîyê paşîyê maye Abas kende.

Bavo, Qelenya wêran wê bi nike,
Keko, Qelenya wêran wê bi nike,
Simbêla kekê min reşe bi palike,
Heyfa min nayê kekê Zezê, bavê Cemîlê,
Heyfa min tê wê heyfê,
Gogerçîn birine sera mexîna ber mazatê.

*Got: Casimê Şemo, 45 salî, ji gundê Pampê,*
*li ser nehya Aparanê,s.1958.*

## MÎRO DIKANE

Mîro dikane, lawo de rabe,
Wêrane, lawo, êlim de rabe,
Mamaxa şîr û kulabe,
Nav ertişyan bû qesabe.

Dikane, lawo, depîne,
Mamaxan law şîrik hêşîne,
Nav ertişyan kevine-kîne.

Dikane, lawo, ser avê,
Şînboz û hûrgavan bavê,
Ertişî ketine girdabê.

Xeber bene xûşka mino,
Bila nekin xema mino,
Leşê Mamaxa ma li dino.

Xeber bene xûşka piçûk,
Da bişkênî kil û neynûk,
Leşê Mamaxa ma li Dedûk.

Şere li sûkê Nalbendan,
Lo Mehmûdo hunurbenda,
Heft kuştin, paşê navê xwe dan.

*Got: Sebrîyê Eslan, 30 salî, dersdarê*
*gundê Gelto, li nehya Talînê.*

## MÎRKÎ MIŞKAN

Mîrkî mişkan, mîrkî mişkan, mîrkî mişkano,
Mîrkî mişkan, mîrkî mişkan, axangê belano.
Evî mişkî çikir, çikir, mîrkî mişkano,
Evî mişkî çikir, çikir, kalikê belano.

Ha li êvarda imbar qulkir,mîrkî mişkano,
Ha li êvarda imbar qulkir, axangê belano.
Ha li êvarda genim qirkir, mîrkî mişkano,
Ha li êvarda genim qirkir, axangê belano.

Kêrê bînin, mişk derînin, mîrkî mişkano,
Kêrê bînin, mişk derînin, axangê belano.
Balte bînin, jev derînin, mîrkî mişkano,
Balte bînin jev derînin, axangê belano.
Mêzînê bînin, mişk bikşînin, mîrkî mişkano,
Mêzînê bînin, mişk bikşînin,birangê belano.
Têkine kodê, bişînne odê, mîrkî mişkano,
Têkine kodê, bişînne odê, axangê belano.

Têkine kaxê, bişînin Taxê, mîrkî mişkano,
Têkine kaxê, bişînin Taxê, kalikê belano.
Têkine teştê, bişînin deştê, mîrkî mişkano,
Têkine teştê, bişînin deştê, apikê belano.

Têxine kevçî, bidine defçî, mîrkî mişkano,
Têkine kevçî, bidine defçî, kalikê belano.
Rûvîya qetê para metê, mîrkî mişkano,
Rûvîya qetê para metê, axangê belano.

*Got: Ezîzê Eşo, ji gundê Pampê*

## MÎRO, QURBAN

Mîro, mîro, mîro,
Mîro qurban, roja me derketiye alyê Gêrsê rojhilatê,
Bira kula xudê bi kulbe, têkeve mala Welîyê Wanê,
Mururê Kopê, Cendirsîyê Gêrsê, îzbaşîyê bi Xelatê,
Çawa îro sê ro, sê şeve digerim pey Mehmed, Dewrêş,
Li beladîyê cesûsîyê, Taqîbatê.
Li piştî Mehmed, Dewrêş, dîwanê mîr-hakima min herame.

Mîro, mîro, mîro,
Sedqî lawê Gulnazê, kurê jinebiya dengekî ezet kire gazî,
Digo: "Xalo, wele nabe, bile nabe, berfa welatê Serhedê
Tim li sere, qe ranabe,
Rêça eşqî firarê, berxê mala Seydo tu car unda nabe,
Li piştî Mehmed, Dewrêş, dîwana mîr hakima min herame.

Mîro, mîro, mîro,
Ezet dengekî Sedîqê lawê Gulîzerê kire gazî:
-Xarzîya, dilê min dilekî dîne,
Modêla Romê du bazinê yê zîve lêne, xalê xwe bigihîne,
Minê sond xarîye, ezê derbekê bidime qayîma qayîma,
Min lazime qumandara, ya gola Gêrsê, bikime gola xûnê,
Heke weke cara, xudê mera bi domambe, ezê herim rûnîm dewsa mezina.

Mîro, mîro, mîro,
Eşqî firarê mala Seydo lawê Gulnazê dengekî ezet kire gazî,
Digo: - Xalo, wele nabe, bile nabe, berfa welatê Serhedê tim li sere, qe ranabe.
Rêça eşqî dewletê, berxê mala Seydo girane, tu cara unda nabe.

## MILAZGIR

Milazgir wê di çelêda,
Milazgir, kuro, Milazgir,
Cot zerîyê porsor têda,
Milazgir, gede Milazgir.
Milazgir, wê dûzêye,
Xopanî wê dûzêye,
Milazgir, kuro Milazgir,
Milazgir, ha Milazgir.
Tejîngê wê kûze-kûze,
Milazgir, kuro Milazgir,
Yek yare, yek baltûze,
Milazgir, ha Milazgir.

*Got: Egîtê Hemîd, ji gundê Pampê*

## MIN BER DÊRÎ

Min ber dêrî, te ser xênî,
Delîl, delîl, Xana min,
Tu bedewa mala min.
Zêr kutane ha ser sêrî,
Delîl, delîl, Xana min,
Tu delala mala min.

Bextê minra tu bi mêrî,
Delîl, delîl, Xana min,
Tu kulîlka mala min.
Min heyatê, te bi heyatê,
Delîl, delîl, Xana min,
Tu bermalya mala min.

Zêr kutane ser hêratê,
Delîl, delîl, Xana min,
Tu kevanya mala min.
Ez radimûsim te Tewratê,
Delîl, delîl, Xana min,
Tu sivika mala min.

Min li şêmîkê, te li şêmîkê,
Delîl, delîl, Xana min,
Tu bedewa mala min.
Zêr kutane ser cênîkê,
Delîl, delîl, Xana min,
Tu delala mala min.

*Got Basoyê Bekir, ji gundê Pampa kurda.*

## MIN NEDÎBÛ

Min nedîbû duh û pêrva,
Min dît keleşa min meşya Terefê,
Mala me ji alyê taxêva,
Ezê bikime xulayî xelqê pola Erdîşê,
Gelîyê Zîla, Textê Pas jin û mêrva.

Êla dînê bedewê gundê me dudune,
Qesem dikim ew herdu jî ez û tune,

Xwedê kerem bike
Hê qomsî nemam fesad û finûn
Li me nebûne dujmine.

*Got: Ahmedê Mîrazî*

## MIN HEYRAN

Min heyran, qonco qurban,
Heçikê yarê wan rindin,
Bejinê wane bilindin,
Kotîyê mêra ber kundin.

Min heyran, min heyran,
Min heyran, qonco qurban,
Heçikê yarê wan reşin,
Jinê lawikê keleşin.

Yareke min hebû, hebû gundda bû,
Gustîla wê unda bû,
Gustîla wê yeke zêr bû,
Ez nizanim çawa bû.

Min heyran, min heyran,
Min heyran, qonco qurban.

*Got: Kubara Çolo*

## MINÊ XEWNEKÊ DÎTYE

Minê xewnekê dîtye di xewnêda,-
Darekê hêşîn bûye hewşa mala bavê teda,
Ezê vê darê dinhêrim belge lêne,
Fêza belga dikanê sedefane,
Fêza dikanê sedefa zînê mozîyane,
Fêza zînê mozîya çevkanîne,
Fêza çevkanya şiverêne,
Fêza şiverya meydaneke fire lêye,
Ser serê darê du kewê gozel sekinîne.

Ezê vê sibê çûbûme ser mele- xewna min dernanî,
Ez çûbûme ser keşîş – xewna min şiro nekir,
Ezê dîsa por û poşman vegeryabûm.

Êvar bû, wextê derî dadana, çiravêxistana,
Kewa gozel ber derê malê sekinîbû,
Go: - Lawiko, xema meke, xem xirabin,
Cixare bikşîne, bira xemê dilê te belabin,
Ez xewna te dîtiye ezê vê sibê şirovekim.

Go, gede lawiko, te xewnek dîtye di xewnêda,
Darekê hêşîn bûye hewşa mala bavê minda,
Li darê belge lê bûn,
Fêza belgê dikana sedefa bûn,
Fêza dikanê sedefa zînê mozîya bû,
Fêza zînê mozya çevkanî bûn,
Fêza çevkanya şiverê bûn,
Fêza şiverya meydaneke fire lê bû,
Serê darê du kewê gozel sekinîbûn.

Gede lawiko, dara ku hewşa mala bavê minda hêşîn bûyî-bejina mine,
Belgê darê –gulyê minin,
Dikanê sedefa – dev û diranê minin,
Zînê mozya - pozê mine,
Çevkanî – çevê minin,
Şiverê – biryê minin,
Meydana fire – enîya mine,
Ew herdu kewê gozel
Berê vê baharê – mirazê min û teye...

*Got: Fetoyê Ûso.*

## MIRÎŞK

Kişe, kişe, kiş mirîşkê,
Wî serê min dêşe.
Kişe, kişe, kiş mirîşkê,
Wey devê min dêşe.

Mirîşka wê ser kayê,
Wî dilê min dêşe.
Mirîşka ka vedayê,
Wey serê min dêşe.

Gede û zara wê berdayê,
Wî sîngê min dêşe,

Gede û zara wê berdayê,
Wey dilê min dêşe.

Mam vê kayê û mirîşkê,
Wî serê min dêşe,
Mam vê kayê û mirîşkê,
Wey dilê min dêşe.

## MISTO BAVÊ CANGÎRE

Misto bavê Cangîre,
Qasim paşa wezîre,
Ew dimîne Cizîre.

Misto bavê Nuhbetê,
Şûrê zirav li kêlekê,
Namûs kir Ebdilbegê.

Evdilbeg ser salane,
Çûxê bavê li milane,
Namûs kir Teterxane.

Hey Cizîre, xweş Cizîre,
Cizîra Bota di Cizîre,
Kur mêvanê di xalane.

Hûr, mûr anîn ji bajêr,
Serê bûkê tevda zêr,
Xwera anî pir cihêz.

*Got: Manûk Harûtyûnyan, libûjen,*
*6o salî, ehelî Aştarakê*

## MIŞÎR PAŞA

Delalo, serê min bi heyran,
Malê min bi gorî,
Cewahirê kurê,
Xezalê nemayê,
Peyabe, syarbe bozeke bi situ norî,

Bihare, torinê mala Şero berevbûne çûne Ezirganê **kavil,**
Cem Mişîr paşa,
Min nizanbû bavê Hemê, syarî Ferhanê,
Mala xwe çêkir, kavila Alîkele, taxa jorin.

Germa vê havînê kele-kele,
Karî xezala karê xwe hildane çûne ber mexele,
Cewahirê kurê, Xezalê hemayê.

Bahare, torina mala Şero
Berevbûne çûne Ezirgana şewitî,
Cem Mişîr paşa.
Min nizanbû bavê Hamê, syarî Ferhanê,
Mala xwe çêkirye li wêrtasa Alîkele.

Bahare, torina mala Şero
Berevbûne çûne Ezirgana kavil,
Cem Mişîr paşa.
Ji torinî mala Şerora
Derketîye deste kaxezê mezûriyê.

Çi ba bû, çi baran bû,
Çi bobelîskê kulê
Ser konî bavê Hemê rabû.

Bahare, torina mala bavî Şero
Berevbûne çûne Ezirgana kavil,
Cem Mişîr paşa.
Dêna xwe didimê-
Cotî mişîrê dewletê li min winda bû.

## NAÇIM

Naçim Erdîşa wêran, der dikana,
Şê û şêbiskê keleş kawa min
Têl bi têl bûye, daketîye ser bistana.
Dê û bavê min xêrê wayê nebînin,
Çawa ez nedame xortekî çarde salî
Bi çaxî minra,
Ez girtime dame kalekî heyştê salî,
Ne dîne, ne îmane.

Naçim Erdîşa wêran dotaxe,
Alîkî dene, yek boyêxe,
Dê û bavê min xêrê wayê nebînin,
Çawa ez nedame xortekî çarde salî,
Girtime dame kalekî heyştê salî,
Kêf, henekê dinê
Ser me bûye yasaxe.

Naçim Erdîşa wêran wê bi dare,
Dilê min evdala xwedê
Bi kule, bi derde, birîndare.
Dê û bavê min xêrê wayê qet nebînin,
Çawa ez nedame xortekî çarde salî-
Bi çaxî minra,
Ez girtime dame kalekî heyştê salî,
Vî malxirabî, tesîbî gurê hare.

## NÎNAYÊ

Nînim, nînim, Nînayê, Nînayê, Nînayê,
Nînim, nînim, Nînayê, sêfîlo sebira min nayê,
Dîn ji govendê nayê, Nînayê, Nînayê,
Dîn ji govendê nayê, sêfîlo sebira min nayê.
Çi bikim ji malê dinyayê, Nînayê, Nînayê,
Çi bikim ji malê dinyayê, sêfîlo sebira min nayê.

Dînê ji govendê nayê, Nînayê, Nînayê,
Dînê ji govendê nayê,sêfîlo sebira min nayê,
Pêra ketime belayê, Nînayê, Nînayê,
Pêra ketime belayê, sêfîlo sebira min nayê.

Dîna ji xwera dixemilî, Nînayê, Nînayê,
Dîna ji xwera dixemilî, sêfîlo sebira min nayê
Govend jî wê xemilî, Nînayê, Nînayê,
Govend jî wê xemilî, sêfîlo sebira min nayê.

Heta dînê xemilî, Nînayê, Nînayê,
Govend temam betilî, sêfîlo sebira min nayê.

*Got: Ahmedê Mîrazî*

## NÎNO, NÎNO

Nîno, Nîno, Nînayê
Hoy li min,
Nîno, Nîno, Nînayê
Toy li min.
Bizina Keşe ya reşe,
Keşe kerban nexweşe,
Nîno, Nîno, Nînayê
Hoy li min,
Nîno, Nîno, Nînayê
Toy li min.
Bazina Keşe ya kale,
Ber kêrê nale-nale,
Keşan ji kerban bê hale,
Nîno, Nîno, Nînayê
Hoy li min,
Nîno, Nîno, Nînayê
Toy li min.

## NE DÎNIM

Ne dînim, ne sewdeme,
Ser xanîya paldame,
Tereso ez tev dame.
Ne dînim, ne dirustim,
Tereso ji aqil xistim,
Ne dînim, ne sewdeme.

## PÎR BERBIJÎ

Pîr berbijî em cotin,
Xala bi gerdenê-gerdenê,
Dost ber bijî em cotin,
Zera bi ser çenê, bin çenê.

Bax û bostan kevotkin,
Xala bi gerdenê-gerdenê,
Bînê memka em sotin,
Zera bi ser çenê, bin çenê.

Pîr berbijî em sêne,
Xala bi gerdenê-gerdenê,
Bînê memka xweş têne,
Zera bi ser çenê, bin çenê.

Pîr berbijî em çarin,
Xala bi gerdenê-gerdenê,
Bax û bostan hinarin,
Zera bi ser çenê, bin çenê.

## REZÊ MÎRAN

Rezê mîran, rezê mîran,
Rezê mîran, baxê mîran,
Gul û rihan bûne cîran,
Kur aşiqê hungustîran.
Rezê mîran gul, çîçeke,
Jê firdane du ordeke,
Yêk meyrema çev beleke.
Rezê mîran bi sorave,
Baxê mîran bi sorave,
Jê firdan du bi xunave,
Yêk meyrema belek çeve.

## RÊNGA PAXIR MADANÊ

Peyayo qurba, rênga Paxir Madanê sere jore,
Kevir-kuçikê rênga Paxir Madanê ber riya gedê lawikê min bûne dûzan û kêre,
Xwezila xêra xudê mîrê mirazara,
Cahabeke xêrê minra bihata,
Bigotana gede lawikê te nîşan danîye, kuştîye mera ser zinêre.

Peyayo qurba, rênga Paxir Madanê darê bîye,
Şerfa serê gede lawikê min şereke sipîye, zax-zaxîye,
Xwezila xêra xudê mîrê mirazara
Bigotana,gede lawikê te ji hevsa Paxir Madanê dest zorê jê rewya.
Lawiko qurba, rênga Paxir Madanê wê bi dûre,

Darê dorê girtine sî û sûre,
Lawiko qurba, de tu were min birevîne,
Ezê tera bidim îzin û destûre.

Peyayo qurba, rênga Paxir Madanê wê bi cixîze,
Gede lawikê min rûniştîye nava heval, hogira kart dilîze,
Peyayo, de tu were min birevîne,
Ne min kure, ne min qîze.

**ROJA ME**

Roja me derketye ji alîyê Wanê.
Şeq-şemalê bajerek, bajarê Erdîhanê.
Minê şalekê ji bêrîvana xwera kirye Axaxirmedanê,
Ezê ketime li wê heyrê – bêrîvana min zare nebilane,
Wê bikeve heyra xwe girêdanê.

Bêrîvanê, bêrîvanê, çevreşê tûr giranê,
Serê bêrîvana temam jêra bi qurbanê
Bêrîvanê, bêrîvanê...

Bêrîvanê divê:-Kuro, gedê bêrîvanê gundê me çil çarin, bi çar qeflêne,
Neçe pêşya qefla pêşin, qîzin, qîz gunene,
Neçe pêşya qefla navîn, jinê bîne bi gazine lomane,
Here pêşya qefla paşin, bûkê salane,
Dil doste, dev bi kene, zar şîrine, mêrê xwe menene.

Bêrîvanê, bêrîvanê, çevreşê tûr giranê,
Serê bêrîvana temam jêra bi qurbanê
Bêrîvanê, bêrîvanê...

Lawik divê:- Lêlê bêrîvanê, dilê min dilekî dîne,
Bira sebabê min bêrîvana min xêrê bike, wayê qe nevîne,
Kulfetê bêrîvana mala bavê bêrîvana min çarde nefera tek tifalek jê bimîne.
Ew tifal ji bînaya çevanî merûmbe,
Canê xweyî gurîbe, qismetê wî ji erd, esmanî birîve,
Ser pişta ga mesîve, binê bera bê binîve,
Belgîyê ber serê wî kevirîve,
Doşika bin wî erdbe,
Orxana ser wî esmanê jorinbe.

Rokê ku ew tifal bimire, daxilî erdêkin,
Roja meşerê hezar pê li pêçî bikeve,
Ber mêzîna xêr û guna ezê li wê derê –
Dewa kara xêr îmana wîme.

Bêrîvanê, bêrîvanê, çevreşê tûr giranê,
Serê bêrîvana temam jêra bi qurbanê
Bêrîvanê, bêrîvanê...

## RIZGANO

De lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Rizgano qurba, îro sê roje, sê şeve,
Kavilê gundê Heyderkenê wê defe û dewate,
Govend îro pêda qe sar nabe,
Ez û Rizgan nav govendê rûniştine.

De lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, Rizgano qurba.

De lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Rizgan go: - Lê Nûrê, kulmalê,,
Tu rabe ber derê gomê binhêre,
Qet çika çi heye, çi tuneye.
Nûrê dinhêre, dibê: - Rizgano, ezê qurbana delalê dilê xweyo,
Şev me hatiye nîvê şevêye,
Pêwir û mêzîna xwe daye orta ezmînêye.

De lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, Rizgano qurba.

De lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Rizgan dibê: - Nûrê, kulmal, ezê îşev te birevînim,
Bavêjime gundê xirabe, kavila vê şikevtê.
Nûrê dibê: - Rizgano, ezê qurbana serê delaliyê dilê xweyo,
Tu min nerevîne, nebe gundê xirabe kavila şikevtêye,
Kavila şikevtê bê waye, kesîra nemaye,
Ditirsim min û delalê dilê minra jî nebîne.

De lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, Rizgano qurba.
De lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,

Rizgan Nûrê direvîne, dibe gundê xirabe kavila şikevtêye.
Rizgan dibê: - Nûrê, eva sê rojê minê nekirye xewa di şevêye,
Qasekê çoka xwe dayne ber serê mine,
Ezê hevekî bikevime xewêye.

De lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, Rizgano qurba.

De lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Nûrê çoka xwe dide erdêye,
Rizgan serê xwe dide ser çokêye,
Dikewe xewê û xewnêye.
Nişkêva Rizgan ji xewê vedicêniqe,
Dibê: - Lê, lê, Nûrê, mala bavê şewitîyê,
Minê hêja xewnek dîye di xewêda,
Wele dîsa çima xwe û tera.

De lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, Rizgano qurba.

De lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Nûrê dibê: - Rizgano, ezê qurbana serê delalê dilê xweyo,
Vê sibê bêje xewna xweye,
Ez merûma xudê xewna te şirokim.
Rizgan dibê: - Nûrê, kulmalê,
Minê xewneke dîtibû di xewnêda,
Dareke sipindarê hêşîn bûbû di hewşa mala bavê teda,
Du sêvê sore xelatî li sîngê darê bûn,
Birre belgê reş ser darê bûn,
Sê kevotk ser serê darê bûn,
Teyrekî qereqûşî hatibû –
Serê hersê kevotikê gozel lêdabû.

De lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, Rizgano qurba.

De lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Go: - Ew dara sipindarê – bejina min merûma xudêye,
Sêvêd sore xelatî memikê minin,
Belgê darê-gulyê minin,
Hersê kewê gozel – yek ezim, yek tuyî,
Ya dinê berê vê biharê mirazê min û teye.

Lê ew teyrê qereqûşî –
Ku hatibû serê kewê gozel lêdabû,
Ew Oçoyê kurapê mine,
Wê sibê bê min bikuje, te jî pêra.

De lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, Rizgano qurba.

De lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Rizgan dibê: - Nûrê, qurba, rabe vê sibê binhêre,
Çika ber derê şikevta şewitî qet çi heye, çi tuneye?
Nûrê diçe ber derê şikevtê, têye,
Dibê: - Rizgano, qurba, li me barîye berfeke nerme,
Rû erdê girtîye weke çerme,
Oçoyê kurapê min nêçîrvane wê sibê tayê kivrûşkê bîne ser me,
Wê min bikuje, te jî pêra.

De lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, Rizgano qurba.

De lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Xêlekê şûnda Nûrê dîsa dertê ber derîye,
Tê, dibê: - Rizgano, qurba, li min hatiye berfeke sîse,
Mîreta abêşîkê serê milê Oçoyê kurap diçûrise,
Wê min bikuje, te jî pêra.
Hela xeber devê Nûrêda bû,
Kafirê Oço ber derê şikevtê –
Lingê xwe bi ecemî erdêda.

De lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, Rizgano qurba.

De lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Nûrê go: - Oço, ha Oço,
Ezê qurbana serê kurapê xweyo,
Tu were vê sibê Rizgan mekuje,
Rizgan tayê tenêye, kurê xelqêye,
Tu poz û guhê qîzapa xwe jêke,
Bive nava hevala – ew tera him nave, him namûse.

De lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, Rizgano qurba.
De lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,

Hela xeber devê Nûrêda bû,
Ringîn kete mîreta abêşîkê,
Rizgan ser milê Nûrêda welgerya bû.
Nûrê divê: - Wey malîno, hevalê dora mine tunîne,
Ezê birîna delalê dilê xwe –
Girêdim vê sibê şer û şemaqîyane,
Ezê dikim, nakim toz xubara şikevta kavil
Çima xwe davê dev û rûyane...

De lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, Rizgano qurba.

## RIHANA HESO

Lo, lo dilo, lo, lo, dilo, lo, lo dilo,
Bejina Rihana Heso zirave, temam jine,
Minê soz şirîetê bavê xwest, neda minda,
Ez hevt sala mala bavê te şivan bûm –
Ramûsanekê min keremke, ramûsana heqê mine.

Digo: - Kuro, gede, hetanî tu hatî qelenê min birîne,
şîranîyê min xarine,
Lo dilo, lo dilo, lo, lo dilo, lê Rihanê.

Rihana Heso rêva diçû reqe-reqa zer şimika,
Xwezila mine wî xortî be, ramûsanekê jê bistîne,
Ji xalêd gerdenê, pêsîra tiştîrî, gerdena cemawî,
Lo dilo, lo, lo dilo, lo, lo dilo, lê Rihanê.

Bejina Rihana Heso darek dara vê zeytûnê,
Hêşîn dike li Mesînê dev titûnê,
Ezê nedim terka Rihana Heso, çev biryê belek,
sûretê sor, dêmê gulî,
Heta li ber serê min neyê dengê melle, dengê vê asînê,
Heta min bidine ser teneşoyê, têkeve qula çevê min
kefa vê sabûnê,
Lo dilo, lo, lo dilo, lo, lo dilo, lê Rihanê.

*Ji sitranên Mehmedê Mûsa*

## SEBIRÊ

Eman, eman, eman,
Sebirê, kaviraneke teye ji eceme,
Serbar kule, bin bar keme,
Bahare, xelq wê ketîye derdê mal, halê dinyalikê,
Ezê keleş gorî – bejina te zerîyêye,
Eman, eman...

Eman, eman, eman,
Qulinga mala xwey xiravo,
Têyî ji kîderê, Îranê, vê Tûranê?
Bahare, xelq wê ketye derdê mal û halê, dinyalika gewirik,
Ezê ketime gorî bejina te seyranê,
Eman, eman...

Eman, eman, eman,
Qulingo, têyî ji kîderê, divê
Xelq wê ketye derdê mal û halê, dinyalika gewirik,
Ezê keleş gorî - bejina te seyranê,
Eman, eman...

## SERAYÊ

Serayê, ha serayê,
Ezê sera Dîyarbekir qesira kekê Melo ketim ha liman, ha liman,hayê,
Ezê vê sibê bala xwe didinê têda nayê nav dengê kekê Melo, sewta şêx Mîrzayê.
Wezîro, wezîro, şêxî dîne.

Ezê sera Dîyarbekir ketim,
Qesira kekê Melo li vî destî,
Kaxezek hatîye pey kekê Melo, şêx Mîrzayê ha bi qestî,
De bira xwedê qebûl neke hostêra,
Xencera kekê Melo çêkirî,
Qelp çêkirye, qevza xencerê berda şikestî.
Serayê, ha serayê, şêxî dîne.

Serayê, ha serayê,
Ezê sera Dîyarbekirê ketim kevirî sore,
Kaxezekê hatîye pey kekê Melo, kaxeze more,

Vê sibê, xwedê qebûl neke, çawa milê kekê Melo, şêx Mîrzayê girtin destê zore,
Sî û sê pîlekana birine herema lape jore.

Şêx Mîrzayê sê denga kire gazî:
"Gelî xulam-xizmetkarino, çêbin, çê bixebitin,
Hewara me erdê tune, ezmana maye rebê alemêye yekê jore".
Serayê, ha serayê şêxî dîne.

Şêx Mîrzayê sê denga kire gazî:
"Reşît paşa, min nizanbû dinya waye,
Hergê min bizanbya dinya waye,
Min şûra hêşîn, çend sîyara anqosî xwera banya ha li vire,
Minê serê hevt qewazê te jêkira,
Bira koma te bihata hewarê..."
Serayê, ha serayê, şêxo dîno.

Sultan Reşît paşa sê denga kire gazî:
"Şêx Mîrze, şêxo dîno, êla te revya,
Qevza xencera te helya".
Şêx Mîrze kire gazî:
"Sultan Reşît paşo, tu bizanbe êla min ne revya, ne bezya,
Êla minê xêr û şayî ser malê bira pismamê hesinyada vegerya.
Serayê, ha serayê, şêxî dîne.

*Ji sitranên Reşîdê Baso*

## SERAYÊ, HA SERAYÊ

Serayê, ha serayê,
Xweş tê dengê bavê Telo
Sewita şêx Mirzayê.
Şêx Mirzayê şêxa dike gazî:
Fêrîk paşa, te male xirav be,
Ez tême kuştin,
Tucara tera nayêm rayê.

Sera li min sera,
Şêx Mîrzayê şêxa danzde qejime-qejme,
Zomê qayîşêda dane ber xençera
Mêrê sêzda sevatê, sevatê
Xençera kekê min helya.

Sera me lo divê ez hanakim,
Qîza Telo divê ez ha nakim,
Qirarê xwedê be ez kincê Qere nezamê
Xortê anqosya nakim,
Hûryata Fêrîk paşa teze qebûl nakim.

Sera Melo kevirê more,
Koçika Melo kevez more,
Eskerê Fêrîk paşa girane, girtîye zore.
Şêx Mirzayê şêxa dike gazî:
Fêrîk paşa, te male xirav be,
Ezê tême kuştin,
Tucara tera nayêm rayê,
Serîke rya Sûltan Cizîdê sore.

## SERÊ MIN DÊŞE

Êlê gewirê, serê min dêşe, halê min tunîne,
Wey êtîmê, de tu cxarekê titûna Mûşê çêke, minra bişîne.
Wî kulmalê, wekî xemê te heft sala tevî hevbe,
Hê qasî xemê min qasekê nîne.
Dîna min, dîna min, dîna min, dînê...
Were êlê gewirê kulmal,
Serê min dêşe, halê min tunîne,
Wey êtîmê de tu pê darê darçîna, darê mexika,
Misk û mewera, dûxê û gulavê
Enya min bireşîne.
Dîna min, dîna min, dîna min, dînê...

## SER KULEKÊ

Ser kulekê neke terî,
Te dev-lêva gul dibarî.
Bira stûyê bavê domama min şkestîbya –
Ez gava dinê ber derê domama xwe
Neçûma –nehatama.
Kotîyê mêr kewa gozel dikuta –
Çi qar ḥebûn dida sêrî...

## SER SÎPANÊ

Ser Sîpanê Xelatê, dil hey dil,
Berf û baran herro lê tê.
Gakûvîyo, sitru mezino,
Te sitru weke bejna mino,
Te ji hev kirîye mêr û jino.
Gakûvîyo, sitru biçûko,
Te sitru bilalûko,
Te ji hev kirîya zeva û bûko.

## SÊ ZERÎ

Lê lê weylê, le, lê dînê,
Sibeye dilê min kubarê,
Ezê vê sibê bala xwe didimê,
Sê kewê gozel rabûne ser serê vê minarê,
Sê car kirine gazî Ele û ekbere,
Sê zerî, sê qesira teko, teko hatine dere,
Sê teyra ser serê hespê zeryara teko, teko girt sîbere.
Yek teyrê ale, yek teyrê baze, yek teyrê qereşkere.
Gundî cînarno, ezê salixê hersê zerîyê ji wera bidim:
Zerya pêşin yeke sore sipîye, çîle qerqaşe, ben zirave,
Pelake sipîne notilanî palekê belqîzayê.
Zerya ortê –yeke bejinêda nîvçeye, sûrete sorê hinarê,
Gulî dirêje notlanî gulîyê Zîn xatûnê Cizîra Botê,
Memê Ala sibê heta êvarê bide bin ebayê.
Gundî cînarno, bextê wedame,
Bejin û bala zerîyê paşin usane,
Notilanî bejin û bala qîza Silêman pêxembere,
...Ada hevt berada ser girtine...

*Ji sitiranên Reşîdê Baso*

## SÎNEKÊ

Delalê, minê li Sînekê li hafê vê Sînekê,
De tu rabe qolê zêra bavê ber cênîkê,
Ezê terka bejina zirav, çev biryê belek nadim,
Hetanî neyê ser min qasidê mirinê qoce felekê.

Ay lo dilo, heylo dilo, zalimo dilo,
Ay lo dilo, heylo dilo, birîndaro dilo,
Heylo dilo, heylo dilo, xerîbo dilo.

Delalê, zozanê mala bavê te Serhede,
Muhubê bira temya min tebe,
Nava sîng-berê xwe hemû kesî nîşan nede,
Nava sîng-berê te afirê menekyane,
Qulebergîrê xelqê ser girênede.
Ay lo dilo, heylo dilo, zalimo dilo,
Ay lo dilo, heylo dilo, birîndaro dilo,
Heylo dilo, heylo dilo, xerîbo dilo.

Muhubê qurban, ji Elegezê wêda kanî sorke,
De tu rabe sîûsê gulya li ser mila warke,
Ezê kerba te nexweşim, birîndarim, birîndarê heft salame,
Qasekê were li kêleka min rûnê -
Bi hêsirê çevê xwe birînê dilê min dermanke.
Ay lo dilo, heylo dilo, zalimo dilo,
Ay lo dilo, heylo dilo, birîndaro dilo,
Heylo dilo, heylo dilo, xerîbo dilo.

## SÎPANE

Sîpane, hey Sîpane,
Miqabilî ewrane,
Saye, barî barane,
Seydayê min malo.

Serê Sîpanê mije,
Van teyran gije-gije,
Zerîyan xweşkir lavije, dê jaro.

Seran da têm her haykem,
Destmalê xwe lê bakem,
Seydê min malo,
Çevbelek ji xewê rakem, dê jaro.

Seran da têm dilezînim,
Destmalê xwe dihejînim,
Çevbelek ji xewê tînim, dê jaro.

Gayê kûvî betere,
Sitran wekû xencere,
Ser sîngê Seydo ço dere, dê jaro.
Sîpanê li ser Xelatê,
Te li seran berf û ba tê,
Kî gul dîbû sibatê, dê jaro.

*Got: Gula Ozman*

## SIBE BI MIN SIBE

Sibe bi min sibe,
Keleş kawa min mînanî sitêrka sibê ser minra dilûlibe,
Keçê, kulmalbavê, were ramûsanekê li min keremke,
Heçî derd û kulê te heye –
Bira li canê minbe.

Birek sîyarê me syar bûne,
Ji welatên gurcan hespêd xwe girêdane darêd diteysan,
Pişta xwe dane darê sincan,
Heyfa min nayê ser heyfê-
Jinê çê ketî ber destî kotî, şindokî, pîsî mêra,
Serê xwe danîye ser zendeka morî-mircan.

Xweş tê bakî nerme, lêdixe –
Dihejîne serî şêbiskêd wê, pêşa delme,
Keçê, kulmalbavê,
Were ramûsanekê min keremke.
- Kuro, kulmalbavo,
Minê ji çevê reş belek gelek şerme.

*Got: E. Eslan*

## SIMILA

Simila, hey simila,
Simila tûbarek,
Kofiyê te bimbarek,
Herro radimûsim carek.

Kofiyê te qilîçe,
Derzyan xuçe û xûçe,

Navê yarê Xecîce.
Kofîyê te dibêm keske,
Derzyan hûr meqeske,
Cihê destê min xweşke.
Kofîyê te dibêm sore,
Derzyan dane dore,
Cihê destê min li jore.
Kofîyê te bi noke,
Derzyan koke û koke,
Navê yarê Xweşkoke,
Hey simila û tûbarek.

## SINCANÊ TELO

Lê yeman, lê yeman, lê yeman,
Lê yeman, lê yeman, lê-lê yeman,
Ezê Besim, Besim, Besa Îkome,
Kulîlka Elegezê şewitî şev û rome,
Ezê serdilka Sincanê Telome,
Lê yeman, lê yeman, lê-lê yeman.

Axaw çemê Payê li min vaye,
Ez dinhêrim derda daye ser kulane,
Pirsa eseyê min digirin,
Serdilka dilê Sincanê Telo, Besa Îkoye,
Lê yeman, lê yeman, lê-lê yeman.

Axaw çemê Payê tê leme-leme,
Pêl li ser pêlada difitile,
Xelqê ketîye derdê mal û halê dinyalikê,
Ezê ketime derdê Sincanê Telo, xwe vî dilî,
Lê yeman, lê yeman, lê-lê yeman,

Axaw min te, te bi xudêyo,
Te pirekê ser çemê Payê çêkî,
Qeyd û zincîrê te giranin, tê lingê Sincanê Telo vekî,
Hergê dixwezî her hevt birê min û Gelto xulam di dewsêkî.

## SIWARO

Gotîye:- Keçê Eyşê, Eyşa Hecî,
Nîşana siwarê te çi nîşane?
- Şal û şebî lê dîhane,
Kum li sêrî mexrabîye,
Cizma linga Romanîye,
Kiras-derpê Nivîsîye,
Şûrê li berra Gurgêlîye,
Xencera berra Nizêrîye,
Mihîna li binda çale-çarsalîye.
Go: - Eyşa Hecî, evê tu dibêjî,
Çil û çar riman birîndare,
Ez hatime, nizanim piş minva mirîye, an saxe?

Eyşa Hecî rabûye, radibûye,
Cilê egîtî li xwe kirye,
Mihîna çar û çarsalî lê swarbûye,
Qesta xwe li bona beriyê jî kirîye,
Nava lemanda geryaye.
Dibîne nalînek dûr û kûr têye...

Çû, xûn ber çevê paqij kirîye.
Çevê xwe vekirîye,
Go: - Eyşa Hecî tu li ser çevê min, herdu çevan hatî.
Go: - Siwaro, ji xwera neke tu xema,
Ezê te bajêr û şeherstanan bigerînim,
Hekîman ezê ji tera bicivînim.
Go: - Eyşa Hecî, tu min li bajar û şeherstana megerîne,
Tu hekîman ji minra neyne, necivîne,
Tu sipkan bavêje toza Serayê,
Êvarê bide xuşka gerdenê...
- Îşalla birîna cindî şenge, siwarê minî ber xêre.

*Got: Efoyê Esed*

## SYARA SYAR DIGOTIN

Syara syar digotin,
Dêtola tengê menegîada xwe disotin,
Xalçîya dijmin dane ber sîngê menegya û dajotin.

Ca bi xadê koka şêran û erfata hev qelandin,
Weke bera Wanê xûn rijandin.

Êlê dayê, şerrekê me qewimye,
Xana xirave haj kêfêra,
De dive dinya nemîne ji te û alemera...
De lêxin, lêxin, keko lêxin,
Lêxin, lêxin, syaro lêxin,
Xwedê berxê nêr dane ji kêrêra.

Xana xirave li hevraza,
Vê sivê tê dengê borî borîstana,
Sewta tulimbaza.

Êlê dayê, ezê vê sivê Soylemezanê şewitî ketim devê rêye,
Vê sivê hermetekê kolozekî xort anî ser destane...
Xwe bi helava dilûbîne jêla têye:
Îro bra lê hatye kuştin,
Cinyazê Riza li erdêye...
Ezê vê sivê Soylemezanê şewitî ketim gul-gulîne,
Vê sivê hermetekê kolozekî xort anî ser destane..
Xwe di helava divêje, dilûvîne:
Meçe pêşya lawê Dursim,
Bira lê hatye kuştin,
Lola hirçeke ser kudika dil birîne.

*Got: Mîroyê Qero Mistoyan, 60 salî, nexwendî,*
*şivanê kolxoza ser navê Lênîn, Êcmîazînê.*
*Deh zarê wî hene.*

## SYARO

Syaro, syar neqandin,
Bavkotî, hespkotî, xalkotî,
Dezgîna hespê xwe helkişandin.

Ebangî sipî Bexdayî,
Ber milê xwe nefandin,
Xêrê wayê nevîne Esedê lawê Xêlit,
Sala îsal koka mêran lev tefandin.

Dilê min dêşe, dêşe,
Bavçê, hespçê, xalçê,
Dizgîna hespê xwe kutane pêşe.
Xêrê wayê nevîne Esedê lawê Xêlit,
Anî koka me torina mala Şewêşe.

Kanîspîya wêran devê xetê,
Esedê lawê Xêlit syarbû, sebir ketê,
Xêrê wayê nevîne Esedê lawê Xêlit,
Gullekê li Hemzo delalî malê daye,
Şikênandîye şirka vê sehetê.

Dayê dêran, bi min dêran,
Gulê rebenê, de rave, porê serê xwe kurrke,
Bi heft dûzana, danzda kêran.
Xêrê wayê nevîne Esedê lawê Xêlit,
Sala îsal li me anî koka mêran.

## SONEME

Soneme, sed car Soneme,
Sonema enî bi cixeme,
Ber bûkê birayê xweme.
Xoşabe berda gêlî,
Siphan dixwenî emdelî,
Êvaran Eyşoka Çolî.
Xoşabe li berda dêre,
Singê Eyşokê zêre,
Ber bimrî ezep şêre.

Xoşabê tu bi xudêke,
Tu rya mizgeftê çêke,
Min gel Eyşokê verêke.
Xoşabê berda eywane,
Singê Eyşokê mircane,
Bergovend karê çelyane.
Xoşabê berda aşe,
Singê Eyşokê qumaşe,
Ber bimrît Xosrov paşa.

## TALVORÎKÊ

Talvorîkê, darê çamê,
Emerê Keko du sê denga kire gazî,
Go: - Moso, Birko, Karapêt, Kirko,
Têne rayê, werine rayê,
Hergê nayêne rayê –
Ezê berdime eskerê te
Bixim hewşa camê.

Moso, Birko, Karapêt, Kirko go:
- Emerê Keko, me pozî bavê yayo,
Bira qirar be qirara mêrê di berêbe,
Emê berdine eskerê te,
Derbaz bikin heyanî ava Şamê.

Emerê Keko hela bi min hela,
Ebareşo, şolbeleko, koloz berra,
Van kafirê canfîdana
Şerr xweş kirine
Ji zikirê şêxan û mellan.

Talvorîkê, darê çûkê,
Emerê Keko du, sê denga kire gazî,
Go: - Moso, Birko, Karapêt, Kirko,
Têne rayê, werine rayê,
Hergê nayêne rayê –
Ezê berdime eskerê te
Derbaz bikim heyanî ava Bêlacûkê.

Moso, Birko, Karapêt, Kirko go:
- Emero, me pozê bavê nîyayo,
Bira qirar be qirara mêrê di berêbe,
Emê berdine eskerê te,
Bixine nava malan,
Ji te derxin kincê zavatiyê xemla bûkê.

Talvorîkê dara mezî,
Emerê Keko du, sê denga kire gazî,
Go: - Moso, Birko, Karapêt, Kirko,
Têne rayê, werine rayê,
Hergê nayêne rayê –

Ezê berdime eskerê te,
Bidim vî hevrazî.

Moso, Birko, Karapêt, Kirko
Li Emerê Keko kire gazî:
- Bira qirarbe, qirarê mêrê berêbe,
Eskerê te bixime nava malan,
Emê zikê jina biqelişînin,
Derxin zarê rût û tezî.

Kuro, lawo, helakin, ha helakin,
Dest bi şûrê mertala kin,
Berdin eskerê kafirî canfîdana,
Ji qeleça Talvorîkê rakin.

## TEYR

Teyrek têye, teyrê beze,
Ewî gelekî li me naze,
Ewî teyrî anîye koka me teyrane,
Şevda radive dixûne bîstûçar zimanane,
Me herimandîye xewa şevane.

Teyrek hatîye, teyr qotane,
Go: - Mîr Silêmano,
Bilbil me herimandîye xewa şevane,
Me anîye koka teyrane,
Şevda radive dixûne bîstûçar zimanane.

Teyrek hatîye, teyrê atmeceye,
Hatîye cem mîr Silêmîne,
Go: - Mîr Silêmano, go,
Bilbil xewa şeva me herimandîye,
Go, anîye koka me teyrane,
Halê me, go, tune destê bilbildane.

Teyrek hatîye teyr kivîve,
Ew hatîye cem Mîr Silêmîne.
Go: - Mîr Silêmano!
Bilbil anîye koka me teyrane,
Go, halê me tune, destê bilbildane.

*Got: Kamilê Xelîl ji Tbîlîsîyê*

## TÊLYA MEMO

Tozê meke, tozê meke,
Têlya Memo tozê meke,
Toz-xubarê tev raneke,
Keçika Memo tozê meke,
Dilkê lawika tevhev neke,
Têlya Memo, Têlya Memo.

Têl bêrîyê, Têlya Memo têl bêrîyê,
Zer kutane ser enîyê,
Radimûsim te zerîyê,
Tozê meke, tozê meke,
Toz-xubarê tev raneke.

Têl beravê, Têlya Memo, tê li beravê,
Kinc şûştine dane tevê,
Radimûsim te bejn ziravê,
Tozê meke, tozê meke,
Toz-xubarê tev raneke,
Dilkê lawika xirab neke.

Sêlê tîne, Têlya Memo sêlê tîne,
Ba tê biskê wê dixîne,
Tozê meke, tozê meke,
Têlya Memo tozê meke,
Toz-xubarê tev raneke.

## TE LI ZENDAN

Te li zendan, te li zendan,
Te li zendan bazinê zer,
Min kirî çend û mendan,
Te li zendan bazinê zer.
Bazinê yarê zîve,
Naçît zenda sipîye,
Te li zendan bazinê zer.
Bazinê yarê zêre,
Min kirî ij bajêre,
Naçît zenda yarêye,
Te li zendan bazinê zer.

## TETERXANO

Teterxano, hey Teterxan,
Teterxano, Simayîl,
Şorkir bendê hemayîl,
Li nav şeran ezrahîl.
Teterxano, bi tinê,
Şerê soro, bi tinê,
Siwarê terazinê,
Roja şera û mirinê.
Teterxan kewî lale,
Wey Teterxano, Simayîl,
Bi şîr û bi metale,
Şerê Rostemê Zale.

## TEW ZÎVKIRO

Tew zîvkiro, tew zîvkiro,
Xadê malê xiravkiro,
Te gistîla min çêkiro,
Du zêrr dabûn avzêrkiro,
Evê tilya min kulkiro,
Çakûç anî hûr, hûrkiro,
Xadê malê xiravkiro.

Tew zîvkiro, tew zîvkiro,
Xadê malik xiravkiro,
Te bazinê min çêkiro,
Du zêrr dabû, avzêrkiro,
Ewê sîngê zer kulkiro,
Çakûç anî hûr, hûrkiro,
Xadê malik xiravkiro.

Tew zîvkiro, tew zîvkiro,
Xadê malê xiravkiro,
Te guharê min çêkiro,
Nîv zêrr dabû, avzêrkiro,
Ewê guhê min kulkiro,
Çakûç anî hûr, hûrkiro,
Xadê malik xiravkiro.

*Got: Casimê Şemo*

## TEW LO-LO

Tew lo-lo, tew Şênî,
Derva sare, were xênî,
Te sing sipî sifra sênî.

Kulmalbavê, ezî ne li malim,
Tu çevê reş belek kê dişkênî?

Kanî bi min kanî,
Destê keleş kawa xwe bigirim,
Nola dîna şewitî bigerim xanî-xanî...

Min dizanbû tu delalîya dilê min bi tenê bûyî,
Min nizanbû – tu delalya dilê hemûyanî.

Tew lo-lo, tew Şênî,
Derva sare, were xênî,
Te sing sipî sifra sênî.

Ezê ji taxa jorîn tême,
Rabe cîkî dayne, ez ne çême.
Xortê xelqê delal birîndarê şûra, riman, zerganin,
Ez evdalê xadê birîndarê te û bejinême.

Tew lo-lo, tew Şênî,
Derva sare, were xênî,
Te sing sipî sifra sênî.

*Got: Efoyê Esed*

## TE ÇEV REŞÊ

- Min rûreşê, tenya sêlê,
Çerçî hatye nava êlê,
Wekî şerma xayî û xudana nîbya
Minê şera xwe gevez
Gede lawikê xwera bida dû-dermana vê simêlê.

- Te çev reşê, birû dorê,
Ez Evdalê xwedê terka çev û birûyê belek nakim
Heya roja mirinê hafa gorê.

Mala mezin, mala mêra,
Bejina kewa gozel wê bilinde,

Heta ez evdalê xwedê çûm welata xerîva,zivirîm hatim,
Destê kewa gozel girtin dane malî mêra.

Dilê min hêlîna teyrê hewa,
Vî teyrê malxirav hêlîna xwe çêkir
Cîngê qulinga refî kewa.

De êmekê ez û kewa gozel
Hevra bidine derbazkirinê,
Bira xwedê neve badîhewa.

Mal bar kirin, koç rê ketin,
Kewa gozel dixemilî rexî peket,
De nava dil û cegerê min evdalî xwedê
Dişewitî, agir pêket.

- Mala me cînarê mala şêxe,
Lawiko qurba, de tu kaxezekê
Binivîse, morê pêxe.
De tu sala îsalin were
Min birevîne, paşê nav û dengê min dinêxe.

- Dilê min hêlîna teyrê narî,
Teyrê malxirav hêlîna xwe çêkirîye vî zinarî,
Herçikê sala îsalîn
Rûyê dêla jina minda hatye serê min evdalê xwedê –
Bira neyê serê Îvanogê kurmexarî.

Dilê min bejina te xatûnê,
Nona nîka şemamoka –
Dilê xwera hildî daynî ser taximê.

- De bira xwedê sala îsalîn
Dê û bavê xiravra qebûl neke,
Çawa ez nedame xortê çarde salî,
Mal bi gundda –
Heft salyêda dilê min têda.
Ez girtim dame kotî şindokî mêra.
Ez êvara berê xwe lê diguhêzim –
Heya sivê pişta xwe didimê.

- Wey qîzapê, nav Esmerê,
De tu nesekine ber sitûna vê sivderê,
De bira tilya min herin çevê yazî miqederê.

Xwezila dilê min dilê tebiya,
Bejin bilind yara min bya,
De bira malî gundî,
Der û çînar tev şedebiya.

- Wayla halê min halimê,
Xelqê têlî delal nexweşe,
Ketiye kuxikê, vê harsimê.
De bira xwedê dê û bavê xiravra qebûl neke,
Çawa nahêlin ez evdala xwedê herim, serîkî bidimê...

## TOPALO

Topalo, lo lawo,
Şerê serê sibê heya êvarê kê kir, kê û kê kir?
Topalê mele şûr hildaye hingava pê kir,
Şûrekê nava Esedê Hemê daye,
Qotika Fîno milê Himayîlê kin berda jêkir.

Helan danê, helan danê,
Çêjê mala Şero gelekin,
Serê meydanê, binê meydanê,
Topalê mele hevt serkêlkê şûrê birîndare,
Sond xarye quranê,
Tucara ranabe li meydanê, li meydanê.

Topalo lawo,
Ezê mêrga bêzo ketim der xanîya, der xanîya,
Serê meydanê Topalê mele, Esedê Hemê serkêlkê şûra,
Balçikê mertala hev aliya,
Topalê mele şûrek nava Esedê Hemê daye,
Heylo lo lawo Şemeda dilê dayka teye kevin û teze tev helya.
Helan danê, helan danê,
Çêjê mala Şero gelekin,
Serê meydanê, binê meydanê,
Topalê mele hevt serkêlkê şûrê birîndare,
Sond xarye quranê,
Tucara ranabe li meydanê, li meydanê.

Topalo lo lawo,
Ezê kela Ezurmê
Ketim dikanek, dikanê wan qomsiya,
Ezê vê sibê bazara kembera pişta dayka te dikim,
Kembera pişta dayka te girane, hevt girvanke zêre...
Topalê mele hevtê serkêlkê şûrê birîndare,
Ezê êvarda rûnêm birînê Topalê mele xwera hêdî-hêdî bidime ber kêlekê, ji hûr derziya.

Helan danê, helan danê,
Çêjê mala Şero gelekin,
Serê meydanê, binê meydanê,
Topalê mele hevt serkêlkê şûrê birîndare,
Sond xarye quranê,
Tucara ranabe li meydanê, li meydanê.

## FELEKÊ

Felekê mala xweyî şewitîyê, tê dikşî, nakişî qe newastî,
Notila çemê dorê kefe, gerrîneka bûne hestî,
Gere meriv îtbara xwe cahil-cûhilê vî zemanî neyne:

Cahil-cûhilê vî zemanî usanin,
Notilanî werisê rizî, pira şikestî.

Felek hay felek, syarê felek çûne, mane kulek,
Xelqê ketiye derdê mal-halê dinyayê, dinyalikê,
Ezê bûme maşoqa bejina bilind, çevê belek.

Felekê mala xweyî şewitîyê, qîztî mala bavada çiqas xweşe,
Bûktî mala mêrada gula geşe,
Wexta meriv dikeve ber kar û begalê malada, dibe dayka dergûşe,
Usane notlanî teyrekê refa biqete, xerîb keve, perr û baskê wê biweşe.

Felekê mala xweyî şewitîyê, dilê min hêlûne, hêlûna teyrê bazî,
Sê kevotikê ser minra firîne, zelûlî kirine gazî,
Go: - Erê felekê mala xweyî şewitîyê,
Teyê kavilê gundada goştê min xarîye,
Ji hestûyê rûte tezî çi dixwezî.

*Ji sitranên Reşîdê Baso*

## FEQÎYÊ TEYRA

Ya dil, were, ya dil were,
Herçê ji dil kir bawere,
Ne ji ometa pêxembere.
Herê dilo, bes dibêje,
Berf û baran tev qirêje,
Gotina aşiqa pirr dirêje.
Herê dilo, şayê merdan,
Ew kaninga cew jê berdan,
Em razîne emirê xudan.
Herê avê, tu çima ha lezî,
Bê kizbe, bê libasî?

Herê malxirabê,
Tu xerîba dûrva dikî nasî.
Herê avê, tu çima ha giranî,
Bi qeyde, bi qanûnî?
Avê go: - Feqîyê Teyra,
Aqa ewlîya, emîya hebûn,
Wana jî zanibû bendê mirin hebû,
Pirs û hewal ji me nebû.

Go:- Herê avê, herê avê,
Tu şev diçî, tu ro diçî,
Kesî nakî pirs û silavê.
Avê got: -Aqa pêxember hat buhurîn,
Kesekî pirs û silav min nekirî.
Go, pêxember aqil hebû,
Ew hewceyî gilya nîbû...
Feqîyê Teyra go:
- Werin, werin, heval werin,
Hogir werin, cînar werin,
Xewna Feqî şiro bikin,
Xwe bendê axiretê Feqî xilaz bikin.
Îro qewî, têtim girî,
Sed ax, kovan, keser,
Dev, lêvê şîrine şekir jê kêm bûne durr û xeber.
Çûme mêrgê, zemîn di nel,

Extyarîya min hebû, neçûma nav.
Çûme mêrgê zemîn li dest,
Ewan ji xwera mirazek dixwest.
Mendo, menal,
Şîn û girî bê feydeye,
Gorr û kefen heq mala meye...

*Ji gotina Şera Bekir, şêxa Şêxûbekir,*
*ji dîya xwe bûye s.1890-î, nexwendî,*
*gundîya Qibixtepe li ser nehya Talînê.*
*20.08. 1970*

## XANÊ YEMAN

Xanê yeman, xanê yeman,
Xanê yeman, canê yeman,
Law ketin xîyal-xeman.
Tête ij dûre, tête ij dûre,
Şalê reş ser mapûre,
Lawino werin kerpûle.
Têt ij babane, tet ij babane,
Şalê reş ser milane,
Lawino werinê xwe talane.
Xanê te kir, xanê te kir,
Şalê reş ij milan vekir,
Min ramûsa, te dey nekir.

## XANIKÊ

Xanikê, tu di xanîng, Xana min,
Canikê, tu di canîng, cana min.
Gelîngî bi kure, Xana min,
Hermişî bi hûre, cana min.
Gilyê delalê, bi Xana min,
Porê şemamê, bi cana min.
Xanikê bimaş, bimaş,
Mêrikê te mir serkê min xweş.

## XEZALÊ

Malîno, minê Xezal rakir baxê delme nav Rewanê,
Vê sibê çevê Xezala min xewe, guhê wê guhdare, lingê wê banzdanê,
Erê xwedê minê salix-sûlixê Xezala xwe hildane,
Besta gira davketîye ser goşa çîyayê Axmixanê.
Xezal nabe, delal nabe, dil kafire, derdolo, çare nabe.

Xezalê digo: - Lawiko, hêwa, sed car hêwa.
- Ezê sîng û berê xelqê têlî delal dinhêrim
Usane bax û baxçê hirmî, sêva,
Heyfa minê nayê wê heyfê,
Heyfa minê tê wê heyfê, tu were sala îsalinê
Kotî şindok dewarê mêra bide nava dev-diranê pintî, derdo lo heram lêva.
Xezal nabe, delal nabe, dil kafire, derdolo, çare nabe.

Malîno, minê Xezal rakir Kanekêrê kokê dara,
Xezala minê vê sibê berjêr meşya berê xwe dayê şeherê giran, dikanê van etara,
Malîno, sala îsalinê şûşa dilê Xezala min derizîye,
Ezê dikim milê wê bigrim bigerim
Ser hekîm û doxtira, na wele dîsa van şebara.
Xezal nabe, delal nabe, dil kafire, derdolo, çare nabe.

Malîno, Xezalê digo: - Lawiko, ezê berfîm, berfa vî bêlanî,
Teva sibê daye ser min, sya êvarê lê zivirî,
Ezê helyam ne helyam, kesekî tasa ava sar qet lê nanî,
Xwezla xêra mala xwedêra welatê xerîba
Ezê bibûma gustîleke silêmanî,
Têketama tilya te mêvanî.
Xezal nabe, delal nabe, dil kafire, derdolo, çare nabe.

## XEYALO

Xeyalo, hey xeyalo,
Xeyalo, xezalim lê,
Xeyalo, cil qutayî,
Zend-bazin hildayî.

Xeyalo, cil te şûştî,
Xeyalo, xezalim lê,
Zend-bazin hilmiştî,
Rêvingan çawa kuştî,
Xeyalo, xezalim lê.

## XOZANE

Xozane, xweş xozane,
Alîk deşte, yek zozane,
Ezê çevê xwe selefê syara digerînim,
Qeymesê syarê Senemê ne navdane.
De dilê min yo, yo, dilê min yo, yo...

Xelqê unda kirye tekan û tûka,
Min merûma xwedê unda kirye
Qeymesê syarê Senemê, gurzê ber cênîka.
De dilê min yo, yo, dilê min yo, yo...

Ezê xozandaxê dinhêrim wê bi yanda,
Xwezil xêra xwedêra min bizanbya
Qeymesê delal, syarê Senemê -
Ser çoka kîjan cindî ruh û canda?
De dilê min yo, yo, dilê min yo, yo...

*Got: Memê Xudo*

## XÛN DERKETÎYE

Xûn derketîye ji Rewanê berfek daye,
Ajotîye ser kambaxa Erzirûma şewitî ser qedaye,
Paşa bi sê denga kire gazî bînbaşî,
Go, tivinga gêrman dayne,
Teslîm bive, were rayê.
Heyla wayê, heyfa min tê li wê heyfê,
Gelî axlara, beglara mane Stembola kambax bin demanê.

Erzirûma kambax li dibûrî,
Eskerê sarî Moskovî girane,
Gênêral Andiranîk paşa, Nazarbêkov ketine li pêşyê,
Îro sê roj, sê şeve dikişe mîna mûrî...

Heyla wayê, heyfa min tê li wê heyfê,
Gelî axlara, beglara mane Stembola kambax bin demanê.

Sira vê sivê, sira sar tê,
Eskerê sarî Moskovî girane kambax çarnikal tê,
Wele şere, bavo şere,
Eskerê sarî Moskovî bi telîmî, bi zakone.

Dîlîmana kambax wê li yane,
Tivinga destê Sihîdî Nado abêşîkê ûrisî xase,
Ya destê xulam û xizmetkara maûzerê di hînane.

Weylê wayê, Silê lawê,
Çê bin, çê bixebitin,
Heylê wayê, emê qelişêda bêne kuştinê,
Tucara pêşya Elî begê nayêne rayê.

## XULÎXAN BAKIR

Xulîxan bakir –gelî syaran syar bin,
Îro xonaxa min Pasêye,
Gelî syaran syar bin,
Îro xonaxa min Erzirma kambax,
Derîyê îskelekê.

Gelî syaran syar bin,
Îro xonaxa min ketye Erzingalê,
Hemîdînê papax sipîne,
Formê gêlîne,
Bavê Îbrahîm peşyê siwaran-
Xelq zane torine.

Gelî syaran syar bin,
Şro xonaxa min ketye kambaxî
Êtemolê kavil,
Derîyê sultan îske keleye,
Gelo hemîdîn, papax sipîyê
Formê di gêlînê.
Bavê Îbrahîm paşê xulaman xwe ba dike,
Xelq zane ji xwe torine.

## XUMXUM

Xumxuma min findikî,
Delala min findikî,
Tu bi tore, tu bi çiwanî?
Xumxum, ez u tune,
Çevreşê em herdune,
Xumxumê, tu bi tarî, tu bi çiwanî?
Xumxuma min keleşî,
Delala min keleşî,
Tu bi xayê sola reşî.

Xumxuma min Bênatî,
Delala min Bênatî,
Xumxum, ez u tune,
Çevreşê, em herdune.
Xumxuma min findikî,
Delala min findikî,
Xumxum torab anî,
Delalê torab anî.

Xumxuma min herûnî,
Delala min herûnî,
Tu bi kîs û qelûnî,
Xumxum, ez u tune,
Çevreşê, em herdune.

Xumxuma min xesxêrî,
Delala min xesxêrî,
Xumxum, ez u tune,
Çevreşê, em herdune.

Xumxumê torab anî,
Ser bextê min tu bi mêrî,
Xumxum, ez u tune,
Çevreşê, em herdune.

Xumxuma min bêdarî,
Delala min bêdarî,
Xumxum, ez u tune,
Çevreşê, em herdune.

Ser bextê min tu bi yarî,
Tu bi torî, tu bi çiwanî.
Xumxum, ez u tune,
Çevreşê, em herdune.

Xumxuma min hakîkî,
Delala min hakîkî,
Xumxum, ez u tune,
Çevreşê, em herdune.

Xumxuma min av anî,
Ser bextê min tu bûkî,
Xumxum, ez u tune,
Çevreşê, em herdune.

Xumxuma min hozimî,
Delala min hozimî,
Xumxum, ez u tune,
Çevreşê, em herdune.
Xumxumê torab anî,
Delalê torab anî,
Xumxum, ez u tune,
Çevreşê, em herdune.

*Got: Pêtros Kandalyan, 70 salî,*
*libûjen, li Yêrêvanê dimîne, s. 1956*

## XWESÎYA MIN

Xwesya mine dîne, bê îmane,
Rojê min dişîne qirşa, nîvro şûnda van gûnyane.
Lawiko qurba, kê ditirsî, kê newêrî,
Were bişkêne kilîta zermemika, zirrza dêrî,
Serê zermemikê min xwera têxe şevbihêrî.

Lawiko qurba, minê gava dinê nava nîvro,
Bala xwe dayê, sê steyrikê ji ezmana hatine rû erdane,
Yek xelaye, yek mirine, yek jî huba dilane.
Xelayî usane –
Meriv pê pincara çolê didebire.
Mirin usane –
Wexta meriv kal dibe, pîr dibe, yanê jî cahile, bê sehete,
Dimire, diçe xwera disitire.

Huba dila usane –
Notlanî fîncanekê meriv bide destê du, sê xorta,
Sê, çar qîzê Cizîra Bota berra derbazke,
Xort xwe şaşkin, fîncan destê wan bikeve,
Bikî, nekî necebire...

*Ji sitiranên Reşîtê Basô*

## HA GULA WEME

Ha Gula weme, ha gula weme,
Ser berbanga Xas baxçe me.
Ez berkujê têra weme,
Min nekujin, ez guneme.

Ha Gula Aşa, ca Gula Aşa,
Sûretê sor dane ber qaşa,
Gul nêçîra Memûd paşa,
Hey Gula Aşa, wey Gula Aşa.

Ha Gula hindî, ca Gula hindî,
Sûret sorê ta xwe rindî,
Pevketine lawikê cindî,
Hey Gula hindî, wey Gula hindî.

*Got: Gula Ozman*

## HAY DIL

Hay dil, hay dil, dilo yar,
Hay dil, hay dil, emiro jar,
Hay dil, hay dil, erdo sar.

Dil ji dila nabît,
Şah û xundkar rabît,
Şahîr bê yar nabît.
Herçî yarek pîre,
Hespê wan bergîre,
Biheşta wan qîre.
Herçî yar ciwane,
Hespê wan kîsane,
Biheşt behra wane.

## HAYLO DILO

Haylo dilo, bira xwelî te be,
Tu maşoqa tû dila nebe,
Maşoqî dilekî usabe,
Bira kara te hebe, zirara te tunebe.

Heylo li min, heylo li min, heylo li min,
Dora hewşa mala meda dor karçîne,
Kesek weda xêr tunîne,
Rabe sêrî daweşîne,
Herçê orta du dila, çar çeva xeberde,
Bira xêrê nevsa canê xwe nebîne.

Heylo li min, heylo li min, heylo li min,
Çevê min herro, herro bejina teye,
Ez çawa bikim, wekî kotîyê mêra –mêrê teye,
O nizanî, wekî derdê min ji derdê te zêdeye...

*Got:Egît Eloyan, ji gundê Elegezê*

## HARÎ DELAL

Harî delal, tase sipî ave zelal,
Ezê dêrsa mala bavê teda bixum,
Tu bêj şîrin şerbet, helal û zelal...

Were narî, narî wezê kum kolozê
Gedê lawikê xwe dinhêrim bi romanî.

Êlê dînê, şev bû, nîveka bû şevê bû,
Minê dî ber serê min marûmê xwedê
Bû teqîne, reqîne, bû gimîne ha xişîne...
Minê dî zerîke ser minra sekinî,
Go, rabe, malxirabo, kalbûnê xwe li te kar kir,
Cahilbûnê mala xwe cem te bar kir,
Qîzap û bûka dilê xwe te sar kir...

Were narî, narî wezê kum kolozê
Gedê lawikê xwe dinhêrim bi romanî.

Êlê dînê, ava lîzê têye li lîzê pêlê, avîte ser pêlê,
Pêlê ortê avîte ser kevirê bilqîzê,

Xwezila minê wî evdîda –hatî mala xezûra wî gundava,
Pişta wîye wêrane germve,
Malê dinê zorî zefbe, kubixekî peshanî syarbe,
Potê denekî mala xezûrê xwedave,
Pişta xwe bide pişta xasîyê, kêleka xwe bide kêleka baltûzê,
Destê xwe têke nava çivtê zer memikê qîzê...

Were narî, narî wezê kum kolozê
Gedê lawikê xwe dinhêrim bi romanî.

## HA NÎNA

Ha Nîna, Nîna, Nîna,
Gidî qîzê Nîçîya,
Sîng sipî, berfê çîya,
Ramûsim nava cîyan,
Di tengda rabû pîyan,
Morî ji koşê rijyan.

Lê keçê, ser bi pere,
Ji govendê derkev were,
Ji tera bêjim xebere.
Keçik, ezim, ezim,
Rîşikê çengilbazim,
Têcirê bûkan ezim.

Jina bî li min tubebî,
Derdê min qîz û bûke.
Çem û berçem diçome,
Benîştê xwe dicome,
Leqê dostê dibûme.
Dost dikenya, şabûm,
Rûniştim, ez mijûl bûm,
Hîvê me bû dasûke,
Derdê min qîz û bûke.

Min dî holê gamêşan,
Te dî holê gamêşan,
Girto, milê min kişand,
Nava dilkê min hêşand.

Min dî holê devanda,
Te dî holê devanda,
Girto milê min ba da,
Nava dilkê min janda..

*Got: Sasûn Harûtyûnyan, 70 salî,*
*ji Sasûnê, ji gundê Nîçê.*

## HAT KARVANE

Hat karvane, karvane,
De lê, lê, lê, lê Çîlê can.
Êwirî dor malane,
Zelfek şûşe, tor mircan.
Hat karvanê Gergerê,
De lê, lê, lê, lê Çîlê can,
Êwirî dor bêderê,
Zelfek şûşe, tor mircan.
Hat karvanê pîvaza,
De lê, lê, lê, lê Çîlê can,
Êwirî dorî saza,
Zelfek şûşe, tor mircan.
Hat karvanê zeveşa,
De lê, lê, lê, lê, Çîlê can,
Êwirî şovereşa,
Zilfek şûşe, tor mircan.

*Got: Sasûn Harûtyûnyan,*

## HAT MAŞÎNA NÎVROYE

Hat maşîna nîvroye,
Têlo ho- ho, Têlo ho-ho, Şêko can,
Hat maşîna nîvroye,
Şêko hê-hê, Gulo hê-hê, yaro can.

Gede lawikê min têdane,
Têlo ho- ho, Têlo ho-ho, Şêko can,
Gede lawikê min têdane,
Şêko hê-hê, Gulo hê-hê yaro can.

Anî birincê nîşanyê,
Têlo ho- ho, Têlo ho-ho, Şêko can,
Anî birincê nîşanîyê,
Şêko hê-hê, bedew yaro can.

Qismeta xadê daye,
Têlo ho- ho, Têlo ho-ho, Şêko can,
Qismeta xadê daye,
Gulê hê-hê bedew yaro can.

*Got: Egîtê Hemîd, ji gundê Pampê*

## HA HÛN WERIN

Ha hûn werin, malî werin, gundî werin,
Xelqê Hêşatê îro qewî giryê me tê,
Qewî îro me tê girî,
Sosin ji mêrga xeyîdî,
Heyfa min tê dev û diranê şekirî,
Nagirin tas-badînê şerbetê.
Lêvêd narê di nûr şekir,
Jê kêm bûne durr û xeber,
Ax, sed heyf kul, kovan, keser,
Jê kêm bûne durr û xeber.

## HEVALÊ

Hevalê, hevalê, hevalê,
Hevalê, hevalê, hevalê,
Serok bi desmalê,
Megirî dayka xalê.
Hevalê hoşîye,
Serok bi posîye,
Megirî da borîye.
Min hevalek xastî,
Nîşana wê li destî,
Sibheb xatir xastî.
Min hevalek anî,
Nîşanek lê danî,
Sibe li ser çavanî.

## HEY BARÎ

Hey barî, baran barî,
Barana ser havîna,
Dawdişîne belgê sêva,
Xew xweş bûne paşilê yara.
Hey barî, baran barî,
Barana ser payîza,
Dawdişîne belgê gûza,
Xew xweş bûne paşilê qîza.
Hey barî, baran barî,
Barana ser bahara,
Dawdişîne belgê dara,
Xew xweş bûne paşilê yara.

*Got: Gogêyê Ûsiv, ji gundê Şamîranê,*
*li nehya Aştarakê.*

## HEY GOZELÊ

Hey Gozelê, Gozelê,
Xanim, canim Gozelê,
Bilindê, sûra kelê,
Xanim, canim Gozelê.

Bejin bilindê mexmer lê,
Gozê bêrîya me hane,
Xira-xira ribane.

Goz babatê lawane,
Xanim, canim Gozelê.
Goz bêrîya bizinan,
Xire-xira bazinan.

Goz babatê mezinan,
Goz bêrîya tiştîran,
Xire-xira zincîran,
Goz babatê wezîran.

*Got: Cangîrê Xudo, dersdarê gundê Qibixtepe,*
*li nehya Talînê*

## HEY GULÊ

Hey Gulê, Gulê, Gulê,
Devşîrina min Gulê,
Bejin bilindê şêlomilê,
Me silava erdê tu lê.
Gul min dî nav bajanan,
Dost min dî nav bajanan,
Zeran bike nav mircanan,
Welleh babo, gul cîwanan.
Gul min dîbû nav Tûtinê,
Dost min dîbû nav Tûtinê,
Çend xeberan min gotinê,
Seb hêceta rû kestinê.
Gul min dîbû li Serayê,
Dost min dîbû li Serayê.

*Got: Kamilê Xelîl ji Tbîlîsîyê*

## HEYDARO, LO

Heydaro, lo lao, wira rûnenî eve erde,
Were rûnî heremê odê herî jorîn,
Ser milê dayka xura,
Dûyê papîrosê qulap bi qulap berde.
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,lo...

Heydaro, lo lao,
Dilê dayka te cî-miskenê derdan, kula,
Bahare, malê me danîne zozanek zozanê Barîbegê,
Li ber çemê van adema,
Heyfa min nayê kuştina bavê Mehmed,
Heyfa min tê wê heyfê,
Bavê Mehmed rokê mala xweda nema.
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,lo...

Heydaro, lo lao,
Dilê dayka te sêla hesinî,
Berfekê li warê Hesenkêşê sipîkir,
Kulî li ser kulyê wê sekinî,

Dilê dayka te ne kerî-sûryane.
Ne refêd hespane, ne koza berxane,
Ne bêrya mîyane, ne xorca zêrane,
Warê hesenkêşê bê yar mane.
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,lo...

*Got: Cangîrê Xudo, ji gundêQibixtepe*

## HEY BAŞKALANÊ

Hey Başkalanê, lo mîro,
Wê li serê girî,
Tebûra Romê, lo mîro,
Wê têt ewirî,
Nûrî beg girtin, sirgûn birî.
Hey Başkalanê, lo mîro,
Ji serê dolê, lo wezîro,
Hespê mîrê min di hespê kolê,
Nûrî ber girtin, birine Sitembolê.
Kelha mîrê min tehtekçîne,
Hespê mîrê min çi Mêdek şîne,
Neçe nav Romê, Rom xayîne.
Başkalan berê zere,
Heft paşa hate sere,
Ezdanşîr sereskere.
Hey Başkalanî, lo mîro,
Wê li ser girî, lo wezîro.

## HEY KEPÇAN

Hey kepçan çêkin vê payîzê,
Alaşa kepçê belçimê gûzê,
Zozan xweş bûne wey pexla qîzê.
Hey kepçan çêkin vê biharê,
Alaşa kepçê belçimê darê,
Zozan xweş bûne paxla yarê.
Hey kepçan çêkin vê havînê,
Alaşa kepçê belgê karçînê,
Zozan xweş bûne hilo da biçînê.

## HEY LA LÊ WAYÊ

Hey la lê wayê, hey la lê wayê,
Elîfê go Fatimê – rebenê, de tu rabe,
Şerekê me daketîye gera şêx Memûd,
Hewale Xelîlokê, li zozana,
Kuştine Mamî Ozmîn, Mamî Bişar
Ahmedê Îsê, bavê gurî, ne wele
Serekê nijdîwara.

Hey la lê wayê, hey la lê wayê,
Elîfê go Fatimê – rebenê, de tu rabe,
Vê sibê van şerkirya şerê xwe bi dor kir,
Mîretê eynelya û bêrdengya zef bûn,
Li maûzer hûnana zor kir
Kuştine Mamî Ozmîn, Mamî Bişar
Ahmedê Îsê, bavê gurî,
Ûrt –ocaxê dîwanê.

Hey la lê wayê, hey la lê wayê,
Şerekê me daketiye gera şêxe.
Memûd, newala Xelîlokê bi newale,
Ahmedê Îsê go – bi qirar be,
Pey kuştina bavê gurîra,
Ezê şerekî daynim fenerî
Şerê Rostemî Zale.

## HEY LEYLÊ

Hey Leylê, Leylê, Leylê,
Werine govenda Leylê,
Te çevan kilê Seyrê.

Hey Leyla min damayî,
Werine govenda Leylê
Çevê belek kildayî.

Hey Leyla min biçûke,
Werine govenda Leylê,
Par keç bû, îsal bûke.

Hey Leyla min mezine,
Werine govenda Leylê,
Par keç bû, îsal jine.

Hey rêye, rêye, rêye,
Çi bejnek zirav lêye,
Mîna bejina Gulêye.

Der mala me genime,
Pişt mala me genime,
Siwaran hurme, hurme.

Der mala me garise,
Pişt mala me garise,
Siwaran hise, hise.

*Got: Manûk Harûtyûnyan*

## HEY LÊ

Hey lê, hey lê, lê qemerê,
Sê şeva ketime berê,
Xwezila şeva sivderê.
Keçikê ji te Mîrekê,
Kember kete kêlekê,
Radimûsim komê yekê.

Hey lê, lê, qemerê,
Keçika ji Korbilaxê,
Av anî li mêrga axê,
Sekinî bû ber qelaxê,
Radimûsim te qazaxê.

Hey lê, lê qemerê,
Keçikê ji Qundaxsazê,
Bejin ziravê, gerdenqazê,
Radimûsim te qazaxê.

Hey lê, lê qemerê,
Keçikê ji Cercerîsê,
Bejin ziravê, gerden sîsê,
Radimûsim ya Tiflîsê.

Hey lê, lê qemerê,
Sibeye, sibe nabe,
Dengê dîka qubeye,
Xewka şîrin têr nabe.

Tevê daye qirqişand,
Zêra anîyê neqişand.
Sibeye tev zeriqand,
Zêra anîyê biriqand.

Hey lê, lê qemerê,
Êvare agir geşe,
Zerî hemama dimeşe,
Êvare agir dûye,
Zer hemama diçûya.

*Got: Şekêyê Dewrêş, ji dîya xwe bûye sala1913-a, ji gundê Mîrekê,*

## HEY LÊ ÇÎYAYÊ ŞENGALÊ

Hey lê çîyayê Şengalê, li binê Berbergaye, ax, ax,
Hey were xezalê, wey oy, oy, oy, oy, lê.
Ax min go, çîyayê li xopanê wê li binê Berbergaye.
Xezalê, lê delalê, hey la min go, ay, ay, ay...
Eskerê Hesen paşa hatî digere rom û tûrkya ax, ax...
Hey were xezalê, wey, wey...
Ax lê Hesen paşa bextê teme, xwedê te,
Xezala min berda, navbeyna ava kûrke.
Were Xezalê, were delalê,
De rabe hogra mn delalê,
De rabe hogira min hevalê,
Wey, wey, wax...
Heylê were, ezîza dilê xalê,
Şekirê nav desmalê,
Paşî xamcû xezalê, ku heramyem,
Tewîkê Misranê, şîrê qapilme kalan
Mitalê rojxanê...
Na welle bavo, rûnê çîyayê Şengalê,
Xezalê, delalê, hey delalê.

*Got: Casimê Şemo, ji gundê Çobangelmesê, s1972*

## HEY LO, LO

- Hey lo, lo lawiko,
Serê min qurbana canê te bîyo,
Were, wezê salix, sûlixê zerîyê mala Qoto tera bidim.
- Êlê, zerîyê, nav-nîşanê zerîyê mala Qoto çine, çi nîne?
- Olo lawiko, qurban,
Zerîyê mala Qoto di usanin:
Navkêlkê wane ziravîne,
Bejina wane qazanxîne,
Lingê wane kondelê sore firengîne,
Gorê wane ecemîne,
Dev, lêvê wane mijmijkîne,
Sûretê wana sore kal-kalîne,
Diranê wane sedefîne
Çevê wane reşe leglegîne,
Biruyê wane reşe qeytanîne,
Porê serê wane sore hinarîne.
Meriv malê xwe bide, canê xwe bide
Yeke usa xwera bîne,
Tucar, tucar poşman nîne...

## HEY LO, LO, LI MIN

Hey lo, lo li min, hey zalim,
Hey lo, lo li min, hey zalim,
Te tirê ezî kalim,
Hey lo, lo li min, hey zalim,
Ez xortê çarde salim.
Hey lo, lo li min, hey zalim,
Sal bi sal emirê xwe dizanim.
Hey lo, lo li min, hey zalim,
Derîngo, der piçûko,
Heylo, lo li min, hey zalim,
Lê derket qelfe bûko.
Hey lo, lo li min, hey zalim,
Derîngo, der mezino,
Lê derket qelfe jino.

*Got: Hemoyê Ûsiv*

## HEYLO, LO, HEYLO

- Şivano, ha şivano, te wê niga zole çermê gano,
Piştê kode hevano,
Tu şivanekî çar perano,
Heqê devê bavê te nîne min bixwezî rênga keryano, ha keryano,
Heylo, lo, heylo.

- Heylo, lo, heylo, heylo,
Lê keçikê ezê ne şivanê çar perame,
Ezê Hesongê bîme, xudanê şûrê şê eva Sulîbîme,
Sivekê zû ser pira Batmanê sekinîme,
Serekê donzdeh şivaname,
Delaliyê êla 1700 malê kîkane milîme,
Hey lê, lê, heylê...

- Heylo, lo heylo, şivano, ha şivano,
Wekî tu divêjî ezê Hesome, Hesongê Sulîbîme,
Ezê Xecême, Xeca Zerînim, xûşka mêlîkê Erfayême.
Sivekê zû serê berbanga sibêda ser pira Batmanê tevî kulîyê Mûşêva
sekinîme.
Heylo, lo, lo, şivano.

- Heylê, lê keçikê, agirê kulê beyt ocaxa mala bavê ketê,
Ezê Hesome, Hesongê Sulîbîme,
Wekî 1700 mêrê mala bavê teye lêxistine.
Hevin, dîsa ezê zora şûrê xwe te ramûsim.
Hey lê, lê, lê, lê.

- Heylo, lo şivano,
Agirê kulê beyt ocaxa mala bavê keto,
Evî gilî te neçêkir,
Teyê anî çîyayê Wanê ser mala bavê minda gêrkir,
Çiqas paxilê mala bavê te hebû teyê anî temam beramberî zêrkir.
Heylo, lo, şivano.

- Heylê, lê,lê keçikê,
Agirê kulê beyt ocaxa mala bavê ketê,
De were, paya nedê, çiqa zêrê mala bavê te hevin –
Beramberî kose misrîyê min dernayê,
Hey lê, lê, heylê lê...

*Ji stranên Mecîtê Xalit*

## HEYLO MÎRO

Evdila begê go: - Omer Çerkez, ev çi defe, çi zirneye?
Omer Çerkez go: - Evdila bego, ew dewata kalebavê min û pîradayka teye.
Evdila begê go: -Omer Çerkez, ew xeber devê tey hevtê govek bavê te zêdeye.

Heylo Mîro, weylo Mîro, mal derketiye bê tivdîro,
Şaşxane cêva qapûtê Mîrê minda nayê bîro.

Heylo Mîro, Evdila begê min sekinye dev serayê,
Mîrata şeşxanê cêvêda bîrê nayê,
Xadê xiravke qayîşe tenge ûsûle girane,
Milê mîrê min, wayê, kêf hilnayê.

Heylo Mîro, weylo Mîro, mal derketiye bê tivdîro,
Şaşxane cêva qapûtê Mîrê minda nayê bîro.

Heylo mîro, qema kafrê Omer Çerkez zêrrê zere,
De wê çiqas zere, awqas bere,
Kafirê Omer Çerkez qemeke serê Evdila begê min daye,
Çartilîke temorî daxistiye ser kevere.

Heylo Mîro, weylo Mîro, mal derketiye bê tivdîro,
Şaşxane cêva qapûtê Mîrê minda nayê bîro.
Heylo Mîro, cêva Evdila begê min cêva zêra,
Kafirê Omer Çerkez ber qelşê sekinîye,
Evdila begê minra dide çêra.
Evdile begê min dikire gazî, digo:- Tahar xan, birao,
Silêman bego, birano weyê goştê heram ruhê şîrin hêwişandîye kîjan rojêra...

Heylo Mîro, weylo Mîro, mal derketiye bê tivdîro,
Şaşxane cêva qapûtê Mîrê minda nayê bîro.

Heylo Mîro, kela Toplaqelê ser kanîyê,
Kondela Evdila begê min girane, ketiye bin penîyê,
Evdila begê min destê çepê şûr dikşîne,
Destê rastê temiz dike xûna sore li ber enîyê.

Heylo Mîro, weylo Mîro, mal derketiye bê tivdîro,
Şaşxane cêva qapûtê Mîrê minda nayê bîro.

Heylo Mîro, vạn çerkeza xa dane palê xanya,

Cinyaz cotbecot kişandine alîyê male,
Kese tune cawê bive kona jorin, mala xale.

Heylo Mîro, weylo Mîro, mal derketiye bê tivdîro,
Şaşxane cêva qapûtê Mîrê minda nayê bîro.

Heylo Mîro, kela Toplaqelê ha dibûrî,
Çerkez civyan notila xalî mûrî,
De wexta Evdila begêm dibû tengî,
Bira pêra derketa Memûd begê syarê gulî.

Heylo Mîro, weylo Mîro, mal derketiye bê tivdîro,
Şaşxane cêva qapûtê Mîrê minda nayê bîro.

Heylo Mîro, kela Toplaqelê warê paşa,
Bejina Evdila begê min bejina çux-çerkeza şer-qumaşa,
Divê Evdila begê min hatiye kuştin,
Bira dewsê xweşbe Şikrîn paşa.

Heylo Mîro, weylo Mîro, mal derketiye bê tivdîro,
Şaşxane cêva qapûtê Mîrê minda nayê bîro.

*Got: Gogêyê Ûsiv*

## HEYLO, HEYLO

Heylo, heylo, heylo,
Lê dayê, ezê vê sibê deşta Sincê ketim devê çayê,
Kekê Helîmê danzde bavê eşîraye,
Berev kirye eskerê zorî zefe,
Erdî tenge tê hilnayê...

Fato digote Senemê,
"Êlê dayê, were emê herine cem kekê Helîmê,
Dîleka vê recayê".

Kekê Helîmê digo:
Êlê dayê, wekê weyê hatîye dîlekekê kirye ji mine,
Ezê danzde bavê eşîrîyê
Hevira nakime dijmine,
Emirê bavê we par vî çaxî
Yeke neçê kirye,
Qîzeke me revandye
Berrojê kavira ji me stendîye.

Êlê dayê, wele nave, bile nave,
Minê sondekê xarye –
Emirê kekê we tucar-tucar ber derê çadira we peya nave.

Heylê wayê, heylê wayê,
Emirê kekê me ne mêrekî qolayîye,
Kekê Helîmêra nayê rayê.

Heylo, heylo, heylo, heylo,
Wele nave, bile nave,
Minê pirsekê gotîye,
Tucar, tucar ducar nave...

*Got: Cangîrê Xudo, ji gundê Qibixtepe*

## HEY PIRA ŞAXÊ

Hey pira şaxê vêt û depîne,
Ser serra borîn qaz û qumrîne,
Kuştin Evdokê Gohar zêrîne.

Hey Hasmîn xanê, hey xanê,
Tu were ser banê,
Destek ser singe,
Ya din kitanê,
Birîna Şekir axa,
Derba şeşxanê.

Hey Hasmîn xanê,
Tu were li kulekê,
Destek ser singe,
Ya din kêlekê,
Birîna Şekir axa
Derba tivekê.

Ezo li pencerê,
Destek li pencerê,
Destek ser singe,
Ya din kemberê.

Birîna Şekir axa
Derba xencerê.

Ezo li çeman,
Hay Jêlik têyo,
Dostok li çeman,
Du tul û tajî.

Pey meva têyo,
Zerîyoka zomê-
Ez divêm têyo.

Ezo li çeman,
Hay Jêlo hato
Dostok li çeman,
Hay Jêlo hato.

Du tul û tajî
Pê meva têyo,
Zerîyoka zomê
Ez divêm têyo.

*Got. Manûk Harûtyûnyan*

## HEYLO ŞÊNÎ

Heylo Şênî, heylo Şênî,
Dara heşa mala meda dar karçîne,
Kesekê xwedê xêr tunîne,
Rabe serî daweşîne,
Herçê orta du dila, çar çeva xeberde,
Bira xêrê nefsa canê xwe nevîne.
Heylo Şênî, heylo Şênî,
Siveye, dilê minra sive nave,
Tube serê min evdalê xwedê rave,
Serê bav û bira bilinde-
Tucara alçax nave,
Edetê mala meda tucara rev, bez nave.

Heylo Şênî, heylo Şênî,
Tu li ber dêrî, ez ser xênî,
Çev biryê belek kê dişkênî,
Kê ditirsî, kê newêrî?
Qasekê were mala bavê min mêvanî,
Sîng û berê min tera bive sênî.

## HEYRO, HEYRANO

Heyro, heyrano,,
Çevreş mêvano.
Çûme Sitembol,
Anî pere bol.
Da cotek sol,
Ewê yara min pêkir,
Ket çil û çîya.
Çevreş mêvano,
Heyro, heyrano.

*Got: Gula Ozman*

## HEKARÎ MÊREK ÇÊNE

Hekarî mêrek çêne,
Berwarî mêrek çêne,
Çaxmaxê wan li pêne.
Xizmetkarê pesnêne,
Hekarî mêrek çêne,
Berwarî mêrek çêne.

Hekarî eba belek,
Berwarî eba belek,
Çerix-çerxin lê çelek,
Şerkarin, deng çû felek.
Hekarî mêrek xasin,
Çexmaxê wan resasin,
Nava şêrda reqasin.

*Got. Manûk Harûtyûnyan*

## HER BÊRÎYÊ

Ser bêrîyê bûye bi mije,
Her bêrî, bêrîvanê,
Ser bêrîyê bûye bi mije,
Her bêrî, bêrîvanê.
Şêrê sor bû mêrkuje,

Her bêrî, bêrîvanê,
Şêrê sor bû mêrkuje,
Her bêrî, bêrîvanê.
Berê bêrîyê hevraze,
Her bêrî, bêrîvanê,
Berê bêrîyê hevraze,
Her bêrî, bêrîvanê.

Mexelê pezî meze,
Her bêrî, bêrîvanê,
Mexelê pezî meze,
Her bêrî, bêrîvanê,
Berê bêrîyê berjêre,
Her bêrî, bêrîvanê,
Berê bêrîyê berjêre,
Her bêrî, bêrîvanê.

Mexelê pezî nêre,
Hey bêrî, bêrîvanê,
Mexelê pezî nêre,
Hey bêrî, bêrîvanê.
Berê bêrîyê berware,
Her bêrî, bêrîvanê,
Berê bêrîyê berware,
Her bêrî, bêrîvanê.

Mexelê pezî jare,
Her bêrî, bêrîvanê,
Mexelê pezî jare,
Her bêrî, bêrîvanê.

## HER BÊŞE

Her bêşe, başe û bêşe,
Kuro, bêşa dinyayê.
Bişkir xercê Şewêşe,
Malxwe malê Dewrêşe.
Kevanîyê qelenkêşe,
Lo kuro, bêşa min nayê.

*Got: Werda Şemo*

## HER ZERÎ

Her zerî, zerî, zerî, zerî kuro,
Her zerî, zerî, zerî, zerî gede.
Sekinîm ez ber dêrî,
Dest avîte şera sêrî.
Şera sêrî netu şere,
Jina bî netu yare.

Her zerî, zerî, zerî, zerî kuro,
Her zerî, zerî, zerî, zerî gede.

Me li rûbarê deştê,
Dengê defê ça xweş tê.
Me li rûbarê Kênara,
Dest avîte guhara,
Xirmîn kete zinara.
Me li rûbarê Kênara,
Nazo nadime xudana.

Her zerî, zerî, zerî, kuro,
Notila canûya nîvzîne,
Notila şekir şîrine,
Her zerî, zerî, zerî gede.

Her zerî, zerî, zerî, zerî kuro,
Her zerî, zerî, zerî, zerî gede.

## HER KAVIR

Her kavirê, hir kavirê min,
Mal û gundî cînarê min,
Serê malê yek da min.
Wezep bûm, bidim bi jin,
Gohbelo li min bû dijmin.
Kavir çêrya li girika,
Berxik çerya li girika,
Kavirê kurî bezî,
Ez ji xwera mam rût, tezî.

## HER HER

Her, her, her heylo welato!
Derdê min Eyşa Fato.

Her, her, her weylo welato!
Derd û kula ez dinelim,
Ez koçerim, xerabmalim.

Heylo, heylo, hey weleto.
Li welatê dara bîyê,
Ev keçik çû şayê,
Kula dilê min zerîyê.

Her, her, her heylo welato.
Keçik çûye digere,
Bavê wê pêra şerre,
Keçik li gundê me vedigere,
Heylo, heylo, hey welato.

*Got: Kamilê Xelîl*

## HER ÇAR MALÊ NEWALÊ

Her çar malê newalê,
Her pênc malê newalê,
Tejî berdan xezalê,
Yar şîrine ji xûşkê,
Taynim, naynim nan oldim,
Qiz geldim, arvad oldim,
Qende şekir îçmenem
Fariz dîlî bilmenem,
Tirkî dîlî oxirim,
Hevalno, hogiro, cînarno,
Qîzino, bûkino, xortno,
Dengê min nayê,
Du pa sur û sermayê,
Çar pa toza vê kayê,
Hevalno, dora weye.

Min îro bejinek dîbû,
Vê bejinê çuxek lêbû,

Vî çuxî cêvek lêbû,
Vê cêvê sêvek lêbû,
Vê sêvê gezek lêbû,
Vê gezê morek lêbû,
Ew mor, mora xudê bû.

Taynim, naynim nan oldim,
Qiz geldim, arvad oldim,
Qende şekir îçmenem
Fariz dîlî bilmenem,
Tirkî dîlî oxirim,
Hevalno, hogiro, cînarno,
Qîzino, bûkino, xortno,
Dengê min nayê,
Du pa sur û sermayê,
Çar pa toza vê kayê,
Hevalno, dora weye.

*Got: Hemoyê Ûsiv*

## HER WEBÎ

Her webî, webî, webî,
Dezmala çar goşe bî,
Goşe ji goşê zêde bî,
Herçê nevê bimbarek –
Serda hilşe dîwarek,
Pêvede kar û merek.
Îşev şeva dewatê,
Dewata Silê Elî,
Herçê nebê bimbarek-
Serda hilşe dîwarek,
Pêvede tîremerek.

Her webî, webî, webî,
Ha îşev, îşev, îşev,
Li me bangda dîkê nîşev.
Cindîno, werine dewatê,
Horîno, werine dewatê.

## HER WEYLO

Her weylo, weylo, weylo,
Sîyar der malê westyane.
Her weylo, weylo, weylo,
Çêdikin hena destane.
Her weylo, weylo, weylo,
Sêfîlo, dilo, melûlo.
Her weylo, weylo, weylo,
Îro çile, çil û çare.
Her weylo, weylo, weylo,
Sibê roja deznîgare.

## HERÊ BELAYÊ

Herê Belayê, herê Belayê,
Herê Belayê, herê Belayê,
Daxim kovan vê bedewê.

Bû ref, refê van û çûkan,
Firdan çone serê sûkan,
Daxim kovan van nû bûkan.
Bû ref, refê van û qazan,
Firdan çone serê sazan,
Daxim kovan gul beyazan.
Bû ref, refê van ordekan,
Firdan çone ser şebekan,
Daxim kovan çev belekan.

## HERÊ DINYAYÊ

Herê dinyayê, herê dinyayê...
Xwezila nehata bayê gure,
Kes nizane çerxa felekê
Îndada rebil alemê çawa dizvire,
Berê vê biharê xelqê undakirye teke û tûke,
Me unda kirye gula eşîretê,
Mezinê êlê, bav û kure.

Herê dinyayê, herê dinyayê...
Çaxirbega şewitî li wî berî,
Xwezila min bizanbiya-
Çima hinde bi kulî, bi derdî, bi keserî,
Eva nava çar salane,
Bavê Morof begê serê xwe daye
Ber serê çar hezar hefsid malê heyderî.

Herê dinyayê, herê dinyayê..
Dîwanê bavê Morof xweş dîwane,
Gire-girê torina şevîya tev civyane,
Paşî bavê Morof xwera-xwera rabûne,
Divê: - Em axane...
Herê dinyayê, herê dinyayê...

## HERÊ GEZÊ

Herê Gezê, belê Gezê,
Sûret sorê, rû Gevezê,
Divê xwezgînî çûne mala bavê kawa kubar.
Ez evdalê xwedê gere kaw-kubara xwe birevînim,
Ber bextê dadavorê vê Rewanê, na wele vê kaxezê.
Keçikê dînê, kirre, li min kirre,
Ava qeredengizê xopan wê tê gire-gire.
Divê hevsî Hemo par van çaxa
Daxa dilê min evdala di xwedê bû
Îsal kotîyê mêrra bye dayka ziki kure.

Geze, li min geze,
Ava qeredengizê xopan tê wê dibeze.
Hevsî Hemo par vî çaxî delalê dilê min bû,
Îsal pêra bye ber malya mala teze.

*Sê kilamên jorgotî mera Têmûrê Teyo*
*ji gundê Heko, xwendkarê xwendinxana kurdîye*
*dersdarhazirkirine, sala 1957-a gotine.*

## HERÊ LÊ

Herê lê, delalîka dilê min,
Delalîka dilê bavê û bira vê sibê,
Sekinye ser penîya kondela Dîyarbekirî,
Dirêse teşya Mûşînî, dike nazik-nazê giran.

Xwedê merîyara yarbe, dinê bira merîyara neyarbe,
Kubara sivêda meriv nigê xwe têke rikêfa hespêda,
Dest bavê qolanê kemberê tivinga sitîyê mêra,
Modêla romêva, cenîyê bavê ber qefesê,
Welgerîne ser zozanek-zozanê van cebira.

Delalîka dilê min, delîka dilê,
Van pîrika vê sibê sekinîye ser
Penîya kondela Dîyarbekirî, dirêse teşîya mûşînî,
Dike naze-nazê van canika,
Xwedê merîyara yarbe, dinê bira merîyara neyarbe.
Kubara sivêda nigê xwe têke rikêfa hespêda,
Dest bavê qolanê kimberê, cenîyê bavê ber qefesê,
Welgerîne ser zozanek van xalika.

*Got: Egîtê Abas*

## HERÎ DELAL

Herî delal, tase sipî ave zelal,
Ezê dêrsa mala bavê teda buxum,
Tu bêj şîrin şerbet, helal û zelal,
Were narî, narî,
Wezê kum kolozê gede lawikê xwe dinhêrim bi romanî.

Êlê dîmê, şev bû, nîveka bû şevê bû,
Minê dî ber serê min marûmê xwedê bû teqîne, reqîne,
Bû gimîne, ha xişîne,
Minê dî zerîkê ser minra sekinî, go: -Rabe malxirabo,
Kalbûnê xwe li te kar kir,
Cahilbûnê mala xwe cem te barkir,
Qîzap û bûka dilê xwe te sarkir,
Were narî, narî,
Kum kolozê gede lawikê xwe dinhêrim bi romanî.

## HERINE GOVENDÊ

Herine govendê, govendê,
Govend gerya ha di eywanê,
Ketime destê ha bi Seyranê,
Herine govendê, govendê.

Govend gerya ha li sûkêye,
Ketime destê ha li bûkêye,
Ha bi govendê, govendê,
Herine govendê, govendê.

Ha bi govendê, govendê,
Tilya min çevê dêrra,
Mêr dît keçik pêra,
Herine govendê, govendê.

Herine govendê, govendê,
Îşev şeve, şev şilîye,
Sivder bûye xanîye,
Werine govendê, ha bi govendê.

*Got: Egîtê Abas*

## HESENÎKO QURBA

Hesenîko qurba, ji Mûradê heta vira xûna sor hilşyaye dora rya,
Herin bêjin dê û xûşkê van birindara,
Bira porr û gulîyê xwe kurr kin, bên
Xûna gevez temiz kin dora rya.
Min go, heçî Hesenîkê min derbazî vîalîke,
Ez kefîlê heqê wanim,
Bira xêrê ji canê xwe nevîne Emer axa,
Ez negirtim, neda Hesenîkê kurap çaxê minra,
Ez girtim dame kalê ji kala,
Xudanê şeş jina, sala hevta hê dora min zerîyêye.
Ezê nifirekê bikim: min gazî xwedê kirye,
Ji kerîyê pezê Emer axa bimîne kavireke,
Ji garana dêwêr bimîne tek taneke,
Ji hespa- tek cenîke,
Ji komî kulfetê malê bimîne tek tifalek...

Bayê sibê bive bîne,
Bayê êvarê bihejîne,
Herçê serê çîya bimêjîne,
Gurê serê çîya hilde bibe,
Xêrê wayê ji canê xwe nebîne Emer axa.

*Got: Casimê Şemo*

## HESIKO WÊLÎ

Hesiko wêlî, hey wêlî, hey wêlî,
Şîşxanê hilde, dakeve gêlî.

Zozan ber zozan, zozanêd mene,
Darî ber kola pêva xurmene.
Wêda welgere, warkozê mene,
Vî alî vegere – pez, dewarê mene.
Hesik zevaye, Besik berdêlî,
Şîşxanê hilde, keremke gêlî.
Hesik zewicî, Besik berdêlî,
Şîşxanê hilde dakeve gêlî.

Zozan ber zozan, zozanêd mene,
Darî ber kola pêva xurmene.
Wêda welgere, warkozê mene,
Vî alî vegere – pez, dewarê mene.
Zozan, ber zozan, zozanêd mene,
Wêda welgere warkozê mene.

*Got: Gogêyê Ûsiv*

## HESO HEYRANO

- Hey lê, lê, lê, lê Meyayê,
Porsorê, porgevezê, porê serê xwe belayê,
Ezê destê teda ketime qîrê, vê belayê.
Rave ramûsanekê bide mida, nava sîng û berane,
Ezî yolçîme, wê derenge,
Hey lê, lê, lê, lê, lê.

- Hey lo, lo, lo, lo, lo,
Bese bike van viran û vizane,
Ezê bêjim mêr û şenbezê mala bavê xwe-
Wê te têne xurê tejî di tulane.

- Hey lê, lê, lê, lê Meyayê,
Porsorê, porgevezê, lê porê serê xwe belayê,
Ezê Hesome hesê çakim,
Ezê donzde qerda bidim, serê şûrê xu qezakim,
Ezê hezar hevsid mêrê mala bavê te perekekî çirûk hesav nekim.
Ezê danê vê baharê êla mala bavê te ji hev belakim,
Hey lê, lê, lê, lê, lê.

- Hey lo, lo, lo, Heso,
Serê sivê li me zerbû,
Devê koç û kerîyê êla kîka, mila û mirdêsya,
Li ber çemê hevreng li me derbû,
Heyrano, Heso, paxir û pûxirê mala bavê te hatin mala bavê minra berember bûn? Hey lo, lo, lo, lo, lo.

- Hey lê, lê, lê, lê, Meyayê,
Porsorê, porgevezê, lê porê serê xwe belayê,
Raste, serê sibê li me derbû,
Devê koç û keriyê êla kîka, mila û mirdêsya li ber çemê hevreng û li me derbû,
Paxir û pûxirê mala bavê min bi zêrê mala bavê tera sêserbû,
Were cara vê carê ramûsanekê bide mida nava sîng û berane.

- Hey lo, lo, lo, lo,
De here şivan, û di şivano,
Teyê daye serê xweda papaxek liva hevt berxano,
Teyê daye pişta xwe şeşek û du nano,
Teyê daye destê xweda çomaqek polê hevt kerano,
Teyê kirine lingê xweda zolek çermê gano,
De here şivan, û di şivano.
Go: - Hey lê, lê, lê, lê, Meyayê,
Xudanê hezar hevsid malêd zixikîme,
Ezê îsal jî pêra aşiqê bejin û bala teme,
Ezî ne şivanim, ne jî kereşivanekim,
Papaxek ji liva hevt berxane,

Minê nedaye pişta xwe çomaqek nalê hevt kerane,
Minê nekirye li pîyê xwe zola çermê di gane,
Hey lê, lê, lê, Meyayê.

- Hey, lo, lo, lo, heyrano Hiso,
Ezê ramûsanekê bidime teda ji nava sîng û berane,
Tirsa min wê tirsêye tu bêjî heval û hogirê xune.

- Hey lê, lê, lê, Meyayê,
Ezê sond dixum serê şêx xelîfê vê Bexdayê,
Tucar, tucar eva pirsa ji devê min dernayê.

- Hey, lo, heylo, lo, lo, Heso,
Minê pirskirye ji heval û hogirê teye,
Divêjin Hesê Silîvî heye ku çeltikê vira û viza û derewane.

- Hey, lê, lê, lê, Meyayê,
Porsorê, porgevezê, lê porê serê xwe belayê,
Ezê destê teda ketime qîrê, vê qetiranê, vê belayê,
Ezê Hesome, Hesê Silîvîme, ne xudanê viran û vizan û derewame,
Ezê Hesome, Hesê Silîvîme, serkarê hezar hevsid malêd zixikîme,
Êlê, ezê aşiqê bejin û bala teme.

- Hey, lo, lo, lo, Heso,
Îşev şeve, şeve şilîye,
Guhêra qiranê pezê nêr girtye av û herîye,
Tîşke qiranê nêrîye, bajo serê konê bavê min reş erebîye.
Sîng û berê min evdalê tera him orxane, him doşeke.

- Hey, lê, lê, lê, Meyayê,
Raste îşev şeve, şev şilîye,
Ezê qiranê nerîye bajome ser konê bavê teyî reşî erebîye,
Sîng û berê te evdalê mira him orxane, him doşeke.
Xewa orxana û doşekê şîrine,
Sivê Têmirê milî, apê teyê derkeve ser nimêjêye,
Wê misînekî bide orta qafê mida,
Sivê qîz û bûkê êla kîkan û milan
Wê bên pozka sola xwe li sapoka minxin,
Wê bên- ey gidî dinyayê,
Eva Hesoye, Hesê Silîvîye,

Serkarê hezar hevsid malê zixikîye,
Hatîye kuştinê seva kevne jinêye,
Hey, lê, lê, lê, lê...

## HEWAR BAVO

Hewar bavo, heware, hewar dayê, heware.
Eskerê Romê sibêda dor me girtin çarnikale,
Heta Andranîk paşa hewara me neyê,
Wele navê xwedê, tucara kesek pê nikare.
Heware bavo, heware, heware dayê, heware.

Andranîk paşa ji mal derket, berfê dayê,
Ajote Wana şewitî ser qedayê.
Wekî donzde gullê topa lêkevin
Wele-bile ew tucara nayê rayê.
Heware bavo, heware, heware dayê, heware.

Andranîk paşa ji ınal derket, xwe xurcilî,
Qayîşa şûrê hêşîn li kêlekê diçilvilî.
Wekî donzde gullê topa lêxin –
Ewê dîsa şerke, bive xweyê xwe wî dilî.
Heware bavo, heware, heware dayê, heware.

Andranîk paşa ji ınal derket, şûr girêda,
Ajote Wanê, hewarya hêsîrê dest Romêda,
Wekî donzde gullê topa lêxin –
Ewê serê xwe bide dîsa rihînêda.
Heware bavo, heware, heware dayê, heware.

Andranîk paşa ji mal derket, kir qîrîne,
Ajote Wanê, efat-egîte ser tijîne,
Wekî donzde gullê topa lêxin,
Ew dîsa hewarya hêsîrra xwe digihîne.
Heware bavo, heware, heware dayê, heware.

Andranîk paşa ji ınal derket, gula syara,
Ajote Wana şewitî ser neyara,
Wekî donzde gullê topa lêxin,
Ewê dîsa şerke fenî cara.
Heware bavo, heware, heware dayê, heware...

## HEWAR BÊRÎ

Hewar bêrî, bêrî, bêrî,
Hewar bêrîyê van berbanga,
Hewar bêrî, bêrî, bêrî,
Toz xubara ser bijanga.
Hewar bêrî, bêrî, bêrî,
Qîza rûspî pez da bêrî,
Hewar bêrî, bêrî, bêrî,
Bûka rûspî zêra li sêrî.
Hewar bêrî, bêrî, bêrî,
Hewar mêrkê min kum qote,
Hewar bêrî, bêrî, bêrî,
Li ser xanya gote, gote.

## HÊ WAYÊ, HÊ WAYÊ

Hê wayê, hê wayê,
Agirê kulê tu mala Reşongê Xelatêda dayê,
Vê sivê ketîye koçê Al medîna,
Gazî dikin, hewarya me nayê.

Şerekê li me qewimîye mêrga Çeto dara bîyê,
Xadê xirav bike hal û wextê koçerîyê,
Ha bi rezîlîyê.
Vê sivê bar kirine –
Berê xwe dane warê jorin zozanîyê.

Şerekê li me qewimîye
Mêrga Silongê Çeto dara gezê,
Xulama bejin balê, qemê hal qevzê.
Vê sivê hat buhurî çawa gullekê berî bedena çelengî syara dane
Bayê bezê...

## HIRÇEK

Hirçek tête zevîyê,
Heram tête zevîyê,
Sere naçe sevîyê,

Tê biçim pezê berrîyê,
Dîsa hirçe nehê.

Hirçek tête newalan,
Heram tête newalan,
Serî naçite cewalan,
Tê biçim pezê hevalan,
Wele hirçê neheq kir.

Hirçek tête xwe ba kir,
Heram tête xwe ba kir,
Serê memikan xîyal kir,
Mala lawikan xirav kir,
Dîsa hirçê rind nekir.

*Got: Manûk Harûtyûnyan, ji Aştarakê*

## HISRETA MIN

Hisreta min ji mala bavê derket
Mînanî hîva zere,
Ji para dinhêrim cotê gulyane,
Ji pêra anîya kevere,
Cotê zêrrê zer li sere.

Hisreta min bi minra xeber dide şîrin-şîrin,
Mijûl dibe,
Ser milê rastê dinihêre –
Cotî bav û bira miqabile,
Ji çevê reş belek dirije av hêsire,
Ji navê dikişîne ax kesere.
De kanê, Hisreta min kanê,
Çevê reş belek ji kildanê,
Anî kevere ji xiftanê,
Bisk dirêj bûne ji badanê,
Sûret sor bûye ji ramûsanê,
Kofî kêl bûye ji girêdanê,
Memik sist bûye ji tevdanê,
Keçê, kulmalbavê,
Te xortê me kuştîye,
Xûna min kanê?

Hisreta min ji malê bavê derket,
Ji minra xeber nade, nizam çira.
Bejin zirave,
Mînanê hal-halê nav genima,
Memik sipîne mînanê fîncanê dest hakima.

Keçê, kulmalbavê,
Te goştê min helandiye bi waqî, bi derman,
Hestuyê min helandiye kirîye şima.

Bejin ziravî ji darî leylanê,
Mala bavê Hisreta min,
Li havîna li mêrg zozanê Eledaxê.
Payîze, digerya li ser çemê wê Rihanê.

Hisreta min mînanî kareke karî xezalan,
Karê xwe hildaye, maşyaye li zozanê Şerefdînê,
Li ber tûmê vê hewşanê.
Ezî li syarî çeleneyî syar bûm,
Kotî mêrî virşîkî mildirêjî nezan bû,
Berî wê sibê karî xezala ji mal derxistin –
Tejî tûlengê xwe berdanê.

## HOY ŞÊNÎ

Go: -Şênîyê, mala min,
Felekê çima li me wa kir,
Qam, qidûmê me şikênand,
Aqil û sewda ji serê me hilat.

Ezê bi serê çîyakî bilind ketim,
Minê xezalek rakir,
Ewê xezala gerdena sor û zer li bakir,
Xezala min xeyîdî,
Berê xwe da welatê xerîbiyê û xolbetê.
Ez nizanim ji halê qîzaya xwe û xortanya min çawa kir?

Lo, lo Şênyê malê,
Berê xwe da welatê xerîbyê,
Ez nizanim kengê wê bê,
Gustîla min ma li tilyê,

Qitîka eynîk û nînik ma li cêvê,
Ji îro û pêva,
Berê torinê malê ketye
Welatê xerîbyê û xolbetê,
Ez nizanim sebira dilê min wê bi kê bê.

Lo, lo Şênyê malê,
Berê delalê min kete welatê xerîbyê û xolbetê,
Geda derengî bû,
Tevî roma reşe tolingî bû,
Heta delalê min hate malê,
Sê payê emirê min çû,
Fitilek ji porê serê min sipî bû.

## HOPANÊ

Hopanê, hopanê,
Kezîya reşe-penê,
Avête gola hanê.
Gola han qamûşe,
Mera fîşe-fîşe,
Kekê min çawîşe.
Çawîşî biçûke,
Jêra anîn bûke,
Bûke qelendere,
Xaya şera zere,
Şera zer dudakir,
Mûsûl têda xuya kir.

## HUSEYNO

Huseyno, lo lawo, berxê lo lawo, zevayê sê rojayo,
Hêna zevatiyê li destao, roma qelpe xayîn bi xayîntî girto, lo derdao.
Huseyno, lo lawo, bayîn heye baga danê vê biharê,
Bi ser meda têye nale-nala van şehîda, cîye vîla van qazama.

Huseyno, lo lawo, berxê lo lawo, zevangê sê rojano,
Hena zavatîyê li destao, Roma qelpe xayîn bi derdao,
Bûka teze di ber perdêda mao.

Pîrê, lê pîrê,caweke xêrê ji minra hatîye,
Huseynê lawê te çîyayê erdihanê
Temel te bya kavil, bi du gulla birîndare,
Nikare eypelê rokeser eyanê,
Huseyno, lo lawo, berxê lo lawo,
Ezê dersa kavil ketin devê sûkê,
Danê vê biharê bi ser meda têye...

Dengî barî-barîstana, sewta vê tûtûkê,
Xelqê têlî delal ketye derdê
Mosilê du yalikê, ezê porkura xudê
Ketime derdê zevayê sê roja, na wele mêrê bûkê.

## HUSÊYNÊ QECO

Tele bextê min bêbextê, min nemayê,
Koçk keriyê Husêynê Qeco girane ketine devê çayê,
Gullekê orta meydanê Husêynê Qeco, bavê Nazilîyê
Dane kewê didimê kew lê nayê.

Êlê erdê Bişêrîyê erdekî wê bi tere,
Koçk-kerîyê Husêynê Qeco bavê Nazilîyê girane, lê digere,
Gullekê li Husêynê Qeco, bavê Nazilîyê
Dane ber gullêra zarê vî şêrî nagere.

Êlê, erdê Bişêrîyê erdekî ave,
Koçk-kerîyê Husêynê Qeco, bavê Nazilîyê girane, dane nave,
Gullekê orta meydanê Husêynê Qeco dane,
Kuştine axayê minê bent zirave.

*Got: Sebrîyê Eslan*

## ÇEVBELEK

Çevbelek, tu li min helal bî,
Notila şêkir şîrin bî,
Nona dimsê hîzîn bî.

Dezmala te geveze,
Goşe-goşe zêdeye.
Dezmala te gul-gulî,

Kesk û sorda xemilî.
Kula te ma wî gundî,
Teştîya gede padşabî,
Dezmala te beleke,
Dinê çerx û feleke.

*Got: Werda Şemo*

## ÇELENGO

Çelengo, lê belê, min nizanbû dinya haye,
Dinya sûltan Silêman pêxemberê axira zemanêra nemaye.
Derbekê daye bavê Ahmedê Tale,
Beranê kelî qemer, bala xwe didimê bê xem û bê feydeye.
Weylo, weylo...

Hevisê digo: - Dabirê rebenê, konê bavê Ahmedê Tale mezine,
Girek ji girê vê Berîyê,
Rave, emê pişta kona bidine çîya,
Xerza berê kona bidine dev Xezaliyê, lê belê,
Bira Hecî Mehmed li koçerîyê cem pîreka xwe rûnenê pesin,
Weysetê xwe venede.
Minê derbekê daye bavê Ahmedê Tale, lê belê,
Ezê silsila mala weloka bitemirînim ji dinyayê.
Weylo, weylo...

Hevisê digo: - Dabirê rebenê, vê sivê pîroka, ha ji pîroka,
Gulle têne bavê Ahmedê Tale terîtavîan û teyroka.
Lê belê, şihîdê bavê Ahmedê Tale gelek hene li meydanê,
Şerr xweş kirye newala Xelîlo tek û tenê li ser çoka.
Weylo, weylo...

## ÇEMÊ XECÎCXATÛNA ŞEWITÎ

Çemê Xecîcxatûna şewitî darê bîne,
Bavî Temo, syarî çevreş syar bûye,
Çend serîkî derê vê çadirê dibezîne.
Gozel xatûnê, Hucê pepûkê,
Îro bavî Temir – syarî çevreş syar bûye,

Kuştina wî heye,
Reva wî tunîne.

Şerekê me qewimîye,
Çemê Xecîcxatûna şewitî –
Gera Mendê tivinga bavê Temo kazonîye ketiye zendê.
Gozel xatûnê kire gazî,
Go: - Hucê pepûkê,
De rabe dîna xwe bide şerê bokan û beranan li dîharî Bendê.

Şerekê me qewimîye,
Çemê Xecîcxatûna şewitî – dev newalan,
Gozel xatûnê, Hucê pepûkê, de rabe,
Dêna xwe bide bejina bavê Temo-
Syarî çevreş, rîşînga şera,
Qotikê van axalan.
Gozel xatûnê, Hucê pepûkê,
Rabe dêna xwe bide – seglavî têne, ser zînê wane vala.

Şerekê me qewimîye,
Çemê Xecîcxatûna şewitî dev neqebê,
Minê li têlê daye,
Çûye sodereta Wan –
Cem valîngê vê Helebê,
Kulê tu bikevî mala Bedirê Hecî Hesen,
Gullekê bavê Temo,
Syarî çevreş daye,
Birîn kûre, wê dinele ji kezebê.

## ÇEMÊ XILÛLYANÊ

Çemê Xilûlyanê bi keringe,
Tivinga kekê Silo –
Şeşxaneye, nade denge.
Kekê Silo şandîye konê cem xilokya –
Xilokya, tuyê Seydayê bira berdî, yan bernadî -
Ezê kon xirab bikim,
Ha li min derenge.

Çemê Xilûlyanê bi zebeşe,
Dûquta Giroş nagire xare, nagire meşe,
Kekê Silo şandîye konê cem xilokya-
Tê Seydê bira berdî, yan bernadî-
Ezê ji konê xirab bikim,
Heyanî xaçê Reşe.

Çemê Xilûlyanê bi kizine,
Tivinga kekê Silo şeşxaneye, şeş bazine,
Kekê Silo şandîye konê cem xilokya-
Tê Seydê bira berdî, yan bernadî-
Ezê ji konê xirab bikim,
Heyanî sedira mezine.

## ÇÎYAYÊ ÇUXURÊ

Lo, lo, begê min, mîrê min,
Ezê çîyayê Çuxurê ketim li me wêda,
Ezê gava dinê stuyê şikestî, renê lerizî,
Çûme derê çadirê van bêkêfa,
Mehmed Emîn lawikê zêrkirî,
Ber texdîrê nalînê têne pêda-pêda,
Begê min, begê min, begê min...
Mîrê min, hey wax, hey wax,
Qeda bê herçar roj û rojgarê te dinyayê.
Surmelî zor Memed paşa dimire,
Evdalê Zeynikê kor dibe, dimîne rû hewata li dinyayê.

Begê min, begê min, mîrê min,
Lo mîro çîyayê Çuxurê devê bîrê,
Heylo mîro, de tu rabe ez û tu emê qasekê herine ravê û nêçîrê,
Ezê porr û gulîyê birrê, gava dinê
Nava nîvro çûme derê çadirê van bêkêfa.
Minê bala xwe daye Mehmedê Emîn,
Lawikê zêrkirî nalîn tê jê pêda-pêda,
Xwera sekinîye ber texdîrê,
Begê min, begê min, begê min,
Mîrê min, hey wax, hey wax...

*Ji sitiranên Reşîdê Baso*

## ÇÎLÊ

Çîlê inka Eyşêye, oyo-yo,
Çîlê pîrika Eyşêye, canê-can.
Zîv helandin tasêye, oyo-yo,
Zêr helandin tasêye, canê-can.

Mala me çû hewşêye, oyo-yo,
Mala me çû hewşêye, canê-can.
Çîlê inka Begemê, oyo-yo,
Çîlê pîrika Begemê, canê-can.

Zîv helandin gum-gumê, oyo-yo,
Zêr helandin gum-gumê, canê- can.
Mala me çû Batimê, oyo-yo,
Mala me çû Batimê, canê-can.

Zîv helandin kaxetê, oyo-yo,
Zêr helandin kaxetê, canê-can.
Mala me çû Mîrekê, oyo-yo,
Mala me çû Mîrekê, canê-can.

*Got: bilûrvan Basoyê Bekir, ji gundê Pampê.*

## ŞEDETYA SIVÊ

Berê min royê, rohilatê
Ser mira sekinîye du qasidê celatê,
Miskîko, benîademo, rabe bide şedetiyê:
Şedetiya min yek elah,
Şexisin hebûb elah,
Meryê û meqlûb sela
Silavê ji meryê Lalişê
Xudanê qubêyê, cîyê mayê,
Cîyê êzdîxanê lê mayê û sucudayê,
Derdê min, diayê min,
Pîrê min, hostayê min,
Şêxê min, şehulayê min,
Şêx Qeymes birayê min.

*Got: Elîyê şêx Biro*

## ŞEVÊ PAYÎZA

Şevê payîza şevine jê sarin,
Gêdûkê giran şertê mêranin,
Misirîyê efata tim di balin.

Gelîyê Hinayê tijî xezalin,
Xezal bedewin, çiqa dînarin,
Memikê van dêla sêvin, hinarin.

Kalê sed salî gava ku dixarin,
Sivê radibûn notla xortanin,
Şevê payîza şevne jê sarin.

## ŞERANÎ

Kewê canê, berfekê barî xalazê nizam çima,
Belgê gulan û sosinan binda dima,
Heval-hogirê me tew zewicîn, ez û tu man.

Keçikê dînê heyderî,
Ta bi kêra kemberî,
Li ser bextê min Esmerî.

Kewê canê, xanîkî daynim berfê bûzê,
Derîkî lêxim qalikê gûzê,
Ez kewa xwe têda rûnên herçar mehê ser payîzê.

Keçikê dînê ezîzî,
Te xizêma altûzî,
Li ser bextê min tu qîzî.

Kewê canê, dilê min kanîke dor bi qicî,
Refe kewê gozel lê xaricî,
Xwezila mine wî xortîda,
Çevê xwe vekir, dilê xwe zewicî.

*Got: Mehmedê Mûsa*

## ŞEREKÊ KETÎYE

Şerekê ketîye gamêşvana şewitî devê avê,
Eskerê Husêyn paşa girane,
Hinek syarin, hinek peya xwe dane avê.
Bavê Hemîd kire gazî,
Go: - Tevo, Siho, çê bixebitin,
Gullekê li Ûsikê Mûsoyê zirav ketîye,
Ketîye cendekê wî, maye berî tavê.

Delal, hey delal,
Heware, xweş heware,
Çarnikarê bavê Hemîd bû neyare,
Bavê Hemîd axayê xortan bi gulleke maûzêrê birîndare.

Delal, hey delal,
Şerekê li me ketîye Gamêşvana şewitî bi kerenge,
Tivinga bavê Hemîd maûzere nade denge.
Bavê Hemîd kire gazî,
Go: - Siho, Tevo, Soxo, bavî mino,
Desta hildin çê bixebitin,
Wexte li me derkeve Edongî kurî Hesen axa
Mêrê roja tenge.

Delal, hey delal,
Şerekê li me qewimîye Gamêşvana şewitî wê li yane,
Dêna xwe didimê barût gulê bavê Hemîd kîsî fîdîyane,
Bavê Hemîd kire gazî,
Go: - Siho, Tevo, Soxo, bavî mino,
Çê bixebitin,
Wexte li me derkeve Edongî kurê Husêyn axa, bavî Silêmane.

## ŞEREKÊ LI ME QEWIMÎYE

Şerekê li me qewimîye,
Naza şewitî devî karê,
Gulle têne li Mîrze Resikê bavê Tewretê,
Mînanî tevînga teyroka der biharê.
Şahid,şûhûdê Mîrze Resikê gelek hene,

Berdaye eskerê Mistefayê Cindî, syarê sîpkanî,
Revek derxistîye –
Ber Qeleça xirbê darê.

Fetê go: - Xelîlo, bavî mino,
Seglavya yêkî pêjda bileqîne,
Esedyanî dûre, farizyan bêbextin,
Kesek li hewarya Mîrze Resikê bavî Tewretê nayê.

Şerekê li me qewimîye,
Naza şewitî li dev gelyan,
Gulle têne mîna tavînga
Teyroka baranê der biharê,
Na wele gullê surmelîyan.
Şahid,şûhûdê Mîrze Resikê gelek hene,
Berdaye eskerê Mistefayê Cindî,
Sêsid syarê sîpkanî revek,
Ji qeleça xirbê darê nav xanîyan.

Dilê minî gişte-gişte,
Mistefayê Cindî syar bû-
Koma pizmama xwe da pişte.
Kulê tu bikevî mala Mistefayê Cindî,
Gullekê li Mîrze Resikê bavî Tewretê daye,
Neyare serda peya bûne,
Ber xencera kirine rişte.

Dilê minî kîne-kîne,
Dêna xwe didimê li şêxan, melan –
Kesek li vir tune,
Bişeynin pêşiyê eskerê Mistefayê Cindî vegerîne.
Kulê tu bikevî mala Mistefayê Cindî,
Xulam, xizmetkaran –
Rêka sê sehetan dane ortenga xwe û zîne.

## ŞERÊ SER WANÊ

Şer qewimî kela Wanê wê Bazîne,
Milazimê Romê hêsîr xeza kirine,
Qîz-bûka xemlê serê xwe danîne,

Kesekê tune cabê bide Andiranîk paşa –
De bira bê halê hêsîr çevê serê xwe bivîne.

Şer qewimîye kela Wanê xan û mane,
Ser berfê ketine hêsîrê ermenyane.
Rom xayîne, top ser hêsîr girêdane,
Bira hewarya hêsîr bihata Andiranîke –
Xwedêba eyane ew gula donzde dewletane.

Şer qewimîye kela Wanê devî rêye,
Romê hêsîr îro anîye ber xezêye,
Qîz-bûk dizêrin dest milazimê vê Romêye,
Kesekê tune cavê bide Andiranîk paşa,
Xwedêba eyane ew xweşmêrê rû erdêye.

Şer qewimî kela Wanê sero-dewire,
Hêsîr xeza dikin bi şûrane,
Dora hêsîr girtîye eskerê Roma gewire,
De bira Andiranîk paşa lê derketa-
Xwedêba eyane Roma xayîn bi qirare.

## ŞENA MIN

Şêna min, gul şêna min,
Unda neke zêna min,
Tu gula ber bîna min.
Hat kevranê Erdîşê,
Danî binya Telîşê,
Şêna min, gul- gul şêna min.
Hat kavranê Gergerê,
Danî binya bêderê,
Şêna min, gul-gul şêna min.
Koçerim, xirab malim,
Riatim, bê pergalim,
Şêna min, gul-gul şêna min.
Gulê te ez helandim,
Derd û kulê te dinelim,
Şêna min, gul-gul şêna min.

*Got: Gula Ozman*

## ŞÊX AQÛB

- Şêx Aqûb, çendî roje, çendî şeve?
- Minê ecêbek dîye, ewe!
Mesîkî durr li deve,
Ne wî mesî, ne wê berê, ne wê durê,
Kesî nedî mawîno ser berê.
Şêx go: - Aqûbo, pezê stewirî nedoş,
Ne bi hinkûfê xelqê îman li koş,
Roja bendê wê bifroş.
Şêx go: - Aqûbo, levqe zikakê,
Zêra bavêj çikakê (xeznê),
Ewled nayê esilê makê.
Zevya silsile dirêj,
Têda heye sûret-tuat nimêj,
Temamî navê Şîx Adî.

## ŞÊX MÛSA

Şêx Mûsa xweyo,
Kikanê şewitî kewê reşe,
Siteyrê ezmana me bûne sed û şeşe,
Eskerê kafirê Reşkal tên erş bi erşe,
Xweyo, vê sivê hevt birangê min hebûn –
Hevta yek kuştine, mane şeşe.

Şêx Mûsa xweyo, tu dey nakî,
Şûrê hêşînî kalîn xilaz nakî,
Por û gulyê xûşkê ser cinyazê birêda kur nakî,
Heyfa bira destê xwe venakî.

Şêx Mûsa, ha şêx Mûsa, xweyo,
Kikanê şewitî wê bi since,
Siteyrê ezmana me bûne sed û pênce,
Eskerê kafirê Reşkal girane, têne gên bi gêne,
Hevt birangê min hebûn, serê meydanê dudu kuştine, mane pênce.

Şêx Mûsa xweyo, tu dey nakî,
Şûrê hêşînî kalîn xilaz nakî,
Por û gulyê xûşkê ser cinyazê birêda kur nakî,

Heyfa bira destê xwe venakî.
Şêx Mûsa xweyo,
Kikanî wêran wê bi dare,
Siteyrê ezmana me bûne sed û çare,
Eskerê kafirê Reşkal ji çîya û banyada hatiye xare,
Hevt birangê min hebûn, hevta sisê kuştine, mane çare.

Şêx Mûsa xweyo, tu dey nakî,
Şûrê hêşînî kalîn xilaz nakî,
Por û gulyê xûşkê ser cinyazê birêda kur nakî,
Heyfa bira destê xwe venakî.

Şêx Mûsa xweyo,
Kikanê şewitî yane, li me yane,
Eskerê kafirê Reşkal girtîye serê herdu riyane,
Hevt birê min hebûn, çar kuştine, sisê mane.

Şêx Mûsa xweyo, tu dey nakî,
Şûrê hêşînî kalîn xilaz nakî,
Por û gulyê xûşkê ser cinyazê birêda kur nakî,
Heyfa bira destê xwe venakî.
Şêx Mûsa xweyo,
Kikanê wêran dinhêrim kevirê sûte,
Gullê eskerê kafirê Reşkal serê meda-
Tê notila baranê şorte-şorte,
Hevt birangê min hebûn, pênc kuştine, li meydanê mane cote.

Şêx Mûsa xweyo, tu dey nakî,
Şûrê hêşînî kalîn xilaz nakî,
Por û gulyê xûşkê ser cinyazê birêda kur nakî,
Heyfa bira destê xwe venakî.
Şêx Mûsa xweyo,
Birangê minî delo-dîne,
Şûrê hêşîn kalan dikişîne,
Her carekê şesid mêrî dikuje,
Heta heyfa bira hiltîne.
Şêx Mûsa xweyo, tu dey nakî,
Şûrê hêşînî kalîn xilaz nakî,
Por û gulyê xûşkê ser cinyazê birêda kur nakî,
Heyfa bira destê xwe venakî.

*Ji sitiranên Reşîdê Baso*

## ŞINGÎNEKÎ KETÎYE

Şingînekî ketîye li erdan û ezmanan,
Hineka divêjin –dewê mîrane hatî zozana,
Hineka divêjin – pezê mîrane hatî dana.
Ne dewê mîrane hatî zozana,
Ne pezê mîrane hatî dana,
Têlî Eyşana mine vê sibê meşyaye malî cînara,
Bûye xirînya morî mircana.

De rabe xatûna minî malê,
Biçûkê pir delalê,
Qinyata minî salê,
Şekirê nav dezınalê,
Derd û kulê te dimrim, dinelim,
Çar têlê sipî di çenê minda hene,
Ji teva tirê ezî kalim, lê ezî ne kalim,
Xortim, çarde salim,
Nexweşim, pir bêhalim,
Derd û kulê te dinelim,
De rabe, wey zalim.
Heleba wêran wê bi reze,
Enterya keleş kawa min,
Şamî qutinî, şivî-şivî ser torî geveze,
Keçê, kulmalbavê,
Were ramûsanekê ji minra bide,
Ez evdalê xwedê diçim welatê xerîba,
Bira dilê minda nemîne ne tu derde, ne mereze.

De rabe xatûna minî malê,
Biçûka pir delalê,
Qinyata minî salê,
Şekirê nav dezmalê,
Derd û kulê te dimrim, dinelim,
Çar têlê sipî di çenê minda hene,
Ji teva tirê ezî kalim, lê ezî ne kalim,
Xortim, çarde salim,
Nexweşim, pir bêhalim,
Derd û kulê te dinelim,
De rabe, wey zalim.

Heleba wêran şûna berxan û mîyane,
Şama şewitî şûna gewran û çîlane,
Dikim herim li gerdenê,
Şê û şêbiskê keleş kawa min
Têl bi têl bûye, daketîye ser hinara ryane.

De rabe xatûna mine malê,
Biçûka pir delalê,
Qinyata minî salê,
Şekirê nav dezmalê,
Derd û kulê te dimrim, dinelim,
Çar têlê sipî di çenê minda hene,
Ji teva tirê ezî kalim, lê ezî ne kalim,
Xortim, çarde salim,
Nexweşim, pir bêhalim,
Derd û kulê te dinelim,
De rabe, wey zalim.

## CANGÎR AXA

Lê dayê, lê dayê, lê dayê, lê dayê,
Lê dayê, şerek me qewimî,
Ser Tûtekê li bêderê,
Cangîr axa kire gazî, go:
- Reşîdo, bavê min kiribî,
Çelîka bavêj ser xezna maûzêra,
Îro derheqa hêsîrdane –
Emê şerkin bona mala Ahmekera.
Lê dayê, lê dayê, lê dayê, lê dayê,
Şerek me qewimîye li Tûtekê,
Dilê min birîne,
Cangîr axa kire gazî, go:
- Reşîdo, bavê min kiribî,
Çêbe, çê bixebite,
Emê ser mala Ahmekerê
Koka mêra biqelînin.

*Got: Sebrîyê Eslan*

## COTKARYO

Wey li min, wey li min, wey li min,
De cotkarî dilezîne,
Ga û cotê xwe dertîne,
Xwe serê zevya xwe dighîne,
Hay li min, hay li min.
Xwe serê zevya xwe dighîne,
Cotkarî cotê xwe dişidîne,
Xeta cota kûr datîne,
Laûkî temî dişîne,
Hay li min, hay li min.
Nanekî zorî zef lê hilîne,
De cotkarî bike bilezîne,
Poça cota bive-bîne,
Xwe zevyêra bighîne,
De xeta kûr bixîne,
Hay li min, hay li min.

## CIWARO

Heyla min go, were, heyla min go, were,
Heyla min go, şerekê qewimîye koşka vê eywanê,
Heyla min go, dîsan malxerabî mezine,
Pîrê go: - Xortino, heylo, qemê bikişînin.
Na welle babo, emê misiryan sor bikin bi vê xûne.
Dîsa mirin çêtire ji vê jîyinê,
Heyf, sed heyf, li vî halî...
Dîsan mêrê çê, egît û ezîz wê bimirin, emê bêne kuştin.
Qewimê qels, mêrê kotî kehêla siwarbin,
Dîsanê bizvirin ser mal û mîretê Bişêrî...

## QAZÊ

Qazê lê, canê lê,
Ketime mêrga Şilekê.
Qazê lê, canê lê,
Avka kûpê xaşandî.

Qazê lê, canê lê,
Tas ber tasa reşandî.
Qazê lê, canê lê,
Ez naxum heta yar tê.
Qazê lê, canê lê,
Ez qazim, qaza reşim,
Qazê lê, canê lê,
Para mêrkê keleşim.
Qazê lê, canê lê,
Ez qazim, qaza sorim,
Qazê lê, canê lê,
Para mêrkê pisporim.

*Got: Hemoyê Ûsiv, ji gundê Pampê,*
*li nehya Aparanê*

## QAZÊ U WERDEKÊ

Qazê gote vê werdekê:
- Were, em destê hev bigirin,
Berê xwe bidine deşta vê Sînekê.
Sîng berê gozel usanin,
Notila zebeşê Mereklûyê,
Sêvê baxê Eşterekê...
Bengî, bengî, sed car bengî...

## QASIMO

Qasimo, lawo,
Dilê dayka te hewarya vê gazîyê,
Hewarya mala Şêko zore-zor girane,
Malê me danîne quntirî çîyayê van belekîyane,
Çawa ku Qasimî lawî Meyro,
Sê gulê maûzêrê birîndare.

Qasimo, lawo,
Te nelîn tê, min xew nayê,
Şevek şevê van payîza
Destekî min berpala Qasimê lawê Meyro –

Yek bûye belgî, yek bûye berpal.
Qasimo, lawo,
Te nelîn tê, min xew nayê,
Caveke nexêrîyê bidine Seyranê,
Bê – Seyranê, wa dêranê,
Bike bilezîne,
Hemê Mûsêra xwe bigihîne,
Dû-dermanê simêla kekê Zînê jêra bîne.

## QAZÎ

Êlê qazîyê kulmalê,
Te li çeva birû çendin,
Steyr derketine li ezmana bûne çendin.
Gelî malî gundîno,
Sîng û berê Qazya min usane,
Mîna kaxezekê bine destê
12 axirqê ecema,
13 têrtêra fila,
14 melê bisurmana,
15 şêx û pîrê êzdya,
Şevekê, şeva payîza,
Rojekê rojê bihara,
Dikin, nakin nayê xwendin.
- Olo êtîmo gede,
Eze qazim, qazeke qube qazim,
Ne mîna qîz û bûkê vê dewranê hoqile-hoqilbazim,
Rojê 25 hebê mîna te têne mala bavê min dêranê,
Min dipirsin, min dixwezin.

*Ji sitranên Efoyê Esed*

## QELENÎYA ŞEWITÎ

Qelenîya şewitî çem û kanî,
Cemîlê gote Zezê:
- Tu rave temaşeke
Êvarda mûsênîya erd û ezman tev hilanî:

Fetela begê îro sê roje kaxez şandîye,
Minê heyfa Xalitê Rizgo
Destê xwe hilanî.

Me hilatîye steyra berî benda –
Mîr Pencê dewletê birîndare herdu zenda.
Heyfa min nayê kuştina mîr Penc tayê tenê,
Heyfa min tê wê heyfê –
Gogerçînê kekê min kişandine birine
Sera mexînê ser nalbenda.

## QEMA MÎRÊ MIN

Qema mîrê min hindê zere,
Him dirêje, him bi bere,
Xêrê wayê nevîne Omer Çerkez,
Gullekê bi Evdal begê daye –
Birîn kure, bê feydeye.
Rema dilê min birîne,
Xencera Evdila begê min zîvîne,
Xêrê wayê nevîne Omer Çerkez,
Gullekê li Evdalê begê min daye,
Birîn kûre, kew nastîne.
Rema dilê min li van kaşa,
Xweş tê dengê çakûç kiranê sim teraşan,
Xêrê wayê nevîne Omer Çerkez,
Gullekê li Evdala begê min daye,
Anî koka mêrê mala me – Memûd paşa.
Xatûnê, xweş Xatûnê, de rabe, teştê bîne.
Qaliba vê sabûnê,
Emê kincê van mîregan derxin ji vê xûnê.

## QEMERÊ

Eman, eman, eman, qemerê,
Ez delalî, tu delalî,
Minê qemerê xwe bijartiye nava êla hesinîya,
Nava hezar hevsid malî.

Gundî malî, cînarno cabeke nebixêrîyê minra hatîye,
Ketine qutîya qemera min dizîne,
Kêra wê, gustîla wê, qaşa wê, kembera wê.
Weylê sêfîl halê min deyndarî...

Eman, eman, eman, eman,
Dimirim derdê van qemera...

Eman, eman, derdê van qemera,
Qemerê hatîye mala bavê min mêvanî,
De tu rabe cî û belgîyê bide heve,
Eman, eman, eman, eman,
Dimirim derdê dêre zera.

Eman, eman, eman, eman,
Minê sondekê xarye, sonda mezin bawerbikî,
Ew xebera tu dibêjî, ew xebera zarê min nîne,
De bira vê sibê kotî dewarê mêrê te çend qema min birîndar ke.

Dilê min dilê te qe nemîne,
Eman, eman, dimirim destê xizêmzera,
Eman, eman, eman, qemerê.

## QÛTYA LAWIKÊ MIN

Qûtîya lawikê min şîrmeye,
Gilîk danî pêşya xweye,
Wekî min bivîne nav dewatê –
Pêşya gilî sebir ketê.
Tema bejina min bêbextê,
Bextê xirav erdê ketê.

Lawik dike min bibîne,
Tû rê dirba li xwe navîne.
Lawik dike zû gund here,
Li ser avê min digere.
Çiqa gilya ser min tîne,
Rê nakeve min bivîne...
Ez kor bibim, axir çû,
Min porkûrê neda dû.

Keçik, vî erdî, vî ezmanî,
Ez navêjim, tu xwe zanî
Mi çiqa hilda derd û kulê vî zemanî...

Kavilê gundê me mezine,
Gele mêre, gele jine,
Navda çevê gedê mine.
Yazix, îsal nasekine,
Nizam revîye, yan mêvane,
Sed heyf kûla min dildane,
Ez bêbextim, lawik xwexwe ne poşmane.

Gede diçe cîkî dûr,
Axîn hate gele kûr,
Gula dora me girt sûr,
Ji cem gede neçum dûr,
Lawik te navînim herdû taqa,
Gul şîn dike nava baqa,
Her xwezila par van çaxa.

Lêyî rabû li vî alî,
Ez cahilim, tu cahilî,
Em sekinîn ber vî halî,
Axîn te tê, kûr dinelî.

Nizam çi aîxne, çi hewale,
Gede diçe, nayê male,
Forma rêwîyê bê pergale,
Li ser me bû qele-qale...
Lawik havîn hatye, gele germe,
Poşman nebe, gele şerme,
Min nexapîn, ez guneme,
Kuda herî, ez ya teme.
Poşman bivî, qet ne kare,
Duşurmîş bûn zef zirare,
Emirê dirêj tu kin neke,
Derd û kula teze meke,
Rebê jorin wê çarekê mera veke...

Gedê cahil, keçika cahil,
Xever didan hal û qal,

Gede, keçik çûne mal,
Ji şabûna tev razan.
Der û cînar wan geryan,
Temam sura wan hesyan.
Dîtin, wekî çare nave,
Dengê wanê zef belave,
Anîn xwera şêwir kirin,
Ker, ker gilî tepis kirin...

## WAYÊ, HAY LÊ

Wayê, hay lê wayê!
Ezê cîyê birangê xwe hildim balgonê ber hewayê.
Nizam çira, bira xudê ne avake mala doxtira,
Derzîke xirav birangê min dane,
Êvarda bîna birangê min dernayê.

Wayê, wayê, wayê, wayê!..
Lo wayê, birangê min yekî kawî kubare,
Dike ji malê derê, îda neyê.
Divê –bakî têye, baranê dilîlîne,
Xudê xirav bike kavila nexweşxanê,
Şûşe, akûşkê balîsê vekirine,
Xudê bikuje kurê doxtira,
Dane kêr-dûzana ser nexweşê mala bavê minra sekinîne,
Birangê min destê wanda azarî kir.
Birangê min dengekî kire gazî, koma bira pismamara go:
- Gelî koma bira pismamano,
Hûnê dergûşa kurîn xweykin dewsa bavê.

Avê, av heyamê,
Ber derê mala bavê min av bela tê,
Nizam nifira kê bû birangê min qebilî,
Kincê birangê min dane ber mîratê.

Sibe zû çûme mala birangê xwe mêvanî,
Minê çevaye kor, guhê xweye kerr –
Ne malxwêye, ne kevanî.
Êtîmê birangê mine hûr bûn, dergûşa wîye çûk bû.
- Metê, canê, tu xerîbî, eva sê mehe me dest hev berdaye...

Derê mala bavê min gere,
Dîya mine pîre, bavê minî kale.
Dayîk, bavê min destê van hûrika dergûşa piçûk girtine,
Nava malê van cînara digerînin.
Kese tune xudanê xêrê, van hûrika, vê dergûşê bîne mal, avaya,
Dergûşa piçûk ketiye nava mala - dayka xwe digere.

Divê, jina delalê dilê min temam xatûn jine,
Xazgînîyê mala bavê wêda rûniştine.
Divê, mirin emirê xudêye,
Ya evida zore-çetine,
Tu were jinika delalê dilê min –
Destê wê bigirin, bidine mal û mêre.
Emê destê bûk û zevê bigirin,
Emê herine mala bira zevê,
Emê hina zevê têkine avê...

Nizam nifirê kê bû – zevangê deh şeva qebilî, go:
- Bira hina te bimîne ser neynikê...

Go, sûkê, heta sûkê,
Emê herin kavila Tilbîsê, derê vê dikanê,
Emê bazar bikin kastyumê zevatîyê,
Na welle dîsa xêyla bûkê.
Nizam nifira bûk û zevê qebilî, go:
- Bra hine bîmîne ser neynikê...

Gelî dê, xûşkino,,
Gelî koma biran û pismamano,
Bira dilê we nemîne,
Dilê minî gele birîndare.
Yekê ezê bêjim ji wera,
Yekê –kula dilê xwera,
Îsal sala paşopê bû,
Îsal ji pêra sê mêr ji mala bavê min çûne.
Hersê mala bavê min
Kurê bavekîne, wey, usa zore minra û çetine...
Bextê weme, hûn gazin, loma li min nekin –
Eze gele birindarim....

*Got: Şera Esedê Kokil. 1967*

## WEZ DIMIRIM

Wez dimirim, dişûştim,
Kefen dikirim,
Ez li ser du dara pîyê xwe dikirim,
Dîharê qebrêda ez rakirim,
Bi çengekî ax ez razîkirim.

Wey bavo, ez biçûk bûm, nezan bûm,
Ez mezin bûm, xudîmal bûm,
Ez ixtyar bûm, gelekî girancan bûm,
Li dîharê qebirê ez gelekî li xwe poşman bûm.

Wey li minê, wey li minê,
Ezê çiqas geryame li Şam û dinê,
Çiqas geryame li dewra dinyayê,
Kuda çûm, xilas nebûm ji dest vê mirinê.

## WEY DILÊ MIN

Îşev şeva berfêye wey, wey, wey, wey, wey dilê min,
Sivê roja berfêye, ê ça bive halê min?

Govend gerya li nefêye wey, wey, wey, wey, wey dilê min,
Govend gerya li nefêye, ê ça bive halê min?

Ketime destê Zelxêye wey, wey, wey, wey, wey dilê min,
Ketime destê Zelxêye, ê ça bive halê min?

Îşev şeva baranê, wey, wey, wey, wey, wey dilê min,
Sivê roja baranê, ê ça bive halê min?

Govend derya li hêywanê, wey, wey, wey, wey, wey dilê min,
Govend gerya li hêywanê, ê ça bive halê min?

Ketime destê Seyranê, wey, wey, wey, wey, wey dilê min,
Ketime destê Seyranê, ê ça bive halê min?

Min li serê tambatê, wey, wey, wey, wey, wey dilê min,
Min li serê tambatê, ê ça bive halê min?

Cewê dikolim, ava sar tê, wey, wey, wey, wey, wey dilê min,
Cewê dikolim, ava sar tê, ê ça bive halê min?

Ketime destê Tewratê, wey, wey, wey, wey, wey dilê min,
Ketime destê Tewratê, ê ça bive halê min?

## WEY NARÎNÊ

Wey Narînê, wey Narînê,
Te xeber xweşê, zar şîrinê,
Zozan xweş bûn, em tev diçûnê,
Te zozanê çiyayê Şengalê Erefînê.

Narînê qurban, heçîyê ji tejya gede lawikê minra nebê werdê,
Birrek mêrxasê mala bavê min syar bûne, diçine çîyê vê roja ledê.
Par vî çaxî minê sîng û berê Narîna xwe ramûsanekê kerem kirye,
Îsal sal temam bû qêmîş nakim tûkime erdê.

Wey Narînê, wey Narînê,
Te xeber xweşê, zar şîrinê,
Zozan xweş bûn, em tev diçûnê,
Te zozanê çiyayê Şengalê Erefînê.

Narînê qurban, heçê tejîya gede lawikê minra nebê hoşte,
Lawikê min çûye welatê xerîba, xerîbistana digere poşt, li poşte,
Gava çevê min bi çevê gede lawikê min nakeve,
Ezê dihelînim rojê deşte goşte.

Wey Narînê, wey Narînê,
Te xeber xweşê, zar şîrinê,
Zozan xweş bûn, em tev diçûnê,
Te zozanê çiyayê Şengalê Erefînê.

Narînê qurban, te çevreşê, burî qurê,
Tu li kerema xwe zêrrê Mehmûd ber enîya kever bide jorê,
Ramûsanekê min zilamê xwedê kerem bike,
Bira ev derd û kul minra neçe gorê...

Wey Narînê, wey Narînê,
Te xeber xweşê, zar şîrinê,
Zozan xweş bûn, em tev diçûnê,
Te zozanê çiyayê Şengalê Erefînê.

*Got: Egîtê Hemîd*

## WELE HIRÇE

Wele hirçe, ne hirçe,
Mamê Dîşo daye pey.
Hirçek tête zevîyê,
Heram tête zevîyê,
Serî naçe sevîyê,
Tê biçim pezê berîyê.
Hirçek tête newalan,
Heram tête newalan.
Serî naçite ciwalan,
Tê diçime pezê hevalan.
Hirçek tête xwe ba kir,
Heram tête xwe ba kir.
Serê memikan xîyal kir,
Mala lawika xirab kir.

## WERE EMAN, EMAN

Were eman, eman, eman, eman, eman, eman
Eman, eman, eman, eman, eman, eman.

Were eman, eman, eman dînê,
Ez aşiqê bejina teme,
Ne min sebire, ne tabete, ne tabete.
Were dînê, ramûsanê hev keremkin,
Bira derdê dilê min belabe.
Were eman, eman, eman, eman, eman, eman
Eman, eman, eman, eman, eman, eman.

Eman dînê, eman dînê ez helandim,
Erê divê, kawa li mal diçe, dimilmilî,
Kotîyê mêra pêra kiribû şer, dikewgirî,
Weyla dînê, min heyrana bejin û balê dêmê gulî, dev-diranê bi şekirî.

Were eman, eman, eman, eman, eman, eman
Eman, eman, eman, eman, eman, eman.

Erê dînê, te ez dîn kirim, ez dîn kirim,
Dê û bava kûvî kirim li min, li min, li min...

## WERE YO, YO

Eliko, lo lao,
Were meçe pêşya Zeynema Eto,
Zeynema Eto xûşka hevt birane,
Gede, gûdê wana gelek hene.
Tirsa minê wê tirsêye,
Vê sivê erafê meydanê
Me biqelînin koka li mêrane,
Were yo, yo, were.....

Porsorê go Xezalê:
- Xezalê, porkurê, Xezalê gulîbirê,
De tu rave erafî meydanê temaşeke...
Bûye şerre, şerr girane,
Kesekî xudanê xêra tunîne,
Cawekê bide koma bav, birane,
Bê, gullekê berî bedena
Elîyê bira, delalî malê dane.
Heylo korê nemayê,
Gulle maye birînêda,
Were yo, yo, were....

Porsorê go Xezalê:
- Xezalê, xayînga min kirîbî,
De tu rabe, emê herin
Mala vî hekîmî,
Bikin hîvî, dîla vê reşayê...
Emê bêjin, hekîmo,
Bextê bavê teda me,
De tu rabe risqê xwe
Bixweze mal û halê dinya gewire.
Dû, dermanekî çêke,
Bona birîndarê mala bavê minra,
Heyla korê nemayê birîndarê,
Mala bavê min kûr xedare,
Were yo, yo, were.....

Hekîmo go:
- Xezalê, agirê kulê mala
Bavê te tenê ketê,
De tu rabe sondekê bixwe,
Bira bive ad-qirara hêna berê,
Hergê tê bivî bermalya mala mine,
Ezê rabim dû-dermanekî çêkim
Bona birînê birîndarê mala bavê tera...
Heylê nemayê,
Gulle maye birînêda...
Were yo, yo, were.....

## WERE LO BAVO

Were lo bavo, bavo lo bavo,
Sûra Riza wê pelexe,
Hewşa Riza wê pelexe,
Kesekê xudanê xêra tune,
Cabeke xêrê Hecî Mehmed kirîvê mala bavê min, merûma Xudê teyrê xûnê, syarê Şevîkê daxe,
Bêje - Hecî Mehmed, xudê mala te xirabke,
Tivinga destê kekê Beybo, syarê Şevîkê erafê meydanê hemilye.

Lo bavo, nemînim, hey nemînim,
Serê meydanê mêrê kotî ber çevê xwe nebînim.

Lo bavo, lo bavo,
Sûra Riza wê dirêje,
Kesekê xudanê xêra tune,
Kilamekê ser birîndarê mala bavê minda bêje.
Cabekê bive Hecî Mehmed, kirîvê mala bavê minra,
Bê, Hecî Mehmed, Xudê mala te xirabke,
Tivinga destê Kekê Beybo syarê Şevîkê erafê meydanê hemilye,
Fişengê xwe narêje.
Lo bavo, nemînim, hey nemînim,
Serê meydanê mêrê kotî ber çevê xwe nebînim.

## WERE LO, LO

Were lo, lo, lo, lo, lolo, lolî lolo.
Axayo, ezê bereka Girîdaxê ketim li henbere,
Evdilê xelef cawekê şandîye Îbrahîm axara,
Îro sê roje, sê şeve
Eskerê wî cantirkî xalî nabe ji Girîdaxa berf li sere.
Bera hewara me bêye şêx Zahir efendî, syarê hespê zere.

Were lolo, were lolo, lolî lolo,
Axayo ezê bereka Girîdaxê ketim bilindcîya,
Bi serkarya şêx Zahire efendî teşkîla alaya kurda li hev civya,
Şêx Zahir efendî herafê meydanê sê denga Evremanê bira kire gazî:
- Çê bibe, çê bixebite,
Pêşya hêsîrê me kurda derketiye eskerê Polê paşaye,
Hêsîrê me maye li nava sê dewletê ecnebîya.

Axayo, ezê bereka Girîdaxê ketim semtê herî jêrin berî pirê,
Destê eskerê vî cantirkî Romêye,
Destê herçar lawê kurdada pênc gire-girê şihed-şûhede hene,
Sê cara berdane eskerê vî cantirkî derxistine
Hidûdek hidûdê vê Îdirê.

## WERE SÎYARO

Were lo, lo, were lo, lo, were sîyaro,
Sîyaro qurban Axmixanê virda saze,
Xwedêva eyane, lawikê min sîyarê Menegîke gerden gaze,
Sala par vî çaxî soz, qewil, xiyalê min gede lawikê min tev hev hebûn,
Sala îsalinê dîsa sozê min -min dixweze,
Were lo, lo, were lo, lo, were sîyaro.

Malîno lawikê min vî welatî çi digere,
Gundîno lawikê min vî welatî çi pêşeye?
Sîngê min zozane, zer memikê min xal-xalîye,
Xwedêva eyane serê min qurbana sêrîbe,
Lawikê min dîsa sîyarê cenya dêl hineye,
Were lo, lo, were lo, lo, were sîyaro.

Sîyaro qurban, ne hatinê, ne çûyînê,
Were qasekê kêleka min jî rûnê,
Cixarekê bipêç vê titûnê,
Sîyaro, bira serê min qurbana serê tebe,
Teyê sala îsalinê dilê min kirye cêrê xûnê,
Were lo, lo, were lo, lo, were sîyaro.

*Distirê Fetoyê Ûso*

## WERE XALO

Were xalo, were xalo,
Sebabê mal mîrato Hacî balo,
Borelane, Borelane serda leme-leme-
Cew û kanya Qere sîyane.
Îro bereka mala Hacî balo,
Xal û xarzîyava lev alyane.
Borelana wêran li van kira,
Bira xwedê xirav bike mala Hecî balo,
Kê dîtye, kê bînaye danzde mêr ji malekê
Bêne kuştin bona postê du kavira.

## WERE, WEY XOZANÊ

Were wey xozanê, lê, lê, lê te xozanê,
Alîk deşte, yek zozane,
Ez vê sibê selefê sînora kelwal-
Navînim Qeymesê êzdî,
Sînorê Senemê ne navdane.
Dilêm yo, yo, dilêm yo, yo.

Wey xozanê lê, lê, lê, wê bi mile,
Avê kanya serdkê wêye xule-xule,
Ez vê sibê selefê sînorê ketimê,
Navînim Qeymesê êzdî sînorê hespê qule.

Wey xozanê, lê, lê, lê, wey xozanê,
Wey xozanê, wan firîka,
Divê xewa me nayê destê vê germa germistanê,
Mîratê van wawîka.

Ezê vê sibê selefê syara ketim,
Digerim, nagerim navînim
Qeymesê êzdî, syarê Senemê...
Gurzek-gurzê ber cênîka,
Dilêm yo, yo, dilêm yo, yo...

Wey xozanê, lê, lê, wa bi sitirî,
Ava Dîlemê tê serda, dora zinêr duburî,
Ezê vê sibê ketime selefa sînora navînim
Qeymesê êzdî sînorê Senemê, lawikê rû bi xurî,
Dilêm yo, yo, dilêm yo, yo...

## WÊRANA GUNDÊ ME

Wêrana gundê me li jêre,
Bejina Nîgara hefsê zirave, mînanî sipindara nav bajêre.
Xêrê wayê nebîne kekê Zeynevê,
Heya ji welatê xerîba hatim,
Destê Nîgara hefsê girtin dane mêra.
Herê wayê, herê wayê,
Heyanî roja mirinê –
Derd û kulê Nîgara hefsê ji nava dilê min dernayê.

Nîgara hefsê ji mal derket,
Kubar-kubar xwe li bakir,
Cêrê avê xwe hilda,
Meşya ber kanînga mala şêx Badîn,
Qesta ava sarkir.

Xêrê wayê nebîne lawî Gulê,
Heyanî ji welatê xerîba hatim –
Destê Nîgara hefsê ji nava destê min xilaz kir.

Birek zerîngê me meşyane li zyaretê,
Ez bi xulama serî şêbiskêd di şê aqil kemala merîfetê.
Memikê Nîgara hefsê mînanî şemamokê nav bostana,
Jê tê bêna wê cinetê.
Herê wayê, herê wayê,
Heyanî roja mirinê –
Derd û kulê Nîgara hefsê ji nava dilê min dernayê.

## WÎ LO, LO

Wî lo, wî lo, wî lo,
Ûçqiranê xopan ketin wê li yane,
Bêrre gire, girê me heyqera der,
Mala kekê Heydar xan, bavê Cemîlê tev civyane.
Heyfa min nayê li tu heyfê,
Heyfa min tê li wê heyfê,
Kuştine mîrpencê dewletê
Ponoyê Tahar xane.
Wî lo, wî lo, wî lo,

Ûçqiranê xopan ketim,
Simêla kekê Heydar xan,
Bavê Cemîlê simêleke reşe tenike,
Pale bi qeydeye.
Heyfa minê nayê kuştina kekê min,
Heyfa min tê li wê heyfê,
Gogerçînê kekê min kişandine pira serxînê,
Sûka Dîyarbekir xwera kirine extirmeye.
Wî lo, wî lo, wî lo,

Ûçqiranê xopan ketim me bû tarî,
Ezmanê jorînda ser koçk-serê kekê min evdala xudêda,
Agir-alav dibarî,
Bira xudê xirav bike neyarya mêrê Heydarî, ha dil sarî,
Çawa gullekê berî bedena kekê min dane bi neyarî.
Wî lo, wî lo, wî lo,

## NAVEROK


Ahmedo ....... 15
Ahmedo qurba ....... 15
Avka ji çîyê tê ....... 16
Arênêsa wêran ....... 16
Arzanê ....... 17
Axayo ....... 17
Axayo, rabe ....... 18
Axa syar bû ....... 18
Axayo, çûme ....... 19
Axayo qurba ....... 20
Bavê Edo ....... 21
Bavê Ûsiv begê ....... 21
Bavê Beyro ....... 22
Bavê Elî ....... 23
Bejina gede lawikê min ....... 24
Berfek barî ....... 26
Beyta Cindî ....... 26
Bejnê ....... 28
Beblekanê ....... 29
Berdyano ....... 29
Beyta sivê ....... 29
Bêrîvanê ....... 31
Bêrîyê gundê me ....... 32
Boxazkesena şewitî ....... 32
Bûka mala bavê min ....... 33
Binefşa narîn ....... 34
Bişêrî ....... 36
Birinbilaxî wêran ....... 36
Bizina serê darê ....... 37
Bişarê Çefo ....... 37
Gede lawikê min ....... 38
Germa Rewanê ....... 38
Gidîlo ....... 39
Girê sîrê ....... 40
Gozê lê ....... 40
Gula zer ....... 41
Gulîzer ....... 41
Gulîşanî wêran ....... 42
Gulê merûmê ....... 43
Gulê hoynar ....... 44
Gulê rebenê ....... 44
Da biçîne ....... 45
De axayo ....... 46
Dîlberê ....... 47
Dîyara Mûşa şewitî ....... 47
Delalo ....... 48

Delîlo....48
De lê, lê....49
De lê, lê, lê....50
De lo, lo....50
De lo mîro....51
Derê mala me....52
De yar, yar....52
De yo, yo....53
De yo, yo, yo....54
Deşta Dûbênê....54
Dewrêşê Evdî....55
Dewrêşo....56
Dêra Elbekê....56
Dêran, dêran....57
Dilê min....57
Dilê min dibêye....58
Dilê min hewarê....59
Dilê min xozane....60
Dilê min wê ma....61
Dilo qurba....61
Dinyayê....62
Domam, domam....62
Evdal....63
Evdal got....64
Evdalê Zeynikê....65
Evdalê Zeynikê, şêx Silê....66
Evdalê Zeynikê û şêx Silê....67
Evdalo....67
Evdo babok....68
Evdalê Îsê....69
Evdilmect....69
Eza....70
Ez bengîme....71
Ez bilbilim....71
Ez bi xulama....72
Ezîzo Mîrzo....72
Ez Leylome....73
Ezê çome....74
Ez çûm....74
Ezê çûme....75
Ezê qulingim....75
Ez werdeka gola şîmim....76
Eyşana Mîrze....77
Elo paşa....78
Eman, eman....79
Eman, eman, eman....79
Emê dêranê....80
Erê seydiko....81

Esker hato ... 81
Eşîrê ... 82
Êlê başê ... 83
Êlê dînê ... 83
Êtîmo gede ... 83
Zeva ... 84
Zeva tê ... 84
Zevya delalê ... 85
Zeynê ... 86
Zeyneva xûşk ... 87
Zerzemo ... 89
Zerî domam ... 89
Zewal lawiko ... 90
Ziravê ... 91
Zozan ber zozan ... 91
Yara minê ... 92
Yar dugmelî ... 93
Yarim barî ... 93
Yar sosin ... 94
Yar Xeço ... 94
Yar Şemamê ... 95
Yar Şemamê, Şemamê ... 95
Yeman gundo ... 96
Yêzdanşêr ... 97
Kavirr ... 100
Kaviranekê jêlda têye ... 100
Kawa kubar ... 101
Kawa min ... 101
Keko, birano ... 102
Kela Ervaxê ... 103
Kêla Mamo ... 104
Kerê bêrê ... 105
Keçel ... 105
Keç Meyremê ... 106
Kolanê ... 106
Konê rîşî ... 106
Koçerê ... 107
Kulik, Kerro ... 107
Kulik go ... 108
Kuro gede ... 108
Kurmalî ... 109
Kilama Gulê û Evdalê Zeynikê ... 109
Laûjok-nivêjok ... 110
Lak dînê ... 112
Law ... 112
Lawiko qurba ... 113
Lê bêzarê ... 114
Lê bi domamê ... 115

Lê bi holê....115
Lê gewirê....116
Lê dayê, lê dayê....116
Lê dînê....117
Lê domam....118
Lê, lê, lê....118
Lê, lê, lê Edilê....119
Lê yarê....119
Lê, lê weyê....120
Lê canê....121
Lê wayê....121
Lê wayê, lê wayê....122
Lo li min....122
Lo, lo lawiko....123
Lo, lo xirpanî....123
Lo mîro....124
Lo şivano....125
Lûrke-lûrke....125
Malan barkir....126
Mamir....127
Medet, hey medet....127
Me derenge....128
Menalî....128
Mendo....130
Mendo hanî....131
Mestane....132
Me şere....132
Mêvan....132
Mêvan, mêvan....133
Mêrg....133
Mêrgêda....134
Mîrbegê min....134
Mîrmeh....135
Mîro berfekê barîye....135
Mîro dikane....136
Mîrikî mişkan....137
Mîro, qurban....137
Milazgir....138
Min ber dêrî....139
Min nedîbû....139
Min heyran....140
Minê xewnekê dîtiye....140
Mirîşk....141
Misto bavê Cangîre....142
Mişîr paşa....142
Naçim....143
Nînayê....144
Nîno, Nîno....145

Ne dînim 145
Pîr berbijî 145
Rezê mîran 146
Rênga paxir madanê 146
Roja me 147
Rizgano 148
Rihana Heso 151
Sebirê 152
Serayê 152
Serayê, ha serayê 153
Serê min dêşe 154
Ser kulekê 154
Ser Sîpanê 155
Sê zerî 155
Sînekê 155
Sîpane 156
Sibê bi min sibê 157
Simila 157
Sincanê Telo 158
Siwaro 159
Syara syar digotin 159
Syaro 160
Soneme 161
Talvorîkê 162
Teyr 163
Telya Mamo 164
Te li zendan 164
Teterxano 165
Tew zîvkiro 165
Tew lo-lo 166
Te çev reşê 166
Topalo 168
Felekê 169
Feqîyê Teyra 170
Xanê yeman 171
Xanikê 171
Xezalê 172
Xeyalo 172
Xozanê 173
Xûn derketye 173
Xulîxan bakir 174
Xumxum 175
Xwestîya min 176
Ha gula weme 177
Hay dil 177
Haylo dilo 178
Harî delal 178
Ha Nîna 179

Hat karvane 180
Hat maşîna nîvroye 180
Ha hûn werin 181
Hevalê 181
Hey barî 182
Hey gozelê 182
Hey gulê 183
Heydaro, lo 183
Hey başkalanê 184
Hey kerçan 184
Heyla lê wayê 185
Hey Leylê 185
Hey lê 186
Hey lê çîyayê Şengalê 187
Hey lo, lo 188
Hey lo, lo li min 188
Heylo, lo heylo 189
Heylo mîro 190
Heylo, heylo 191
Hey pira Şaxê 192
Heylo Şênî 193
Heyro, heyrano 194
Hekarî mêrek çêne 194
Her bêrîyê 194
Her bêşe 195
Her zerî 196
Her kavir 196
Her her 197
Her çar malê newalê 197
Her webî 198
Her weylo 199
Herê belayê 199
Herê dinyayê 199
Herê gezê 200
Herê lê 201
Herî delal 201
Herine govendê 202
Heseniko qurba 202
Hesîko wêlî 203
Heso heyrano 203
Hewar bavo 206
Hewar bêrî 207
Hê wayê, hê wayê 207
Hirçek 207
Hisreta min 208
Hoy Şênî 209
Hopanê 210
Husêyno 210

Husêynê Qeco....211
Çevbelek....211
Çelengo....212
Çemê Xecîcxatûna şewitî....212
Çemê Xilûlyanê....213
Çîyayê Çuxurê....214
Çîlê....215
Şedetya sivê....215
Şevê payîza....216
Şeranî....216
Şerekê ketiye....217
Şerekê li me qewimîye....217
Şerê ser Wanê....218
Şêna min....219
Şêx Aqûb....220
Şêx Mûsa....220
Şingînekî ketîye....222
Cangîr axa....223
Cotkaryo....224
Ciwaro....224
Qazê....224
Qazê û werdekê....225
Qasimo....225
Qazî....226
Qeleniya şewitî....226
Qema mêrê min....227
Qemerê....227
Qutîya lawikê min....228
Wayê, hay lê....230
Wez dimirim....232
Wey dilê min....232
Wey Narînê....233
Wele hirçê....234
Were eman, eman....234
Were yo, yo....235
Were lo bavo....236
Were lo, lo....237
Were sîyaro....237
Were xalo....238
Were, wey xozanê....238
Werine gundê me....239
Wî lo, lo....240

**HECÎYÊ CINDÎ**

# KILAMÊD CIMETA KURDA

Bona weshandinê amade kir, ser komputore berev kir

**FIRÎDA HECÎ CEWARÎ**

LIMUSH PRINTHOUSE

Տպագրության եղանակը՝ ռիզոգրաֆիա:
Ֆորմատ՝ 60x84 1/16, թուղթ՝ օֆսեթ, N 1:
Ծավալ՝ 15.5 տպ. մամուլ: Տպաքանակ՝ 50:

Տպագրված է «ԼԻՄՈՒՇ» ՍՊԸ-ի տպարանում:
Ք. Երևան, Տերյան 72, հեռ. 58.22.99
E-mail: info@limush.am